



# BARZANÎ

*Xwe Nade Dest Kesê*

Wergêr:

Şewket Şêx Yezdîn

Veguhêz:

Ebdulkerîm Findî

**BARZANI**

**Xwe Nade Dest Kesê**

Bîrewerî

**BARZANI**  
**Xwe Nade Dest kesê**  
(Bîrewerî)

Nivîsîna :  
**Ebulhesen Tefrîsiyan**  
Wergêran û nivîsîna Pêşekîyê û perawîza :

**Şewket Şêx Yezdîn**  
Veguhastin ji tîpêن 'Erebî û diyalêkta  
kurmanciya jêrî :  
**Ebdulkerîm Findî**

Derhênanan hunerî û kumpiyoter :  
**Hekar Findî**  
Çapa êkê 2001  
1000 dane ji vê kitêbê hatîne çapkîrin  
Çapxana Hawar - Duhok

*Ebulhesen Tefrîşîyan*

**BARZANI**

**Xwe Nade Dest kesê**

Bîrewerî

*Wergêran û nivîsîna Pêşekîyê û perawîza :  
Şewket Şêx Yezdîn*

*Veguhastin ji tîpêن 'Erebî û diyalêkta kurmanciya jêrî:  
Ebdulkerîm Findî*

KURDISTAN - DUHOK  
2001

# **BARZANI**

**NEVER SURRENDERS TO ANYONE**  
(( Memoirs ))

By :


Captain **ABULHASSAN TAFRISHYAN**

Translated by :

**SHEWKAT SHIKH YEZDIN**

Transliterate by :

**ABDULKAREEM FINDI**



*Bi hilkefta serkirdê her sax û zîndî*  
**KAK IDRÎS BARZANÎ**  
*Pêşkêse...*

---

www.finqi.info



*Serokê Hêja Mes'ûd Barzanî*

www.finqi.info

## **Pêşgotina Çapa Kurdi**

www.finji.info

www.finqi.info

**D**erbazbûna Barzaniyê nemir û hêza çekdarên Barzaniya digel çendîn xebatker û ronakbîrên Kurdistana Îraqê bo Kurdistana azad li Îranê li sala 1945ê, bo piştevaniya damezrandin û mukimkirina Komara Dîmokratiya Kurdistanê , êke ji boyerên siyasî yên giring û serincrakêş di dîroka bizava rizgarîwaza Kurd di vî çerxî da . Ew boyer û boyerên bi dura hatîn wek berrevaniya Barzaniya ji Komara Kurdistanê , berevanîkirin ji gîyanê xwe û zivrîna wan û xêzanêن wan di nav cil û çiya û cihêن asê û befrîn yên ser sinûra ew qorbaniyêن şerêن di gel hêzêن supayê Îranê kirîn li çaxê vege riyanê . Her wisa behsê sinûr birîn û koça dîrokî ya Barzanî û hevalêن wî bo Êketiya Sovyet û mana wan bo demê diwazde salan li wî welatî , ku heta evro bûye cihê ser zivrîn û tûjandin û vekolînêن nivîserên biyanî pitir ji yên xweyî.

Piştevaniya Barzanî û hêzêن hevbendêن wî li mukimkirin û xweragirtina komarê binwaşekê bawerîyê li cem serokêن komarê û Hîzba Dîmokrata Kurdistanê û tevaya milletê Kurd peydakir û beref asoyekê rontir birin bo paşerojê , heta hindek vekoler wan şerên Barzaniya piştî helweşana komarê kirîn û ew qehremanî û mîrçakêن be-

ramberî dojminî xweyakirîn , gelek vekoler bo hindê diçin ku eger serokên komarê wisa zû xwe ne daba destên Îranîya dur nebû komar jî wisa ya kurt temen jî nebît û dûjmin ne çarkirba hindek daxwazîyênil milletê Kurd dan pê kirba .

Nabît ji bîra me biçît ku hebûna hêzên Barzaniya li dewrûpiştên Mihabadê cihê tirseka mezin bû ji supayê Îranê ra û linav bajêrê Mihabadê dihate gotin ku Barzanî ha evro ya sube dê hêrişêken û bajêrî azad ken û Qazê û hevalê wî rizgarken.

Ev çende bibû egera hindê ku supa pîlana xwe ya kuştin û talankirinê li nav Mihabadê bicih ne înit .belê berovajîya wê soza lîwa Hemayunî - serokê supayı - daye pêşewa Qazî Mehemed û pismamê wî Seyfî Qazî kirtin û dane dadgeha supayı û piştî nêzîkî sê meh û nîva di zîndanê da mayîn şeva 30/Adara/1947ê li nav bajêrê Mihabadê bi sêdarê vakirin . cihê pisayarê ye erê boçî Barzanîya hêriş ne kire ser Mihabadê û Qazî û hevalêt wî ji sêdarê rizgar nekirin . serok Mes`ud Barzanî dikitêba xwe da ya navidêr (Barzanî û bizava rizgariya Kurd - şoreşa Barzan 1945-1958)ê da behsê buyera gundê (Sêluyê)diket di bêjît zaniyariyêni bi bawer gehişt bun ku hindek ji axayêni hoza mameş çek yê ji hukmeta Îranê wergirtî û soz ya dayê cihêni giring yên binarê çiyayê Spêrêzî heta di gehte çemê Gadir bigrin , evê jî tirseka mezin êxistibû ser çarenivîsê Barzaniya.lew hêzeka Barzaniya roj 23/Şubatê/ 1947ê çune gundê (Sêlwê) her li wî çaxî serokên mameşa jî ku di kombuneka girngdabun . her çende hêza Bar-

zaniya bitinê fermaña ji çek kirin û girtina axa hebû bi-bene Şino , belê demê gehiştîne gundî û ji egera têk ne-hehiştinê şer li nav bera wan qewmî,diwzde kes ji Mameşa hatine kuştin û du kes ji pêşmergên Barzanî şehîdbun .

ev buyera ji nişkekê ve bo egera gjibun û nemana baw-eriyê li nav bera herdu cwinada .Wilyem Îglitin di kitêba xwe da (komara kurd li sala 1946 ê) da dibêjît boyera (Sêlwê ) tirseka mezin êxiste ser hewla Barzaniya bo azad kirina mihabadê rizgarkirina Qazî Mihemed û hevalên wî çunke hoza Mameş û hev peymanên xwe dizalin li ser wî bajêrî .

Piştî revîna serokêن Azîrbîcanî û girtin û li sêdaredana serokêن Komara Kurdistanê hêza Barzaniya bi tinê mabû ku cihê tirsa rijêmê bûn çunku di bû hemî rêberên Azîrbîcanê û Kurdistanê xwe li dor wê hêzê kom ken û serhildanekê din bi ken . Heta bêjî rijêma şahê Îranê ya dil tijî kerbû kîn bû beramberî vê hêza (biyanî) ji ber wan kîriyarên berî niho digel da kirîn . Barzaniya di şerêt (Qarrawe) û (Mameşa)li ser demê komara Kurdistanê gurzêt mezin daweşandbûne supayê îranê .belê supayî jî di zamî berhingariya vê hêza hu azad û şer ker karekê hind bi sa-nahî nîne û zalgûn li ser wan bi şerî xewne bi taybet jî ku destêñ Barzaniya ji erdê Kurdistanâ İraqê û Îranê hatîne berdan,wê şerê man û nemanê ken.lew berpirsêt hu-kumeta Îranê ketine dav raçandin û xapandinê .Barzaniyê nemir daxwazkire Tehran da şahî û serokê wezîrn û ser-okê erkanê supyi û berpirsêñ dî bibînit çareserîyekê bo

doza nêvbera Barzniya û hukmeta Îranê bibînin . Li wir çend xalek êxistine ber singê Barznî,da êk ji wan hilbijêrît giringtirîn xal ji wan du bûn:

1-Barzanî çekî pavêن û xwe bidene dest hukmeta Îranê .

2-Demildest(êkser)axa îranê bi cih pêlêن .

Hejî gotinê ye çaxê dan û standin dikirin befiranbaro û rêbendana sala (1946-1947)bû. Eger Barzaniya xala diwê hilbijartba da neçar bin diviya wan çiyayên sext û kûlûmtên befrê girtîn bibrin di ser hindê jî ra eger siyaban wê rêkê jî bibrin da her li demê ji sinorî derbazdibûn bo Kurdistanâ İraqê da balefirêن Ingilîzî û İraqê da bi giermî pêşwazîyê lê ken , çinku Barzanî li İraqê di guneh barbûn û her wisa rijêma Turk jî maf da bû xwe demê Barzanî nêzîkî sinorêt wan bibin ewjî destê xwe lê bi weşînin vêca bi vî awayî şahê Îranê di zanî Mela Mistefayê Barzanî ne-vêt vê rêkê bi hilbijêrit di çilê zivistanê da hoza Barzan du car Perîşan û ji nav biçit taybet ji ber wî xelkê nesax û xwas û birsî Barzanî jî ne di viya xala êkê bi helbijêrîn û xwe bi dest îranê ve berdet di (ferhenga) Barzanî da çek danan û xwe bi destvedan ne bû . Wek Tefrîşîyan vedgêrit ku Barzanî her dem di nav heval û pêşmergên xwe da di got demê te çek dana û xwe bideset ve berda me`na tu razî di bî bi biryara xelkî , dê sebaret çarenivîsê xwe. Wê demî dê mecburbî biryarêن wî bicih bînî her çi bit. Her wisa di got kê gotiye hingû Mela Mistefa dê xwe bi dest ve berdet Mela Mistefa xwe bi destê kesê ve berna det ).

Barzanî di zanî ku Îranîya û bi taybet (Qewa Mulsetene) serokê wezîran di viya di serda biben bêxine davêن xwe ,

her wisa jî di zanî eger xala êkê helbijêrît. (Wate xwe bi dest ûrûnê ve berdet )bê sê û dû dê girin û nahêlin vegerît. rijêma ûrûnê di vî awayi da rabartyekê şermizar û bê soz yê di gel mîvanêن xwe yê heyi. Barzanî hest bi tirsê dikir lew di gote şahî :(min ne rîyek nîne sebaret xala êkê belê biryara dawiyê di dest Şêx Ehmed da ye çunku ew serokê hozê ye) û vegeriya nav pêşmerge û hoza xwe bêy biryara xwe ya dirûst bêjte wan.

Piştî Barzaniyê nemir vegeryayî û pirs û rawêj digel birayê xwe yê mezin xwedê jê razî (Şêx Ehmed) û perpirsên din hatine ser hindê ku çu ji wan xalêt rijêma ûrûnê pêşiniyar kirîn pesind neken û hewl biden heta biharê xwe li nav çiyayêن asê û bilind bi parêzin û paşî hêdî hêdî be-ref bakor beref bo sinorê Sovyeta biçin . Merema Barzanî ew bû cihekê hêmin û tena bo xêzanêن hoza Barzan bibînit û da ew pêşmergehêن xwe li dû armanca -wekî wî bixwe gotî -ser bixwe ya Kurdistanê bikevît belê hêrişa mezina ji nişkekê ve ya supayê ûrûnê nehêla ev pirograme bicih bihêt û êkser şerekê dijwar xwînelo dinav bera Barzaniya û supayê ûrûnê dest pêkir .

Barzanî ne çar bû beref dever û çiyayêن asê paşve bên alekê hêrişen berdewam yên supayı û ji aliyê din ve sir û sermayê û rus û bîrsî Barzanî şepirze kirbûn . Balefirêن ûrûnê jî bê rehim dabûne ber û roj ne diçû bê şehîd sebaret wê bombebaranê biryareka giring ya şahê ûrûnê hebû di got (nehêlin Barzanî derbaz bibin û `êlê wan bombebaranken da careka dî supa şermizar nebît û Barzanî jî derseka wisa wergirin ku careka dî bîra şerê supayı nek-

en)Barzanîyê nemir jî di got (xala lawaza me jî di wî şerê da ew bû jin û zaro di gel me dabûn û li berokên şerî di ketine ber gule û bombêñ dujminî.dujminî jî ew xala lawaza me dest nîşankirbû bê rehim û însaf û huvane jin û zaroyêñ me bombaran dikirin).di ser hindêra jî û ji ber be-revaniya qehremanane ya şerkerêñ Barzaniya,jin û za-royêñ wan ji sinorê ïranê derbazbûn û şermizarî ji supayê ïranê ra ma. Belê eger ev kawdanêt nazik nebane dur nebû her li despêkê supayê ïranê hizra derêexistina Barzaniya zû ji erdê ïranê biket .dur nebû Barzanî bi xwe jî bîr li xe-bat û berevaniyê kirba di nav erdê ïranê da. Çunku bo Barzanî hîç cudahîyek di nav bera parçeyeka Kurdistanê û parçeyeka din da nebû . Tefrişîyan di bîr anînêñ xwe da di bêjît (Barzanî gote min , hîvîya min ewe rojekê bişêm alayê Kurdistanê li ser xaleka Kurdistanê bilind bikem çi ew xala Kurdistanâ ïraqê , ïranê ,Turkiya bît çû feriq li cem minnîne ) .

Ji ber duriya sinorê suvyet û tengavkirina berdewam ya supayê ïranê û werzê sir û sermayê , Barzaniya dest ji hizra çuna suvyet berda .

Li nêzîk sinûrê ïraqê xwedê jê razî Şêx Ehmed kete giftûgûyê digel perpirsêt hukmeta ïraqê jibû vege riyanâ Barzaniya bo nav erdê bab û bapîrêñ wan. Piştî rêkeftinê , ji çemê Gadirî derbazbûn û gehiştine axa ïraqê . belê Barzanî û 550 pêşmergêñ dest bijarêñ xwe mane li deverêñ sinûrî çaverêyî gehiştina xêzanêñ Barzaniya dikir bo Diyana .

Barzaniyê nemir xwe bi dest hukmeta ïraqê ve berneda

, da her çek di dest da bimînit û çaverê bît delîveyek bo hilkevît û armancê milletê Kurd bi cih bînit ) li hîvîyê bû xwe li nav çiya asê ket , belê hevkariya berdewam ya Turk û Îranê û Îraqê bo serkotkirina Barzaniya delîva manê bo Barzaniya û hêzêt wî yêt şer ker nehêla lew neçar bû rêka suvyet bigrît û beref bakor ve biçit û demê bîst roja (350) sê sed û pêncî kilometra ji beten û dol û avraziya bibrît û heta xwe gehandiye çemê (Aras) derbazî erdê sovyet bibît. Çuna wan ya pir mîranî û qehremanî û çav ne tirs , laperekê pir bû ji şanaziya dîrokî ya bizava milletê Kurdistanê ji bû bicih ïnana armancê xwe . müşextbûna Barzanî û pitir ji (500) şerkerên bijare bo Sovyet wê di gehînit ku li hîvîya vegeriyaneka nêzîk bû bo Kurdistanê û her demê delîve bo hilkevît dê dest bi şoreşa xwe keteve . Peyvîn Barzniyê menir bo xwedanê van bîreweriya vê rastiyê xweya diken , demê nivîser di bêjît (Barzanî bitnê Sovyet bi cihekê tena û hêmin û berwext di dana heta delîve bo hilkevît da vegerîte Îraqê ji bû damezrandina hikumeta Kurdistanê ) her wisa di viya xwe bi dest kesê ve bernedet da her dem çek di destî da bît . her wisa Barzanî li hîvîya misûgerkirina harîkarîya Sovyet bû ji bizava milletê Kurda ra . Belê mixabin mana Barzanî û hevalîn wî demekê dirêj kêşa zor nexweşî û bin destî dîtin ku wî demî Sovyetî pişta xwe dabû bizava azadîxwaza Kurdî . çîroka xebat û berxwedana Barzaniya li Sovyet û ew nexweşî û êş û azarê dîtin ji ber siyaseta şofînî ya Stalînî ropelekê zor giringe bû û heta niho tiştekê wisa jê ne hatiye nivêşîn .

Piştî şoreşa 14 yî / Temoza / 1958 ê Barzanî û hevalên xwe li sala 1959 ê vegerîyane Îraqê , ew pêşwaziya her ji Besra heta Hevlêrê bo wan hatîye kirin , nîşana hindê bû ku ne milletê Kurd bi tinê belku hemû kême neteweyê din jî şanaziyê bi hatina wan mirovên zîrek û çeleng diken.

### Xwînerê rîzdar :

Ewa divê pertûkê da bi berçavêن higu di kevît ya pêk hatîye ji bîranînêñ efserekê Faris (Ebulhesen Tefrîsiyan ) ku êk bû ji efserên pişkar di serhildana Xorasanê da li sala 1945ê . Ew efserêt ser bi hîzba Tude ya Îranî ve û li dijî rijêma şahî serhildan kirî û ji kêm ser bora wan ji layekî ve û ji layê din ve bê piştevanîya hîzba Tude û Sovyeta bûne egera sernekeftina serhildana wan . piştî damezrandina komara millî ya Azirbaycanê , Neqîb Ebul Hesen û hevalên xwe çûne nav rîzên supayê Azirbaycanê . Piştî herdu komarên Azirbaycanê û Kurdistanê biryar day berevaniyê ji xwe neken dijî supayê Îranê bo egera hindê ku çend efser ji wan bi gehne hêzêt Barzaniya , Ebul Hesen Tefrîsiyan di bijît em deh kes bûyin û li naverasta meha kanûna êkê sala 1945ê bi rex Barzaniya ketîn û di gel da jiyayîn û me pişkarî di şerêt dijî supayê Îranê vegeriyyana beref sinorê Îraqê da kir .

Piştî gehîştîne sinorî , efsera giftûgo di gel perpirsên Îraqê kirin û xwe da dest wan bi hîviya ku wek penaberên siyasî serederiyê di gel biken û bişen ji Îraqê derkevine cihêن wan bivêñ belê hukmeta Îraqê bê bextî di gel kir û bi rengekê ne camêrane da ne dest rijêma Îranê .

Ebul Hesen bîranînêñ xwe li demê me behis jê kirî ni-

vêşî bûn û di kitêbekê da bi navê (Serhildana Efserên Xorasanê) belavkirbû û pêşkêşî keça xwe (Ferîde) kirbûn. Me navûnîşanên kitêbê kire (Barzanî xwe bi dest kesê ve bernadet) ku êke ji peyvîn Barzaniyê nemir û nîvîserê rêzdar Tefrîşîyan bi xwe ya tomarkirî. Ji bû serinc rakêşana xwendewarê Kurd me ev navûnîşane bi baştir zanî.

*Şewket Şêx Yezdîn  
14 yî / Tişrîna diwê / 1996 ê  
Pîrmam*

www.finqi.info

## **Ji Çapa Îkemîn Ya Farisî ra peyvek**

www.finji.info

www.finqi.info

## Xwînerê rîzdar

Ev kitêpe behsê buyerên pêkînana pişkekê ji dîroka hevçerex ya welatê me diket , ez libeka biçuk bûm ji keristê pêkînana wê . Li Gilavêja sala 1320 (1) (\*) , li navenda şerê diwê yê cîhanê ez bûme efser . Û demildest hatime êxsîr kirin bi destê hêzên Sovyet û çend meha mame li zîndana (Eşiq Abad) . Min pişkarî di serhildana efserên Xorasanê da kir . Û bûme efserê supayê millî yê Azirbaycanê . Min pişkarî di gel Barzaniya da kir di şerên dijî supyê Îranê . Li dawiya Axlêva 1356 ê bûme penaber li Îraqê û li Axlêva 1329 ê careka din vege riyame Îranê û ez li zîndanên cûda cûda gêram . Piştî Kudeta 28 û Xermanê ez dur êxistime gîzîrta Xark . Şazde sal û çend meha

---

(1) Xwînerê rîzdarê Kurd dişen li du vê xişteya xwarê dîroka zayînî bi roj û meh û sal bo xwe diyar biken .

1-Axlêve:( 21 Adarê - 20 Nîsanê)	7- Rezber :( 23 Eylolê - 22 Tîşrîna 1ê)
2-Gulan:( 21 Nîsanê - 21 Eyarê)	8-Kela rîzan:(23 Tîşrîna 1ê -21 Tîşrîna 2ê)
3-Cozerdan :( 22 Eyarê - 21 Huzeýranê)	9-Sermawez :( 22 Tîşrîna 2ê - 21 Kanuna 2ê)
4-Posber: (22 Huzeýranê - 22 Temozê)	10-Befiranbar :( 22 Kanuna 1ê -20 Kanuna 2ê)
5- Xermanan :( 23 Temozê - 22 Abê)	11-Rêbendar :( 21 Kanuna 2ê -19 Şubatê)
6- Gelawê:( 23 Abê - 22 Eylolê)	12- Reş meh :( 20 Şubat - 20 Adar)

\* Sala 1320 ê şemsî ku buyerêt vê kitêbê têda dest pê diken , beramber sala 1940 ê zayinîye .

(( Wergêr ))

li wir mam . Paşî li Axlêva 1342 ê hatime azad kîrin . Di kenalekê bertengda dê behsê wan buyer û dîtîn û bihîstina ewên biserê min hatîn û min guh lê bûyî kem .

Ez masîyeka biçuk bûm û vi berêt wî kenalî diketim û nihu jî ez yê `ecêb girtîme kanê çewa ez sax û zîndî mayime . Neşêm zanyarîyêñ berfireh û têr sebaret wî çaxî binvîsim bê vegeŕme ersîf û jêder û serekaniya . Belê bi harîkariya hîzr û bîrêt xwe min ci dîtîye , yan bihîstîye yan rol têde hebûye ji keça xwe vedigêrim . Piştî bîst û pênc salêñ xerîbiyê . Min keça xwe li sala 1350 yê li Berlîna rojhîlat dît .

Hîvîdarim ev serhatîye , kujyekî ji dîroka welatê me ron ket û harîkariya hîzr û bîrêñ wan tulaza biket ewêñ bi zîrekî xebatê diken ji bû paşerojeka ron ji welêt ra .

Ev buyere hemî di pirin ji mîranî û zîrekî û qorbanî danê, belê encamêñ xemgîn wê çendê îsbat diken ku we-rara komelê û gihurînêt wê di girêdayne bi komeka yasay-êñ rêk û pêk û rêkxistî ve û bi bizavêñ komelê ve, qor-banîyêñ kesê yan giropékî bê hebûna peywendîyêt mukim û şîdyayî bi daxwazîyêñ milletî ve dê encamêñ ne bi dil hebin . Lew divêt her layek evê çendê ji bîrneket .

*Ebul Hesen Tefrişîyan  
Gilavêj 1355*

**Pişka Ekê**

www.fndi.info

**SERHILDANA  
EFSERÊN XORASANE**

www.finqi.info

- Babê xweştivî çîrokê bêje !
- yê serçava , başe , hebû nebû ,
- ne ! min ew çîrok nevên , çîroka xwe bêje.
- ha te serhatiya jiyana min divêt , başe guh bidê.

Li 29/ Xermana /1320 ê ez bûme efser , naverasta şerê cîhanî yê diwê bû , ew çax bû yê welatê me ketiye jêr de-stê biyaniya <2> . êk ser cilkên efsera kirine ber min û ez hinartime deverên şer û pêkdadan lê hey da pişkarîyê di şerî da bikem . Rêka (Meşhed) kete ber min . wek xweya bûyî beroka şerî li wî demî li devera (Bacgîran û Serxes) bû . Supayê me çu berhingarî digel supayê Sovyet ne dikir li nîva rêkê vegevêriya ve .

Êk ji wan betalîyona kertê top xanê bû . Ez efserê top xanê bûm lew ya li bîra min roja çardê yan pazdeyi meha Gelavêjê bû , demê ew kert gehîştîne kempa xwe . Wî demî jiyê min bîst û yek sal bû . Bastre ez bêjim ez (Nîşaporî) me , çînkû deyk û babên min û xizmên min li Nîşaporê bûn . Lew ez li ser rîya xwe çume Nîşaporê û deyka min ji şevekê zêdetir neşiya min bibînît û ez veg-eriyam û min di got ez mirovekê bi mifa me bo welatê xwe yan bi kêmasî min wisa hizrdikr . Deyka min di tir-siya tiştek bi serê min bêt û di viya çend rojeka li cem bi mînim û belê ez bi eşiq derketim da xwe bi gehînme kertê

---

<2> Ev pişke zor ya dirêj bû , xwendevanê Kurd mifa jê wernedikirt lew me kurt kir .

(( Wergêr ))

xwe li (Meşhed).

Li wir kes bi kesê nebû. Spêdê wek tiştekê siroştî derê bazar û dukana vekirbûn . Belê her êkî gotba eve Ros hatin da derê dukana girin . Paşî piştî nîv se'etê da bêjin ew gotin direw bû da careka din dukana veken . Kes ne bû sergêriya wê komela belingaz biketin û bitinê hukmetê hewl dida nanopêjî di vekirî bin , da nan bi dest xelkî bikelvît . Demê ez çuyme kempê kes lê ne bû , çûme erkana dîsa ya vala bû . Bitinê du efserên vege riyayî yên wek min û efserekê inzîbata lêbûn . Efserê inzîbata bizaveka zor kir ku harîkariya me serbazên belavbûyin li bajêrî komket û bi her rengekî bît vege riñîte ve ji bû parastina kempê , her di wan roja da gehişte guhêñ me ku serokê betalîyunê ( Eqîd Lutfullah Efşar Oxlî ) berî betalîyonê yê gehiştî û piştî (48) se'eta xeber hat ku supayê Sovyet gehişte (Meşhed). Serokê betalîyunê kete giftoguyê digelda û gotin em ne hatîne şerî digel hingû bikeyin me çi digel hingû nîne , em dostêñ Îraneyine û me çu digel supayê wê nîne û merema me ewe em Îranê ji cermana paqij bikeyin . Serkirdê top xanê bitnê mabû. ewjî demê supayê sor (Sovyet) hatî kertê xwe bidest ve berda . bi şev ferman dayê ku bi çîte erkana got :(Serçava) û em hemî komkirîn ji mera peyvî û got : (Eve dostêñ mene şerî dgel me na ken û dest li supayê me na den û dê li cihê xwe mînin . nubedar li kempê belavkirin û em digel xwe birîne (erkana) demê em gehştîne ber derê erkana serbazên (Ottomatîk) di dest da dewir li meda û beref jora erkana birîn . paşî got hingu işev mêvanen me ne û dê di dixzmeta we

da bîn . Çil û heşti se'eta em li wir hêlayin . paşî em birîne Ûtêla (Baxtir) ku wî demî meznîrîn Ûtêla (Meşhed) bû.

Nûbedar li her çar rexên ûtêlê danabûn , paşî gazî ser-cem efserên supayî kirin da xwe pê bidene niyasîn , li dez-gehêن ragehandina Suvyetî da di gotin em dostîn ji bû harîkariya hingu hatîne û dest li supayê hingu nadîn û di vêt em jî harîkariya wan bikeyin . Lew çend efserên me xwe da dest wan .

Otel (Baxter) pir bibû û Otêleka din bi navê Otêla (millî) hebû . Ewjî her wisa ya pir bû (196) sed û nut û şes ef-serên supayê Xorasanê li wir di girtibûn . Nêzîkî bîst roja em li otêla mayin û paşî em ji otêlê siwarî otumbêlekê ki-rin berev (Taşqaw) birîn . Demê em gehandîne (Taşqaw) em di bê wire û dil şkestî buiyin alek ji zîndana Taşqaw bu me vebirî û em kirîne têve . em nêzîkî (170) sed û heftê kesa buyin . Girtina me nêzîkî (3) meh û nîva vekêşa . Li (24) Gelavêjê em careka dî birine (Taşqawe) û paşî li 15 ê yan li 16 ê meha Befranbarê em vegerandîne Îranê . Em dayine destê parêzgarê Meşhed . Li wir daxaz ji me kir cilkêن sifila bikeyne ber xwe. çunku hêşta cilkêن leşkerî di ber medabûn . Û bi çîne Tehran da xwe bi deyne niyasîn , em deh pazde roja li cem kes û karêt xwe mayin û paşî beref Tehranê birê ketîn . Her demê Tehran di hate bîra min ez di giryam û ez bê hîvî di bûm , demê dîmenê desgira min di hate pêş çâevn min heku li ser rexê cadê ya rawestiyaî demê em siwarî otumbêlê buyîn û çavên min vê ketîn digrya û rondik wek taviyêن baranêن Biharê ji çavên wê yên ciwan dibarîn wê rojê ji dilxwşiya wê min

bizav kir û destê xwe jêra bilind kir . Ew dîmen çu cara ji pêş çavêن min ne di çu .

Piştî yazde roja min destê xêzana xwe girt û hatime Tehran . Nêzîkî sê meha li Tehran perinde bûm , wî demê hatîme Tehran . Ez efserê welatekî bûm ji layê sê supayêن biyanî ve hatibû dagîrkirin . Wî demî dinav cada da me efserên ros û Ingilîz û Emrîkî di dîtin û me xwe biçuk û si-vik di dît . Da agadarî deng û basêن welatê xwe bim min rojnama (Itîla'at) û her wisa rojnama (Îqdam) di xwend . Hinde cara babetên nû di nav rojnama da serinca min radikêşan û bi taybet giftûgûya dinav perlemanî da derûnê min hişyar dikir . Biryar bû wî demî lîwayekê li (Torbet Cam) pêk bînin belê piştî rezemendiya Sovyeta wergirin , belê hêşta ew biryar bitinê li ser kaxezê bûn û kar jêra ne hatibû kirin serkirde û efserên wê lîwayê damezrandin û biryar da her demê lîwa pêkhat biçin xwe bi Sovyeta bide ne niyasîn û piştî çend meha lîwa (Torbet Cam) pêk hat û li meha Cozerdan (Cehzer) yan Poşbera 1321ê min dest bi karî kir . Serok erkanê wê lîwayê 'eqîdek bû bi navê (Yekrengiyan ) û bingehê wî li Meşhadê bû . demê ez hatîme Meşhadê min xwe bi 'eqîdî da niyasîn û ji ber ku hêşta lîwa (Torbet Cam ) dest bi karî ne bibû min daxwaz jê kir her li erkana karbikem piştî pêkînana lîwa (Torbet cam ) min heşt neh meha li wê lîwayê kar kir , paşî careka din hatime veguhastin bo fîrqa (28) li rojhîlatî li Meşhed û kertekê top xanê di gelda bû û li dawîya sala 1321ê û serê sala 1322ê ez hatime damezrandin wek fermandê wî kertî . Li dawîya sala 1322 ê binkê koltorı yê Îranê û sov-

yet (wiks) li Meşhed hate vekirin . serkirdê fîrqê rojekê li yana efseran . Li diwî heza xwe mizgînî da me ku her kesê hezbiket fêrî zimanê rosî bibît bila biçîte wî binkey û ez zor yê keyif xweş bûm . Li sala 1323ê (Rezim Ara) er-kanî biryar da hindek guhurîna biket da hindek li Tehran bin û hindekên din li şar û sininura bimînin û ev kare bi pişt kêşanê bi cihanî .

Êk ji wan efserên veguhastin bo Meşhed (Raîd 'Elî Ekber Eskandanî ) bû ku li kolîja efsera serkirdê típa me bû ya top xanê piştî rojekê ji gehîstina wî li meha Rezberê min ji nişkekê ve li cadê dît û sax û slamet yê derketî yê li otêla (Baxter) hatiye xwarê . Ji ber ku ez li bajêrî bûm û min xaniyekê mezin hebû . Min pêşinyar kir ku berwext bête mala min heta xaniyekî ji xwe ra peyda biket . Kêfa wî hat bi pêşiniyara min û her wê şevê min bire mala xwe . piştî şîv xwarnê me dest bi suhbetê kir û sebaret hemî babeta em peyvîn . Min hest kir ku peyvên wî di cuda ne ji peyvên efserên din . Hêdî hêdî min hest kir ku hindek babetên nû yên di bêjît ku heta wê rojê biber guhê min ne ketibûn û min diviya zû divan babeta bi gehim û çendîn şeva li dû êk Maltiryalîyef û Dîyalêktîk û Maltiryalizma dîrokî û bingehê komelnasiyê , zor bi kurtî bo min behis dikirin . Paşî min bi rengekê berfirehtir hindek babet sebaret bingehê komelnasiyê xwandin . Şevekê sebaret Suvyeta pisyar ji min kir .

Min gotê : Hîvî darim ev şeve min guh li şkandina wan bibît û spêdê mirov pirjîne ser cada û ji welatêt xwe der-bêxin .

Got : Ev bûçonê te peywendî ya bi rabirdûy ve hey ji ber ku supayê Tirazî (Qeyserî) karêن xirab kirbûn li Îranê û hêsta yê li bîra xelkî mayin , belê supayê Sor her di binyat da yê cûda ye ji supayê (Qeyserî) . Di bêjim vê suhbetê heta nîva şevê vekêşa û bê zariya min ji supayê Sor kêm tir lê hat û zor hatime gihurîn û keyfa min bi supayê Sor û Sovyeta hat û min hejê kirin . piştî çend şeveka gote min : ( Ez endamê Hîzba Tude me ) û paşî gote min : ( Te divêt bibîye endamê vê hîzbê ) bê sê û du min pesindkir û got : (Pêtivî ne bû pisayarê ji min bi key te di şîya bikey , bê gu-man tu li kû re bû ez jî dê li wir bim ) . Sebaret mercên hîzbayetiyê axıvt û paşî wî û ( Perwîn Gunabadî ) ez bijarekirim (Palawtim) û entêka hîzba Tude min îmzakir . berî hîngî min (Perwîn Gunabadî) di niyasî . Mamostaya Edebiyata bû li navinciya (Şah Riza) li ( Meşhed ) û wî demî rojnama (Rastî) organa komîta herîmayetiya Hizba Tude bû li Xorasanê . Eskandanê got : Ew endamê komîta navêna Tude ye) min bihîst ku hindek efsera li kolîja ef-serî rêkxiraweka damezrandî navê wê bi dirostî li bîra min ne maye , di bît navê wê ( Rêkxirawa Sîyonalîstên Îranê ) bît di got (Arîyana) serokê wê rêkxirawê ye ku wî demî di gotinê (Minuceherî) her wisa di gotn (Arîyana)faşîste û layengîra Cermenaye . Belê bi hizra min (Arîyana) fasist ne bû . Reftar û peyvîn wî bi rengekî bûn ku lawêna nasîyonal û wilat parêz li dor xwe komkirbûn û di gotin (Roz bê daniş , Murtezewî û Qazî Esedullah) efserên kolîja efserî hevbendên wî ne . Paşî her hemî bûne endamên hîzba Tude.

Eskandanî bi xwe jî li sala 1322ê û bi rêya (‘Eqîd Azer) û <sup>3</sup> bibû endamê hîzbê . (‘Eqîd Azer) mirovekê jêhatî bû li Firensa xwandinibû , efserê top giravî bû li kolîja efserîyê em di şeyin bêjîn bîra markisî di rîya (Azer) ra gehiştine nav supay. Azer û paşî Zorbê , Qazî Esedullah , Murtezewî , Resedî Îtîmad , Hatemî û efserên wî ser demî yên ji kolîja efserîyê derketîn li dor xwe komkirbûn

Eskandanî li meha Poşbera sala 1353ê hate veguhastin bo Meşhad , heta Xermana sala 1324ê ku serhildana efserên Xorasanê rêkxistî û bîst û yek efser ïnane nav hîzba Tude.

Wî demî hijmara wan gehiştibû (14) kesan . Eskandanî pêşinyar kir hilbijartinekê bi keyn da rêkxistina me ya dîmokratî bît û hizib jî piştevanîyê lê biket . Rojek hate dest nîşankirin bo hilbijartinê . Sikirtêrê komîta her-êmayetî ya hîzbê li Meşhed (Baqir ‘Elî) di kombona me da amadebû . Bi amadebûna wî Eskandanî hate dest bijîrkirin wek berpirsê rêkxirawê û sê kesên din hatine hilbijartin bo desteka kargêriyê .

Wî serdemî efserên bijare yên supay bi tiblîn desta di hatine hijmartin : ( Zorbî , Qazî Esedullah , Mortezewî , Resedî Îtîmad û agahî û yên din hemî endamên hîzba Tude bûn . Her ew bûn li meha Xermana 1324ê li Tehran biryara serhildanê day . Wî demî bîra serhildanê di mejiyê

<3> Pişî buyerêt Azirbaycanê (‘Eqîd Azer) çû bû Suvyet û heta sala 1355 li wir ma û paş hate Îranê û pişî sal û nîva li meha Gelavêja 1357 li temenê heftê û sê salîyê da çû ber dilovanîya xwedê .

Eskandanî da gehîstibû li jêr kartêkirina kesayetiya (Tîtnuyi) da bo û digot :

- Rêber ew kese ewê wek Tîtnuyi . bi çîte çiya û hevala li dor xwe komket û bi zebrê çekî serkevît ne wek ewên li cada (Fîrdewsî) <4> li pişt mîza ronişîn .

Eskandanî rêkxer û hizrevanekê paş bû , eger maba di şîya li paşerojê bîba mirovekê zîrek û bi bizav diwan rojêن Eskandanî serhildan rêk êxistî di hizra peyadakirina para û amîrên şerê partîzanî dikir û (3) ji endamên erkana hevalên me bûn . Eskandanî hevalê me (Molazimê Êkê Necdî) kire çavdêrê darayı . Pêş wext pilan dana bo ku demê pare wergirtin li demê diyarkirî di filane kolanda bi çît û mirovekê siwarî payisiklekê dê bi dûv ra êt û mistekê dê li ser û çavêن (Necdî) det û para revînît û bo rêkxistina me bet . Bi vî rengî bê çu axiftin bête ser rêkxistina me (sê hizar Tumen) moçê efsera peydakirin . Li despêka şerî taiyrêن tirombêla zor giran bi bûn , li binkê bar hilgirîya Tehran hindek tayere bo fîrqa Meşhed hinartbûn , ew tayîr berî bi gehne Meşhed li rîkê firutin û pare ketine destê me . Eskandanî bi xwe srokê barhilgirîya Meşhed bû di vîya ew tayîra wergirît û pisulên wergirtinê ji layê fîrqê ve pisulên wergirtinê ji layê kogayê jî ve hatibûne dirosrtkirin. Eskandanî em şîret kirbûyn ku bi ci rêk bît em para peydakeyn çunku her dê rojek êt mifayî jê wergirîn û got : Berdewam mûçê mehekê wek yarmetî wergirin.

Li wî demî Eskandanî serhildan rêk di êxist , li Tehran jî hindek efsera di vîya bi serokatîya ('Eqîd Azer) se-

<4> Wî demî baregayê hîzba Tude li cada Fîrdewsîbû li Tehran .

(( Nivîser ))

rhildaneka çekdarî û partîzanî li kojîyekê Îranê dirûstken . ji bû armancê ewan jî pilanek hebû belê ne gehiştibû qu-naxa dumahîyê . ji bû bawerî pê ïnana hizbê ewan di got hindek ji wan yên aşkira bûyîn û pêtivîye berî bêne girtin , bêne veguhastin bo cihekê emîn û hêmîn hizbê jî birîyar da ewan binêrne deverên bakor da xwe veşîrin û karê hizbê bi ken . Bi vî rengî li meha Xermana 1324ê li geraceka cada (Nasir Xisro) otobîsek bi kirê girt û bi şevê hemî li mala Azer bi cilkên xwe ve lê siwar bûn û otobîs bo karekê taybetê xwe di çîte geracê . Efser di bînin xudanê geracê kete Telefon kirinê û paşî digel şûfîrî axift , ewan hizir kir ku Telefon bo supay ya kirî û hemî bi lez ji ototbîsê hatine xwarê û bi pîya bazda û heta hindeka giyanê xwe jî di otobîsê da bi cih hêlan . Spêdê hindek her weku ne ba hatî û ne baran di çine Kempa serbazîya xwe û yên din jî tırsîya bûn û bi dizî ji Tehran derketin .

Eskandanî bawerîya me hemîya îna bo ku ev serhildane ya pêtivîye û ya li kare , bi tinê du kes nebin di bê bawer û dij bûn . êk molazimê êkê (Seraf Zade) bû û yê din mi-lazimê diwê (Şehîd Nuranî)bû ku ez nihu nizanim li kûvene.

Berî serhildanê , Eskandanî êk ji endamên komîta serhildanê (Neqîb Beram Daniş)hinartibû Tehranê bo peywendîkirinê di gel hizbê û Azer . Azer serhildan pesindkirbû (Behram Daniş) pilana serhildanê da bû vê da rizamendîya komîta navîn ya hizba Tude bo wergirît . di bêjin : (Kampexîş , Îrec , Eskenderî , Erdeşêr Awansîyan) hindeka serhildan pesindkir û hindek dij bûn . Belê rêkxirawa efserî û (Roz bêy qareman) serhildan ya pê pesind

bû . Li roja dawîyê ku daniş di vîya vegerîte Meshed gotibû : (komîta navîn ci di gelda bît yan dij bît em dê her karê xwe keyin ).

Kelûpel û amîrên serhildanê wek cilkên zivstanê , zemzemî , rext û fîşek , xwarin û pêtivîyên din li mala 'Eqîd (Ebulqasim 'Ezîmî).

- Li Azirbaycanê li sêdarê dan - komkirbûn.

Ew şeva biriyar bû bi rê bikevîn . Erkê her kesekî pêştir hatibû dîyar kirin. di vîya min ji cekê cem xwe - wî demî ez serkirdê betalîyuneka serbixweya fîrqa heşa Xorasanê bûm - (20) bîst tiveng , (10) deh şes agir û hijmareka baş ya gulla peydakem . Erkê Eskandanî amadekirina kamîyuna bû . Di vîya wî çekî li du dor Lurîya û cêbekê barkeiyn . Her wisa amîrên fîrqê ji kar bêxîn da li pey me ne ên .

Şeva 25î Xermanê 1324ê bo beref Quçan birê ketîn û efer û (6) şes serbaz . Li rêkê Me têla Telêgraf û Téléfona li zor ciha biçand . giringtirîn bûyer li ser rêkê ji çek kîrina kempa (Mirawe Tepe) bû . (Mirawe Tepe) bajérkeke li nêzîk sinurê Suvyet . Eskandanî em raspardekirbûiyn ku eger cendirmeyek ya nûbedarek hate pêş bo rawestandina kamîyuna bê pîrs bidene ber gulla.

Belê çu karêt wîsa ne hatine rêka me . bi tinê li (Bincnord) li dûy pilana em bi sanahî ji bajêrî derketîn û şeva paştır gehîştîne (Mirawe Tepe) . Li dewr û berên bajêrî me xwe parst û spêdê pilana ji çek kîrina kempa (Mirawe Tepe) bi sanahî bi dest me ve hat .

Serok erkanê sîyê yê fîrqê (Raîd Pîrzade) di gel me da

bû wî di zanî ku şandek ji Tehran bo pişknîna kempê dê êt û wî ev xebere pêş wext dabû kempa Mirawe Tepe . Li heman dem kempa Mirawe Tepe hatibû agedarkirin ku berî şandê pişknînê ji Tehran bi gehît dê şandek ji fîrqê çîte cem wan . Li Meşhed firmanek ji serkirdê kempa Mirawe Tepe ra amadekirbû û mor û îmza fîrqê lêdabû dabûv Eskandanî di firmanê da raîd Pîrzade dest nîşankir bû wek serokê şandê pişknîna fîrqê .

Li nêzîk Mirawe Tepe Raîd Pîrzade , Neqîb Nedîm , Molazimê êkê Qemseryan û dû mirovên din bi navê şandê pişknîna fîrqê siwarî cêbê bibûn û pênc kesen din ji wan serbazên di gel me da bûn bi serokatiya molazimê êkê neçefî (Efserê Inzîbat) bibûne nubedarên wan . Bi vî rengî şandê pişknîna fîrqê çûne dinav Mirawe Tepe da .

Her li demê gehiştinê raîd Pîrzadey dest bi rexne û ga-zinda kir ji serokê kempê (molazimê êkê Fexran) . Pişti demakî ji pişknînê ew û serkirdê tipê ladan û êkser firman dayê ku biçine binkê betalîyunê da xwe pê bidene nîyasîn. ew li cêbê siwar kirin û beref (Bicnurdîyan) hinartin ku em li nîva rêkê çaverêy wan bûyn û me girtin û gotine serbaz û karmendên siriyê ku şandê pişknîna Tehran yê bi rê ve têt û nêzîk dê gehît . Raîd Eskandanî digel çend kes-anên din rêka Mirawe Tepe da ber xwe . Serbazên kempê li cem şandî gazindên xwe kirin ku demê xizmeta wan yê tevav bûy û ew zêdetir yên li vê kempê mayin . Serokê şandî raîd Eskandanê xwe dil teng û ture kir û firman de-rêxist ku serbaz bê rawestan beref Bicnûr bi kevne rê .

Bi tinê êk efser li kempê hêla . ew jî bi hêcetekê hinarte

cem me û me jî girt . Li dû pilanê em digel hemî êxsîra beref Mirawe Tepe ketîne rê û li cihekê pîstir hatibû dîyar kirin rawestîyan û me şêwerkir.

Hevalên me li Mirawe Tepe hemî çekê kempê li kamîyuna kirbû û beref layê me hatin . Vêca ji alê çekî ve me kemasî ne bûn du reşâşen Birên yên sivik , (130) sed û sîh parce çek , (3000) sê hizar Gulle , bijlî ewêni ji Meşhed di gel xwe anîn.

Diyrkirina çarenivîsê her sê efserên êxsîr bo me giriftarîyek bû . Me ne di zanî ci lê bikeyn hevalekê me : Hisên fazilî , pêşinîyar kri ku her sê ka bi deyne ber gulla û bi kujîn û di got em giropêkê şoreşgêrîn û di vêt reftarên me di şoreşgêrane bin . Bê goman kesê ji me ev gotine pesind nekir . Eskandanî di got : meric nîne karêñ dijwar û şoreşgêrane bi keyn belku divêt jîra ne karbikeyn . Li dawîyê me biryar da dûr bêxîn û berdeiyn da li cihêñ me şareza nebin .

27ê Xermanê bû demê em gehiştîne (Kubnet Kawîs) li wir Suvyeta em rwestandîn . Eskandanî berî hîngê ferhengeka Farisi - Rosî peîydakirbû , bi harîkarîya wê ferhengê şîya digel baxvît û bawerîyê pê bînit ku rêkê bi dene me beref (Gurgan) biçîn da Eskandanî li wêrê peywendî yê digel (Ehmed Qasimî) berpirsê komîta herêmeyetîya hizba Tude biket . Wisa pê di çû ku (Mampexîş) li Tehiran dîtibû û (Daniş) beref (Gurgan) hinartibû û daxaz ji (Ehmed Qasimî) kir bû da harîkarîya pêtivî ji mera biket . Bi şevê li daristanekê du kîlometra dûrî Gurgan û li nêzîk cadê em rawestaiyn spêdê Eskandanî çû

Gurgan . Demê vegeŕiyayî zor demar gîr bibû wisa diyar bû ku Qasimî gotibuyê : (Hingu ev kare bi xwe yê kirî û em di ser û berekê wisa da nînîn ku bi karîn serhildaneka çekdarî hilbêxîn . Karê hingu dê hêcetê dete dojminî ku hêrşê bibene ser rêkxistinên hîzbê . Em nikarîn bi çû ren- ga nikarîn harîkarîya hingo bi keyn . Diyar bû ku Es- kendanî peywendî bi Suvyeta kir bû û wan jî şîret kir bû xala li navbera (Konbet) û (Mirawe Tepe) û li wir çaverê bît . Li (Gurgan) şes efserên din ku ji Tehran hatibûn û gehîstibûne me . Ew bermaîyên wan efsera bûn ewên di vîya bi tevayî ji tehran bi revin , biserneketibûn û bi tinê tirs li ser van şesa hebû û bi dizî hatibûne bakor cem me êk ji wan ('Eqîd Azer) bû ewên din jî : (Neqîb Resenê I'tîmad , Molazimê êkê Ebdul Huseyîn Agaghî , Mi- hemed Por Hormizan , Pizîşkîyan û weten Por . Evê dawîyê çû Suvyet û careka din vegeŕiya Îranê û çû jêr de- sthilatdarîya hukmetê . Hijmara me bibû (25) bîst û pênc efser û (6) serbaz me birîyar da wî cihê bo me xweyakirî . Li (Gunbet) careka din Suvyeta em gîrokirîn ji ber hindê da pisyara berpirsên xwe bi keyîn . piştî mebihna xwe ve- dayî û hindek ahêñ xwarnê kirîn û bi şevê em bi rê ketîn çûnke seqayê dunîyayê baştir bû .

Her wisa Eskandanî biryar da li (Gunbet) peywendîyê bi (Behleke) berpisê hîzbê li wir bi ket , da pêkve bernâme û biryaren paşerojê danin.

Li (Gunbet) hindek cendirma xwe amadekirbû bo ber- hingarîya me û ev xebere wan efserên ahêñ xwarnê bo me peydadikirin anî bû . Belê Eskandanî yê bê minet bû

bawer ne dikir ku cendirme û nubedar bi wêrin xwe rast bi me bîne der . Cendirme berî hîngî peywendî bi Tehran kir bû Jeneral rokin ( Erfe' ) serokê erkana firman dabûyê ku pêşîya me bigirin . Bo serê her êkî ji me çend hizar Tumen dana bûn .

Serokê Cendirmê (Gunbet) molazimê êkê (Husêñ) hemî cendirme û nubedarên wê deverê ïnabûne (Gunbet) da rêkê li me bigirin û ji alîyê dî ve raîd (Fîrazî) peywendî bi Eskandanî kir da vê kêşê bi aşî çareserken û rêzdar (Behleke) berpirsê hizbê li (Gunbet) bo vê egerê hatûçû dikir . li vir ne çarim babetekê din bi bîr bînim : Wek xweya hemî kar û biryar bi rêka Eskandanî bi cih di hatin. belê bi hatina şes efsera ji Tehran ku (Eqîd Azer) êk ji wan bû divîya ewî serkidayefî kirba ji ber ku ew berpirsê rêkxistina supayî bû .

Belê ev kêşê bi şarezayî ji layê Eskandanî ve hate çareserkirin û li demê em li (Gunbet) ji bû bêñ vedanê û peydakirina ahêt xwarnê çaverêyî Suvyeta bûyin da delîva bi rê ketinê bo me xweya ken .

Eskandanê hemî heval komkirin û got : Bi hatina (Heval Azer) karê min temam bû di vêt em hemî guhdarîya wî bi keyin , belê çaktire bi hilbijartin bît . Belê Azer bersiva wî da û got : Ya çaktır ewe heta dawîya serhildanê her Eskandanî rêber bît çunku wî ya kirî û efser baştir di wî digehin . belê her çewa bît piştî demekî êk û du nîyasî . hilbijartin hatine kirin û Eskandanî bi piranîya denga bû rêberê serhildanê . Bi vê çendê cihê Eskandanî pitir momkim bû beramberî Azer .

Bo cara dawîyê se'et (5) pêncî piştî nîvro ya 29 / Xerimanê / 1324ê em bi hemî kel û pel û amûrên xwe ve ji baxê kiştûkal - cihê bêñ vedana me bû - derketîn û dengûbas ji nav bajêrî dihatin ku Cendirme û Polîs kes bi kesê nîne û Eskandanî vi ber karwanî ket û hemî şerker li cêbê siwar bûn û li rêkê em bûyne (5) pênc girop û her giropekî berpirsek bû dana bû . Eskandanî bijlî rêberê serhildanê bû , bepirsê giropekê jî bû . di wan rojan da sergêriya karwanî di stuyê Eskandanî da bû . Belê da ci alozî û giriftarî di gurêda ne mînin û da zîrekî û ne tirsîya xwe xweya ket Eskandanî bi berî karwanî keft .

Cendirme û Polîsa li balexna bajêrvanîyê ku cada serekî bi rex ve di çû bi reşas û tiveng bi Biwîsa me da bûn , li dawîyê min bihîst (120) sed û bîst kes bûn û du reşasen Birêñ yên sivik di gel da bûn .

Li wî demî cêba Eskandanî gehiştîye nêzîkî bajêrvanîyê , êkser ji du lûlîyêñ birêna û sed û bîst tivenga agir bi ser cêbêda barî , ez di tirombêla diwê da bûm û min dît êkser cêb çû xwarê û di nav dukêlê wer bû . Vê dîyardê bitinê êk deqîqe kêşa û neferên dinav cêbê da hemî şehîd bûn ku heft kes bûn : raîd Eskandanî , molazimê êkê Necdî , molazimê êkê Şabazî , molazimê êkê Necefî , molazimê diwê Mînayî û serbazên mukelef Musa Reffî û Behlul li tenîst êk di agirê serhildaneka behlewanda belê ya ne ber wext hatine sotin . Paşî dengûbas hatin ku termên wan bi temamî yên helweşîyaîyn ji ber hindek Saku jî di nav cêbê da bûn û demê ba dihat Saku di hejandin û Cendirme di tirsîyan û dest rêj li cêbê dikir û bi vî rengî heta spêdê te-

rim di hatine gulle baran kirin û heta ji êk çûyîn.

Tiombêl êkser rawestan û em li beramberî bajêrvanîyê hatîne xwarê û li rexê cadê û paşî li ber dîwarên balexanê beramber , me xwe parast . Di tiombêla me da êkser molazimê êkê Ihsan birîndar bû em evê mayîn beramberî wan rawestîyayîn . Êk ji birîndarêne me xwe gehande bin tiombêlekê û reşaseka Birêne siwarkir û kete dest rêjê li beramber wan . Piştî zîyanêne despêkê hîç zîyaneka din me ne bû me şîya çar kesa ji cendirma bi hingêvîn ku di pencereka balexanê da teqe li me dikir .

Şerî demekî vekêşa û êkser ('Eqîd Azer) rêberî kire stuyê xwe û min hind dît yê li nîva cadê rawestîyayî û bi destî işaretî didet ku bi dû bikevîn . Mîn hîzir kir ku dê ji piştê ve hêrişê bete ser bajêrvanîyê eger delîve bo hilkevît . Li demê hindek hevalêne me berhingarîya wan dikir , ez û çend kesanêne dî li cadê derbazbûyîn û bi dû Azer ketîn , ew û du kesen birîndar mabûne li rexê cadê . hindekêne din li nihumê duwê yê balexanê û li bin dîwara teqe li binkê Polîsan dikir û heta nîva şevê mabûn û paş li tarîyê xwe gehandibûne nav tiombêlê û şiyabûn hindek pare û hindek amûrêne pêtivî derbaz biken û her êkî çarenivîsekê cuda bi serî hat û li dawîyê hindek gehîştine me .

Êk ji birîndara birayê min bû ewê dî Behram Daniş bû . Birîndar li pişta xwe kirin û birne kempa Suvyeta belê wernegirtin . Vêca bi neçarî birîndar li cihekê ji derveyî bajêrî veşartin , belê spêdê Cendirme bi ser me hilbûn û girtin û hinartine Tehran bijlî van dû kesa , sê efserêne din jî birîndar bibûn : neqîb Behram Daniş , molazimê êkê

Husêن Fazilî , molazimê diwê û Elî Sunaî , û çar serbaz jî : Mes'ud Tefrîşîyan , 'Elî Ekber Qiruhiş , 'Elî û Suq û Şahîn li cihîn cûda cûda heta gehîştîne (Şahrod) girtin û veguhastine girtîxana înzîbata li Tehran . Vêca bi vî awayî ew serhildana aza û zîrekane li (Xorasanê) serhildayî , piştî pênc roja li (Gunbet) di xwîna şehîdên xwe gevizi.

Demê em li dû Azer ji şerî derketîn em di gerim bûyîn ku rêkekê bibînîn da hêrişê bibeyîne ser binkê Polîsa û ji nişkekê ve bersiva wê şikandinê bideyîn , belê çend em ji qada şerî dûr diketîn hindî dî şûyînwarêن şikandinê li me dîyar dibûn û wira me ya şerî di hate xwarê .

Ew dirbê li (Gunbet) ketî , em gêj kirbûyîn . Ji derveyî bajîrî , bi du kîlumetra me li pişt girekî xwe vesart ku bi hizra me emê xwe di parêzîn , belê bi rastî karekê bê me'na bû . Çunku kes li dû me ne dihat me jî ne di şîya çû bikeyîn li wir Azer got : Li vir ci bikeyîn , rabin da bi rê bikeyîn . Ewêن hatîne kuştin , hatine kuştin gelek dê birîndara jî girin . Divêt em bi zutirîn dem xwe bi cihakî ra bi gahînîn da bi şeyîn bi vê hijmara kêm berevanîyê ji xwe bi keyîn . Vêca qesta nav daristanekê li rexê rêkê kir li wir (Raîd Şîvaî) ku berpirse darayî yê serhildanê bû nêzêkê şes hizar Tumena vê bûn , got : Dur nîne em bi neçarî jêk veqetîyêن , bastire em van para li ser xwe belavkeyîn . Her êkî ji me şes sed Tumen gehîştinê . bi bê taqet û ne xweşî û wire ne mayî em bi rê ketîn . bi tinê yê bê taqet Azer bû . Belê her çewabît bi nemirî û nemayî û rûyît me xwe bi (Şapesind) ragehand . Li (Şapesind) jî binkeyekê Cendirma hebû , berî bi gehîne (Şapesind)

Azer pêşinyar kir ku seh û sîyê jê bi keyîn û egr hijmara Cendirma ya kêm bît , ji çek keyîn ji ber ku hêşta em ne gehiştbuyîne qonaxa kiryarê kes ne bû dij . Azer bi xwe çû seh û sîyê û hat û got bi tinê êk Cendirmê nivstî yê lê û êkê din jî yê nubetê lê di ket û pişinyara xwe dubare kir , belê em hemî bûyîne dij û me xwe ji binkê Cendirma dûr xist . Se'et nêzîkî (12) diwazdeyî şevê bû em li rex daristana (Şapesind) rawestayîn û heta spêdê me nubet li xwe girt .

Azer nexşekêş û hesib nasekê baş bû . Çend cara çû bû (Turkman Sara) ji bû kirîma hespa û li wir yê şareza bû çû ser darekê û paş sehkire rêkê li vir molazimê êkê (Por Hurmizan) berê xwe da me û got : (Hingu divêt em çi bikeyîn , bi van diwazde tivenga dê çi ji destê me êt . Eger pêkve bibîn dê pitir metirsî li ser me hebît û bi taybet ev tivenga bi kojêt me ne . Eve ez çûm) . Ev gotine kir û tivenga xwe havêt û bilozê serbaziyê ji ber xwe kir , û difna postala xwe birê û got : Ez dê çim peywendîyê bi hizbê kem . Bi xatira hewe û kete rê . axftin û reftarên Porhurmizan karekê xirab bi ser me da hêla .

Bi egerê tırsîyanê em ketîne dû Azer û çûyîne di nav daristaneka berfireh da li wir me pîcek hest bi îmnahîyê û te-nahîyê kir daristanê nêzîkî deh roja em dinav xwe da veşartîn . Li wî demî pîremerekî ahêñ xwarnê bo me di ïnan . Her wisa Azerî çend cara hindek kar pê di spartin û carekê hinartibû (Gunbet) da zanîyariya sebaret kuştin û behs û xebêrin li wir ji mera bînît . Her li wî demî Azer ji bû harîkarîyê carekê çûbû kempa Suvyeta , belê gotibûyê

em hingu na nîyasîn û di vêt em pisyarê ji serkirdayefîya xwe bi keyn . Carekê jî me di vîya di nav daristanê ra xwe bi (Gurgan) ra bi gehînîn , belê em rojekê temam di nav pûş û dexel û firehîya daristanê da winda bûyin . Azer daxaz ji wî pîremêrî kir - me navê wî ne di zanî - ku hindek cilkên Turkumana ji mera peyda biket da bi şeyîn bi wan cilka ji nav pûşê daristanê derkevîn . Şevekê Azer ti-veng li cihekî veşartin û pîremêrî û hevalekê xwe cilkên Turkumana ji mera anîbûn . Pîremêr heta nêzîkî cadê di gel me hat û paşî xatira xwe ji me xwast û çû . Bi hizra min niho ew pîremêr ne maye , xwedê jê razî bît . Dîtina rîkê li (Turkuman Sara) ne bi sanahîye em danekê rojê her li wê deşte zivrîn û li dawîyê her gehiştîne wî cihê em jê çûyîn , wî demî (Neqîb Pizîşkîyan) pêşîra Azerî girt û çivîn danê û gotê : Eve çî ye ? hingo ev efsere înaye vê bîyabanê (deşte) wek na' urê her di zivrînin .

- Hejarî hêşta xwe hîsab di kir ku efsere - her dem du got : (Rêberê rîzdar di bînî te ci şaşî kir) . Belê Azer herdem yê li ser xwe bû di vîya karêñ bi mifa bi ket . Axftin hemî cara di gehiştê hindê ku ew gotin û peyv ên berê hemû neteweyî bûn . Li dawîyê (Raîd Şîvaî) sebir nema û kire hawar û got :

- (Hiş bin ! guneha Markis û Engils ci ye ! eger em di tîyur û rînmayêñ wan ne gehîn û bi şaşî bi kar bînîn .

Nêzîkî nîvro bû çar kesa dewre li me da û bi Turmumanî çend axftin di gel me kirin û wek diz û rîgira em gunehbarkirîn . Di bêjin li (Turkuman Sara) deng û bas zûtir ji Teligrafê belavdibin . Xeberê çûna çend mirovekêñ

---

<5> Hewar wate (me'na) hube , zom .

---

bîyanî gehisyibû hemî ciha . Azer zimanê Turkumanî di zanî , gotê em kîne û kef lê kirin eger bêt û müyîyek ji serê me bi kevît eve Suvyet dê babê wan îne der . Azer wira wan di zanî û ji ber hindê gotê eger hun me bi kehînine (Gurgan) dê du demanca deyîna hingo . Her çewa bît em veşartîn û xwarin ji mera anî .

Vegerîyan da êvarî bêñ me bi bene cihekê hêmin û rihet tir . Azer bo çavdêrê çû ser darekê û her êk ji me se'etekê nivist .

Êvarî hatin û çar hesib ji mera anîn û bi şevê em bi birîne nav zomeka revenda , belê demê demançên xwe wergirtîn lêdan û çûn . Piştî şîv xwarnê di nav wê zomê da daxaza (50) pêncî Tumena bo her êkê ji me kir bo gehandina (Gurgan) belê piştî wan pare wergirtîn em veguhastîne zomeka din . Di nav wê zomê da Azer hevalek peiydakir û em spardîn û xwe ji me cuda kir . Li wîr em şes efser mabûyîn û her êkî bi rengekî xwe varî kir . Li vê zomê di viya her çîroka berê dubare bi keyîn , belê me xwe ne da ber wî barî û tulazek razî bû bi (200) Tumena me heta ser cada Gurgan bi bet . Roja paştir nîva şevê em gehîşîne ser cadê . Careka dî (Raîd Pîrzade) ture bû piştî çûyîndan û hinde axiftinê kirêt û bê serûber derheqê Azer û Eskendanî kirîn di gel Raîd Şîvaî em hêlayîn û Raîd Şîvaî berê berpirsê kempa (Sewzewar) bû nîyas li wir hebûn , biryar dabû pêkve xwe bi gehîne (Sewzewar) û li wir xwe veşerîn û peywendîyê bi hîzbê bi keyîn . Ev kare kirin û paşî zivrîne cem me . (Pizîşkîyan) jî bi dûv serê xwe ket û got : Eve ez jî çûm , molazimê diwê (Da-

nayî) jî got : Eger bi tinê bi çîn baştire û xatir ji me xwast û bi dû serê xwe ket . Ez û molazimê êkê (Keyîhan) mayîne digel êk . me biryar da bi siwafrî xwe bi gehînîne (Gurgan). Belê ji ber cilkêt me yêt diryayî û bê serûber çû şufêr ji mera ranewestan û ne çar bûyîn bi pîya ketîne rê .

Li daristanê Suvyeta dar li payîtunên hesip dikêşin bar dikirin . Min bi wan çend peyvîn Rosî ewêni di zanî min şîya êkî ji wan tê bi gehînim û digel rêk bi kevim ku bi (20) Rîyalâ bo her êkî ji me siwar ken heta (Gurgan).

Nêzîkî se'et pêncî nîvro em gehîstîne (Gurgan) û meha Remezanê bû , wê rojê bi wî ser û sewdayî me ne şîya baregayê hîzba Tude bibînîn , me biryar da bi şevê li mizgeftekê bi mînîn û hêsta êk se'et mabû bo fitarê em çûyîne çayixanekê ya nîv vekirî da tiştekî bi xweyn . Me biryar da wek şivan xwe bi deyine nîyasîn û bêjîne xelkî em hatîne vir da karekî ji xwe ra peyda bi keyîn . Ez wek (Nîşaporîya) di axiftim , min ew rol baş bi cih di îna û bo nimune mîz û kursî li çayxanê hebûn , belê em wek gundîya li ser 'erdî runiştîn û ketîne ser nan û penîr û çâ vexwarnê . Li wî demî du Cendirme hatine çayxanê ji bû fitarekirnê . Bi dîtina wan zeraf li me çû , me ne şîya hîzir bikeyin ku rêka wan ya di vir ketî . Belê di ser hindê ra jî me xwe ne şepiland û li besivdana xwedanê çayxanê me got em gavanîn û hatîne vir ji bû peyda kirina karî . Êk ji Cendirma got : Çendî bi keyfî ! kar li kîrê heya ? xelkê vir di bê karin û bîst û çar se'eta paldene ber dîwara û Tirya kê dikêşin . Me wisa hîzir dikir ku Cendirma di vêt bi vê rengî me xafilken û delîvekê bibînîn da me bigrin vêca

hosa em her bi ber êk ve di çûyîn . Em ji çayxanê dûr keftîn û me hizra dîtina çareyekê dikir . Hate bîra (Keyhan) ku keç meteka wî ya li (Gurgan) şû bi zelamekî kirî navê wî ('Erebe) û dizanî ku mîrê keç meta wî du-kandare. Her çewa bît me dukana wî dît paşî saxû selametîyê , du destên cilka bo me peyda kirin û bi şevê em birîne mala xwe û keç met bi dîtina wî zor şad û keyf xweş bû .

Spêdê xwedanê malê bi şerim ve daxaza lêborînê ji me kir û yê heq bû bi tirsît du mirovên qaçax di mala xwe ve bi hewînît . Maleka baş û paqij û xawêن bû , belê piştî çend sala ji bû dîtina xizmekî ez çûme (Gurgan) min çend hewil da şûn pê û bîranînê xwe li bajêrî û çayixanê û mizgeftê bibînim . Ne min kes dît û ne min nav û nîşanên kesê zanîn.

Eger di sax bin xêr di bîranîna wan da bin û eger ne ma-bin jî xwedê lê xweş bît .

Spêdê , binavê du qotabîyêن kolîja Yasayê em siwarî ti-rombêla (Benderşa) bûyîn , me xwe diyar kir ku me divêt pişuya Havînê li ser lêva zeryayê bi borînîn . Li (Benderşa) Endazîyar (Daxte) berpirsê hizbê bû , zû bi dest me ket . Wî em li mala kirêkarekî li (Benderşa) da veşartîn û raspardîne kirêkarekî ku li joreka darî digel dayika xwe di jîya . Piştî sê çar roja Suvyeta tirombêlek ji mera terxankir da me pê bi gehîne cihekê emîn û tena li (Turkuman sara) .

Piştî serhildana efserên Xorasanê . Çend efser li Tehran tengav bibûn û hatibûne girtin û hindekên dîjî di rijdbûn li

ser hindê ku bi gehne me . hizib ne çar bû me û efserên tirs li ser kombiket . Bo vê meremê zomên zuzanên (Suvyan) li nav bera (Gunbet û - Mirawe Tepe) ber çav kir bûn. Li wê zomê çi behs û xebar li wir sebaret supayê Îranê yan yê Suvyeta ne di hate bihîstin . Hizbê hemî efserên berze û belavbûyî li wir komkirin bi tirombêleka (Zîsî) em birîne wê zomê - tirombêl ya pir bû ji alifê hişk û em li ser alifî nivstbûyîn . Şufêrê tirombêl serbzekê supayê Sor bû . Turkumanekî rê nîşa dida . Berî bi gehîne (Zomêt) Suvyan , em li (Gunbet) birîne kempa Suvyeta û li wir raîdekê Suvyeta gazinde kirin û got : Çima hingu dest da vî karê ne yê dirost û du destên cilkên Suvyeta kîrine ber me û em birîne kempa xwe li (Gunbet) . Demê gehiştîn me dît em bi tinê nînîn . Deh pazde kesên dîjî berî me gehiştibûn .

Ber bere hijmara me gehiştê cil kesa . Berî me Azer jî gehiştibû . Şeva duwê cilkên serbazên Suvyeta ji me wer-girtin û cilkên me zivrandin û em hinartîne zomêt (Suvyan) û gotine me : Heta vir me hun anîn û karê me digel we bi dawî hat . Hingu çek yê heyî û pêtivîye hingu ageh ji xwe hebît) ew çekên Azer di pûşê daristanê da veşartîn digel xwe anî bûn . Ji bilî hindê her kesekî demanca xwe hebû .

Em runiştîn û me lîjneyek bi navê (Komîta Supayê Millî) damezrandin û Azer bû serok û çend kesek - ji wane ez - bûyîne endamên komîte . Me li zomêt (Suvyan) kempeka biçûk dirost kir . Karê me tunebû , ji bilî berevanîyê jixwe bi keyîn . (Ehmed Qasimî) berpisê rêkx-

irawa hizbê li (Gurgan) ev çende ji mera gotibû , roja paştir hate (Suvyan) û got : Çaverêyî firmana hizbê bin . Bitinê mulet da me ku ew binkê biçük yê li nêzîk zoma (Suvyan) ji çek bi keyîn , ji ber tenahî û êmnahîya zomêt (Suvyan) . Belê got di vêt ew kar encam bi det bê xwîn rêtin . Serokê binkê Cendirma cêgirê efserekî bû bi navê (Keyanî) kê berî hîngê li pişka topxanê bû li ber destê hevalê me (neqîb Rezim Awer) piştî giftûgûyê digel (neqîb Rezêm Awer) Cendirme bê rê bibûn û hatine cem me . Vêca bi wî awayî li navenda maha gelavêjê 1324ê em li zomêt (Suvyan) bine cih bûyîn . Her li wî demî Fîrqa Dîmokrata Azrbaycanê damezrabû êkemîn ragehandina fîrqê li roja sêyî Gelavêjê 1324ê li wir gehîse destêt me . desteka damezrînera fîrqê bûçûnên xwe di wê ragehandinê da xweya kirbûn . Ehmed Qasimî ew ragehandin ji mer şandibû .

Nêzîkî bîst û pênc roja em li wir mayn heta şevekê xember da ye me ku xwe komkeyîn û amadebîn û bo çûnê . Nîva şevê bi harîkarîya layîteka desî , em sê çar kîlometra bi pîya çûyîn , li alekê (Tukuman sara) li piştîheka pûşî ku Suvyeta bo alifê hespên xwe dana bûn em kombûyîn . Li wir çend tirombêlekên Suvyeta li pişt pûşî rawestabûn . Raîdek ku berpirsê wê pişkê bû , û farisi zan bû digel me axift û gazinde ji karê me yê ne dirost kîrin û got bi revîna hewe ji nav rêzên supayî giringtirîn bingeh ji dest da û hun ne şen çû biken . Paşî got karwanekê bûş yê supayî yê bi rêkê ve ku ( Feyîrozgû ) yê hinartî bo girtina hingu . Ji ber hindê gîyanê hingu tirs ya li

ser û em ne çarîn hingu veguhêzîne cihekê dî .

Rojava roja paştir em bi rê keftîne ve û li cada destê çepê me lada û li sinorê ( Estara ) derbazbûyîn . Vêca bi vî awayî , li dawîya meha Gelavêjê li gundekî bi navê ( Şa Olan ) li nêzîk Baku bi rengê nîv girtî em vehewandîn . Sê mehên ( Rezberî û Gelarêzan û Sermawezê ) em li wir mayîn û bi rastî bi rengekê rêzdarene em girtîn . Wek her cihekê dergeh lê hatîye girtin . Demê hindek kes piştî hindek buyera bê kar di mînin , dikevne ser û stuyên êk û du û kula dilê xwe bo êkê û du di rêjin , li wir jî her wisa bû . Li despêkê pêleka dij ber beramberî Azer serhilda bû . ( Danayê ) berpirsê serekî yê serhildana Xiriş ( Bêber ) paşî du berekîyê destpê kir . Ew bikir û vekêşî gehîşte lêkdanê û ewê rojê serokê gitrixanê ya mîhvanxanî ( Xwe têkel dikir ) . Raîdekî em hemî komkirîn û got : Hun mîvanenê mene . Berjewendîya hingu ya di hindê da ku bo demekî bi rengekê dostane li virîn û em çavdêrîya hingu bi keyîn . Me ne çar neken reftarê dij baramberî hingu bi kar bînîn û bi keyne yasa supayî .

www.finzi.info

## **Pişka Diwê**

www.finji.info

FIRQA  
DEMOKRATA AZİRBAYCANË

www.finzi.info

**D**i nav van behs û mil milanê da û pêk hatine vê , roj-ekê xeber hat ku serhildanek ya li Azirbayicanê rabûyî serokê kempê em bi vî xeberî agadar kirîn û em komkirîn û di nav peyîvên xwe da got : (Gelê Îranê yê rabûyî û despêka wê ya li Azirbayicanê serhildayî û demê milletî serhilda çû hêz ne şen rêkê lê bigirin û xelkî pêtiv bi supyî heyî , hîvîya min ewe ez zwî hingu li serokayetîya supayê millî yê Azirbayicanê bibînim . Ez yê pişt rastim bo rê-veberîya supayê Azirbayicanê kesê dî nîne ji hewe pêve-tir. Di vêt hûn êkemîn şana wî supayî dirostken û reberiya wê bi ken . Vegerîyan û hevrikî û mil milanê û pişikdarî di serhildana xelkî da dê dîrok hemî ronket . Piştî van go-tina me çaverêyî vegerîyanê kir . Ew roj 21 / Sermawezê / bû û hêsta serhildana milletê Azirbayicanê bi ser neke-tibû. Li dawîya meha Gelarêzanê bû demê serê serhildanê xweya bûyî . Sovyeta bi şîreta Azer em kir bûyîne çend girop . Berî hemîya Azer digel heft kesên Azerî di zanî hi-nertibûn bo rêberîyê û rê nîşanderîya fidaîyan . Ez û bîst û du kesên din qolê diwê bûyîn . Erkê me damezrandina êkemîn şana supayî bû .

Roja 10 / Befiranbarê em gehîştîne (Tevrîzê) û wî demî

serhildan serkeftibû . Li wir xanîyek ji mera amadekirbû.

Azer serokê giştî yê supayî bû roja diwê ji gehiştina me hat bixêrhatin bi me kir û me corekê cilka ji supayê Azirbayicanê ra pêşinîyar kir , piştî heşt yan deh roja cilik amadekirin û bo cara êkê me cilkêt Yunîfurim yêt supayê Azirbayicanê kirne ber xwe . Erkana supayê Azirbayicanê bi serokayefîya Azer damezra û ji alê hijmar û rêkxistinê ve li dû hizir û bîrêt Fîrqa Dîmokrat hatibûne damezrandin . Belê me xwe rêexist û rêveberîya (Serbazîyê) bi serokaftîya (Raîd Şîvaî) damezra û me dest bi serbaz girtinê kir . Bo rêveberîya serbazgeha me mifa ji wan balexana wergirt ewên xwedanê wan revîn û ez bûme berpirsê sê sed û pêncî serbaza , min cilik kirine ber û cihê me bû xanîyekê axyekê ji ewên revîn . Me lez dikir da berî çejna Newroza 1325ê bişeyîn rêpîvaneka serbazî li meyidna Tevrîzê li bersingê (Pêşwarî) pêşkêşkeyîn . Serbazên min jî digel tupên xwe da di wê rêpîvanê da pişkarbin . Em qerdarêن harîkarîya Sovyeta bûyîn ku me şîya di du meh nîva da supayekê rêkxistî bînîne meydana rêpêvanê .

Sovyeta harîkarîyeka karîger ji alîyê rêkxistinê û fêrbûnê û meşqê ve ji mera kirbû . Li roja êkê serbazên Sovyeta çend gulle top li meydanê havêtin û serbazên me fêrî gulle havêtinê kirin . Berpisê kel û pela 'eqîdek bû biriyarên mezaxtinên çekî û fişeka û mezaxtîyên dî di destê wî da bûn . Azer çû şîret karêن Sovyet nebûn . Belê hemî pişkêt dî şîretkar lê hebûn , ewjî efserên Azirbaycanî yên ser bi wan ve bûn . Hindeka ji wan wek me cilkên

Yunîfurim supayê Azirbayîcanê kirbûne ber xwe . Bo nimûne betaliyona ez jê berpirs (Fewca topxana serbixwe) yan bi gotina Azirbayicanîya (Pirîgad Tup Taporî) raydek û molazimek û heft heşt 'Erîfîn ser bi supayê Sor ve di gel min da bûn û karê wan pitir layên fêrbûnê di girtin . Sovyeta (56) topê 75 milîm dijî tanka û (120) topê 405 milîm dijî balefira û çendîn gulle top û fîşek dabûne me . Bara pitir ji wan çeka Elmanî bûn û di şerî da dest bi supayê Sor ketibûn û pêtivîyayetî bi fêrbûnê hebû heta bi zanin bi kar bînin .

Hindî ez agadar efserên supyê Sor dest li serokatîyê ne dida û hewil dida serokayetîya me binecîh bibît , çû caran dest li karûbarêن me ne dikir da serbilndîya me bişkênin , bo nimune rojekê êk ji wan rayda raporta pişka me da vi raydî , her çende ez neqîb bûn û ew ji min mestir bû belê req digel axift û gotê : şerim na keyî li pêş serkirdekkî rapportê di deye min , divîya me tê bi gahînin ku ew yên hatîn harkarîya me biken da supayê me rabîte ser pîya û paş me bi cih bihêlin . Her çewa bît em li pişkênen xwe di bala dest bûyîn .

Hêza çekdarêن Azirbayicanê çend cor hebûn , efser çar cor bûn . Li demê serhildanê hindek ji endamên fîrqa Dîmokrat yan rêberên sendîkayêن Kirêkar û Cotiyara hindek ji xebat kerên digel wanda pişkarî di serhildanê da kirbû . Wan bi xwe dereca efsera da bû xwe . Paşî ev dererce ji layê fîrqê ve hatîbû pesindkirin , belê ewan meşqa serbazîyê ne dîtibû . Bi rastî di serhildanê da bibûne efser . Ev efsere pêşmerge bûn .

Corekê dî yê efsera hebû ewjî berpirên hizbê bûn ku bi navê reberên siyasî yan berprsên kargêrî hinartibûne pişkên supayî û pila efseriyê dabû yê. Corê dî efserên derçûyên kolîja efserî ya nû hatîye damezrandin bûn .

Piştî serhildanê kolîja efserî li Azirbayicanê hatibû da-mezrandin û hijmareka xwîndikara di demê du meha da bi pila milazimê duwê yan sîyê derçûbûn . Corê dawayê em bûyîn ku bi pilên xwe di nav supayê Îranê da hatibûyîne di nav supayê Azirbayicanê . Em nêzîkî (70) heftê kesa bûyn û bi bûyîne stûna supayî . Bi vî awayî çar corêt efsera li supayê Azirbayicanê xizmet dikir û têkhalî êk û du bibûn . Efserên pêşmerge dan bi kesê ne dikir û nazdarî dikirin û di got :

- Me hikumet bi zand û baskên xwe ya damezrandî û pile û derece jî me bi xwînê yên bi dest xwe ve anînîn û di vêt em li pêşîya hemîya bîn , belê me xwe xwîndewar û xudan serbor di dît û ji wan şareza û zanatir ji bo rêveberina supa û hêzên cekdar . Gotinê wan bê nîzamî ïna bû di nav supayî da û tirs peydakiribû .

Fîrqa Dîmokrat di gote me : ( Efserên Faris - Faris efserler - vî babetî aloziyek êxistibû di nav efsera da ji ber ku ew ji supayê Îranê cuda bi bûn û êk cor ne bûn . Hindeka di serhildana Xorasanê da pişkarî kir bû û hindekên dî jî ji Tehran hatibûne di nav supayê Azirbayicanê da . Corekê din jî di bê fikra sîyasî bûn , yan ji ber soza wan yan jî ji ber hindek egerên kesî mabûne li Azirbayicanê . Hindeka jî goman li ser hebû . Di vîya ev kawdane hatiba çareserkirin . Rojekê em hemî daxazkirîne yana efsera , li

wir rêzdar Pêşewerî , Bêrîya û Kawîyan Wezîrên şerî amadebibûn . Kombûnê bi peyîva Pêşewerî destpê kirin û pêşinyarkir ku ew kêş (doz) her efser bi xwe bi awayekê dîmokratî çareserbiken . Belê efsera dengê xwe li êk û du bilind kir û kar gehiştê hindê Pêşewerî civîn dane efserekî . Li wî demî bi nezanîn yan bi nîyazên ne dirûst pirûpaginde dijî (Faris efserler) di hate belavkitin . Heta duberekî gehiştê hindê ku hevalekê me (Raîd Sefwet) serkirdê kolîja Serbazîyê li cihê karê xwe hate koştin . Her wisa (Rayd Xel'et Berî) serkirdê betaliyona topxanê li pişt mêza karê xwe gulle baran kir . Belê bextê wî yê sipî û sawêlkî û neşarezayiya teqekerî gulleke çûn û pê wî birîndar bû . Li kirjîyeka husa kombûn hatekirin û efserên pêşmerge bi gefa û tund û tîjîyê bi dawî anî . Li dawîyê (Eqîd Penahîyan) ku li cihê Azer bibû serokê supayê Azirbaycanê pêşinyar kir yekbûna efserên supayî bidene lîjneyekê ji hindek efser û çend endamên komîta navîn ya fîrqê têda bin . Biryar li ser vê pêşinyarê hate kirin û bo demekê berwext kêşe di nav da neman . Blê delîva bîcîh înanê ne dayê .

Min xweya kirbû ku (Azer) li şûna (Penahîyan) bibû serokê erkana supayî . Azer li meha Gulana 1325ê lada bû û bi navê pêhinvedanê hinartibû alê dî yê sinorî . Dilê wî û Pêşewerî jêk mabû . Ew yê razî ne bû ji karêt fîrqê di nav supayî da . Bê guman Sovyeta bi şîreta Pêşewerî ew bi rêz û hurmet birbû (Bako) . Çend meha li wir mabû , belê demê supayê Sovyeta axa Îranê bi cih hêlayî careka dî ew bi rêz û hurmet vegerand ve û Pêşewerî daxwaza

lêbûrînê jê kir sebaret ewa qewmî di navbera wan da . Li pêşiyê birine Wirmê û paşî birine Erdebîl . Belê demê supayê Îranê dest bi hêrişê kirî vegerandine Tewrêzê wek berpirsê caran , belê mixabin delîve ne bû sebaret serketin û şikandina bi lez ya şoreşa Azirbayicanê gotin di zorin û min wek efser boçûnên xwe hene . Boçûnêt efserekê di kenalekê teng ra derbazbûyî . Bi boçûnêt min malka serketina bi lez û her wisa şikestina bi lez ya şoreşa Dîmokrata Azirbayicanê harîkarî û yarmetîya supayê Sor bû yan rastir bêjim pişt bestin bi Fîrqa Dîmokrata Azirbayicanê bû.

Bi dosfînî û harîkarîya birayane ya Sovyeta bû . Bê gomân dirûsim û daxwazên Fîrqa Dîmûkrata Azirbayicanê hemî di dirust û pêşkeftî bûn:

Azadîya dîmûkratî , Ziman , Qelem , Çand û Otûnomî di çarçuvê Îraneka serbixwe da . Sebaret daxazên jîyara baş bo texa bin dest , gihurînên peywendîya di nav bera kirêkara û xwedan kara , axa û kirmanca . Cihê gil û ga-zindên hîc azadî xwazekî ne bûn . Belê ev dirûsim û daxwaz belav ne bibûn di nav milletî da . Bi dirêjîya sê çar maha ji pêk anîna Fîrqa Dîmokrata Azirbayicanê heta 21î Sermaweza 1324ê roja serhildanê û serkitina fîrqê şîya sercam cemwarê kirêkar , Cotîyar , Bircîwazîyên biçûk û welat perwerên Azirbayicanê , ji bo şoreseka millî û dîmokratî amadebiken ? raste berî damezrandina fîrqê , hindek kirêkar bi rêya hîzba Tude dikirn û hindek rêkx-irawêن pirt û lawaz li hinde cihêñ Azirbayicanê damezrandibûn , belê bizavêñ ne di karîn di demekê kurt da

civaka Fiyodal bi gihûrin beref bîr û hizreka nû biben bo şoreşgêrîyê û gihurîna binwaşen civakê . Di bît ji ber kawdanên ber wext û ew delîva hilketî ku mifayî ji supayê Sor li Îranê wergirin . Fîrqa Dîmokrata Azirbayicanê hatibîte ser bawerîya bi lez dest bi serhildanê bi ken.

Bê goman supayê Sor pişkarî di serhildanê da ne kirbû , belê berevanî û ji şoreşê li hemî ciha hest pê dikir. Her ev heste bû bûye egera hindê ku supayê Îranê li Tewrêzê û bajarên dî berevanî ji xwe nekirî . Her çewa bît serhildan serket û hikumeta millî ya Azirbayicanê damezra û li salekê kete rêkxistina binaxey wek : Belavkirina 'erdî , xomalî kirina hindek karxana , dest bi serdagirtina nehez û dûjminên şoreşê , pêkanîna supayê millî yê Azirbayicanê , danana Zankoya Tewrêzê û bi şev û roj kar dikirin ji bo xweşkerina rêk û banên Tewrêzê û qêrkirina wan ku heta nihu jî zanko û qêrkirina cada hêşta bîranînên wî serdemî ne , belê di ser van hemî kara ra çima ne şiya bîr û hizrêt cemawerê rêncber bi bal xwe ve rakêştin ? .... pîtivíye eger û huyê binaxeyî yê pêkînana serhildanê û serkeftina wê bête ravekirin .

Li wî demî û evro jî egerê şikandina şoreşa Azirbayicanê vedigerîte nebûna beramberîya hêzîyê di nv bera impîryalîzmê û suşyalîzmê da û ne şarezayê di wî bîyavî da û serkeftina bi lez ya şoreşa Azirbayicanê ya millî her ji encamê harîkarîya berdewam ya soşyalîzmê bû . Belê demê ev harîkarîye nemayî , hikumeta millî ya Azirbayicanê helweşîya .

Ez bi çû renga dijî harîkarî di nav bera nasîyunalîzim û

serhildanêneteweyî yênaazadîxwaz û bizavênkirêkarêncîhanîûrêncberada nînimûbi rişdîminbawerîya pêhey, belêsistemêêkparçeyîûcihanîyêgerwagelênlawazûrêncberlihemîkuncûqulackêndunyayêyamêtî.Saw-êlkîye eger em van milletan ji harîkarîya êkûdu melîlkeyin(Heramkeyin).Belêrastireegerbêjînevharîkarîyeherbûmukimkirinashoreşeye di navcivakîda.

Bi gotineka din, yarmetîûpiştevanîyaderve makashoreşgêriyavnaxwe mukim diketbelêshoreşbi berhem naînît. Shoreşa millîûdîmokratîya Azirbayicanênimunêzîndîyêvan tuxme piştevanîyabû. Piştevanîya Eketîya Sovyet bo vê shoreşepitirbûji pişkdarîyxelkêrêncberêAzirbayicanêbi xwe. Maka serkeftinûşikandinêherdi vêda bû. Hindîpiştevanîheybehna shoreşedihatûdi çûbelêdemêpiştevanîhetîyebirînshoreşhelweisîya.

PiştîsupayêSorAzirbayicanbi cih hêlayî, ew germatîyalidespêkêheyîsarbûûgiropêtnehezûdest bi dest bi xwepîşandana kirûxweybûku shoreşa Azirbayicanêrihêtxwekiwîrda ne hêlabûnûbi tinêPêşewerî di gelrêzdaran: QiyamîûPadganûdi gotin Îlhamîû Firîdun İbrahîmîûhindekêndîkuew demekêkêm bûbibûneendamênbinkêhizrîyefîrqê, bûnyêtkarêtshoreşedikirin.

Cuynekêdîjîhebûn(Întîhazî-dûrû)ketibûnedinavshoreşedaûçenddirûşmînlîqalibdayjîberkirbûnûbi germîdestdiqutanûvedgêranûbihizrawan evene binwaşenshoreşgêriyê, heta hindek cara Pêşewerîbi xwejîhindekkiryarênseyirbi tayabetdi nav supayıda di kirin.

Wisa diyar bû ku hêşta bawerî bi supayê rêkxistî nîne . Tinê pûte bi cekdarên (Fîdaîyan) hebû çûnku di kawdanekê taybet da hatibûn û hindek karên şoreşê kir bûn . Li bîra mine carekê Pêşewerî hate seredana kempê , li demê seredana wî efserê nubedar mulazimê êkê (Dîyanet) serperişîya xwarnê li xwaringehê dikir . Pêşewerî hinarte dû û rexne lê kirt ku çewa li pişt mîza xwe nîne . Efserê nubedar jî bû ronkir ku nabît li pişt mîzê bît . Di vêt serperişî û çabvdêrîya hemî kara bi ket ji wan belavkirina xwarnê ye . Pêşewerî ji (ezman dirêjîya) wî ture bû û fermanın da ku bi qutin û lêden . Belê serbaz rawestan û ne divîya li hevalê xwe bi den , belê firmanın da nubedar û fîdaîyan ku bi dara li efsrerê navbirî bi den . Efsera ne razîbûna xwe sebaret vî karê Pêşewerî xweyakir û biryar da çend se'eteka dest ji karî berden .

Belê paş zanî ev biryara wan di vî demê nazik da zîyane bo supayê millî , ji ber hindê zû vegevîyane ve , belê her nerazîbûna xwe dîyarkir .

Pêşewerî jî ji bû dilê efsra xweş bi ket , hindek şevêن Eyînî daxaz di kirine (Şagol) û sebaret kawdanêن şoreşê û kawdanêن dahatî û erkê hêzêt çekdar ji wan ra di peyvî .

Li ber ronahîya peyvîn Pêşewerî û zincîra buyarêن wan roniştina ez gehîştime encamê hindê ku peywendîyeka baş di navbera Pêşewerî ûhizba Tude da nîne . Li bîra mine piştî hatina me bo Tewrêzê li êkemîn civata êknîyasînê di gel Pêşewerî da , û digel bi xêrhatina me û ronkirina helwîstê fîrqa dîmokrat got : Hizba Tude tinê peyv û dirûşma di bêje , belê me dest yê daye çekî û karê

xwe bi cih anî . Li wî demî ev tuxme peyve sebaret hizba Tude ziringêneka ne xweş bûn li ber guhên min . Paşî hewl da me bikene endamên Fîrqa Dimokrata Azirbayicanê , bi bê dengî me hemîya ev daxaze bi pişt guhî ve havêt û bi hizra min demara ne viyana Pêşewerî bo Azer li vir despêkir . Deng bilindbûna Pêşewerî ji nişkekê ve digel efserekî li roniştinekê da berî lêdana efserê nubedar û peywendîyên ne dostane di navbera fîrqê û efserêt hikumî di bît her di binwaş da av ji hindê vexwarbît . Paşî me zanî ku ji despêkê hizba Tude di gel hindê ne bû ku rêkxirawêt hozbî di nav Fîrqa Dîmokrat da bêne piştavtin û kiryarêt fîrqê yêt paşîn pê pesend ne bûn . Belê mecbor di bû bi her çar pîya li dûv wan karêt hatine kirin bi kevit.

Bi her awayekî bît , pişti derketina supayê sor , kiryarê şoreşgêrîyê ber bere paş ve çûn û mirovî di zanî ku kar na êne kirin ji bo parastina kiryarên şoreşgêrîyê , û bi hizra min ev karêñ berê jî hatîne kirin heta pileyeka bilind di zivrîne ve bo gîyanê xwe peristinê . Hijmareka koçeran (mu hacîran) bibûne endam di Fîrqa Dîmokrat da û karêñ giring di destî da bûn : Wezîrê Berevanîyê , Serokê giştî yê Polîsa , Serokê Nubedara , Serokê Înzîbata , Serokê binkê Polîsa û hêş û hêş reftarêñ ven koçera her ji hatina wan bo xakê Îranê şupeka baş di hizra xelkî da nehêla bû bi taybet demê buyîne çekdar digel fîrqê bi dijwarî û bê sinc kardikirin - bi xeyala wan karêñ şoreşgêrî bûn - belê bi rastî pişkeka baş ya cemawerî li despêkê bi dil û gîyan digel fîrqê bûn .

Bêguman eve egerên serekî ne bûn , belku li Tewerêzê

hijmareka rikbera ku berî hîngî rîncber bûn û bi aşkira kombûn dikirin û rojekê hindeka li cadê dirûşmek di gotin :

- Ya şâ son - wate : bijî .  
Terefiroşekî jî ji êk jiwan pirsyar kir .
- Poldaş kîm Ya şâ son - wate : kake kî bijî .  
Ew jî bersiv da û got :
- Hele me'lom degil - wate hêşta ne hetîye zanîn .

Em zor têkelî xelkî ne di bûyn , belê car car demê di gel rîncberêkî yan kesanekî di peyvîn , ji axiftina me di zanî ku em Azirbaycanî nînîn , vêca reftarê wan di gel me xweştir lê dihat û bi aşkira di gotin her çewa bît em di şeyîn du peyva di gel hewe bi keyin , bi vî awayî niffrîn li efserên fîrqê û fîdaîyan dikirin . Helbet hidek ji vane ber-jewendîyêne wane ketibûne ber hêrşen şoreşê , her çende em li kempê di mayîn û jî xelkî di dur bûyiîn , belê piç piç me ageh ji barê sîyasî hebû û di zanî ev kawdane zor dirêj nabin , hikumetek ne bû xelik bi ya xwe bizanît û li dû şîret û rînmayêne wê bi çit . Bi taybet demê hatin û çûn di navbera Tehran û Tewrêzê da despêkirîn . ( Mizefer Feyroz ) cêgirê giştî yê hizba (Qiwam El-Seltene) hate Tewerêzê û Pêşewerî çû Tehran rîyeka aştî yê bo doza Azirbaycanê bibînin , belê xwe ya bû ku hindek kara yê serhildayî û me hay lê bû ku tiştek ji şoreşê ne maye .

Li bîra mine her di wan rojan da efserekê me difna xwe bi ser milkê xwe ve na û got : (bihna neftê ya ji milkêne dihêt) .

Bê guman em efser di sîyasetê da li pişt perda buyîn .

Me civat û kombûn ne bûn ta zanîyarî bi dest me bi kevin , tiştê me hay lê li ser binwaşê dîtinên me yêt rojane bûn . Her çewa bît haya me ya giştî bû . Paş derkeft em zor di şas ne bûyin û me kar dît yê gehiştîye kîrê . Diyar bû dan û standin ne gehiştîne hîc cihekî .

Hikumeta Îranê biryar ya dayî hêzeka leşkerî bi hinêrîte Azirbaycanê . Gelek kur û kombûn li bajarêna cuda cuda yên Azirbaycanê di hatine bestin û bi aşkirayî xwe amad-edikirin bo berevanîyê , durşmê diyar (Olmek war - Dummek yuxdir ) wate : Mirin ya heyî zivrîn nîne .

Bi lez hindek hêzên supayê Azirbaycanê hinartine sinorî bo berevenîyê . Ew çek û kel û pelên Sovyetî bo supayê millî hêlayîn digel xwe birin , ji wan top bûn , mejî ciwar topê 75 mil yêt çiyayî hebûn yêt supayê Îranê bûn ketibune dest me , ez serkirdê wan topa bûm . (2) top bi serkirdayetîya Neqîb Hormizan me hinartine (Qaflanku) . (2) min digel xwe birine (Seqiz) di hawara hikmeta millî ya Kurdistanê . Mela Mistefa Barzanî berpirsê wî bereyî bû . Min top veguhastine gundê (Sera) sê kîlometra dûrî Seqiz bû .

Piştî me hêla bereyî dîtî , min top li cihekî ku bi ser Seqiz da biçin damezrandin û mayîne çaverê belê li çû bera şerî dest pênekir . Bi tinê li demê veguhastina cihê hêza û parastina sengera (Qaflanku) Raîd Qazî Esedullah şehîd bû - mirovekê aza û pir bawer bû hevalekê nêzîkî min bû . Me hemîya divîya zû tola wî vekeyin û di pişt rast bûyin ji nubedarêna xwe ku qorbanîya bi den , belê ji nişkekê ve hemî hîvîyêne me di avê da çûn .

Şeva 21 Sermawezê bû bo serperiştîya erkên Lucistî ez çûme gundekî bi navê (Altuna Xwarê) ku binkê piştevanîya me li êk ji xanîyên wî gundî bû . Li wir ez mijulî xwandina namên ji mira hatîn bûm û xeber hat ku siwarek yê pisyara min di ket . Ew siwarji layê ('Eqîd 'Izet) - Serokê erkana Mela Mistefayî û ji efserên Kurdên Îraqê bû , pasî li Bexda li sêdarê da - nameyek ji mira ïnabû naveroka wê jî her pêk hatibû ji wê ragehandina bi nav û deng ewa hatîye belavkirin ji layê Fîrqa Dîmokrata Azirbayicanê ve , ku têda hatibûn ji bû dûrxistica şerê bira kujîyê birayare berevanîyê nekeyîn û ferman da bû supayê Azirbayicanê vegerîte kempa (Xuyê) .

'Eqîd 'Izeti di nama xwe da têbînîyek nivîsîbû : (Berêz Sultan : Pêşewerî yê revî û rêberên fîrqê jî yên revîn, supayê hikumeta navendî yê hatîye di nav Tewrêzê da û pişta berê me jî heta Mîyandiwb ya girtî . Ji bo parastina pişta bereyî , hun herne (Bukan) beramberî Mîyandiwbê da bimezirin) ji nama wî min hest bi ser zivrînê kir .

Hikumeta Azirbayicanê Raîd Pîrzade bo harîkarîya erkana Mela Mistefa Barzanî hinartibû (Sera) . Min biryar da peyîwendîyê pê bi kem da bi şêm agadarîyeka hûr sebaret bereyî bizanim û bişeyîn pilaneka dirûst bo vekêşanê danîn min teterek hinarte layê mûlazimê êkê (Danayî) ku di sengerê da bû da topa komket û bête (Altuna Xwarê) . Ez jî çûme (Sera) li wir min hindek ji efserêt Azirbayicanê dîtin ewêñ bo harîkarîya bereyê Kurdistanî hatîn (Esxer Îhsanî) serkirdê fewca pîyade, (Mehmud

Tîwayî) berpirsê dawîya bereyî . Min (Morteza Zêrbext) efserê esmanî li wir dîtin .

Yê ji hemîya pêkenîtir erkê (Zêrbext) bû , ku armanc ji hatina wî bo sehkirina 'erdî bû û paşî bi balefirê bêt bombaranket . Li Azirbayicanê bi tinê du balefir hebûn , ku rêzdaran Morteza Zêrbext û ('Elî Cudî) ji (erkê firînê berref Azadê) ji Teharn digel xwe anî bûn . Wan (Qelereska) bumbe jî vê ne bûn . Pê di çu li asmanî naricûkêt destî havêtbane armancêt xwe . Aşkira bû ku (Pîrzade) srokê erkana bereyî , pêş hemîya binkê serkidayetîyê yê bi cih hêlayî . Siwarê maturekê ragehandinê biryara dest berdanê ji berevenîyê gehandibû (Sera) . (Pîrzadê) rêzdar jî bo vavartina rastîyê ji şaşî siwarî pişt maturekê di bît belê paşî serê xwe li Sovyet ïnader.

Min pisýara (Ceneral 'Ezîzî) jê kir ku erkanêt wî li Miyandiwbê bûn belê kesê bersiv vê ne bû , paşî li Tewrêzê hate girtin û li sêdarêdan . Bi neçarî ez çûme layê 'eqêd 'Izet û gote min : (Bi rastî hemî rêberên Fîrqa Dîmokrat yên revîn û tiştek bi navê fîrqê li gurê nemaye . Supayê Îranê jî dê li van du sê rojan hemî Azirbayicanê dagîrket . Sebaret çarenivîsê xwe hun biryarekê bi den . 'Erdê hoza Barzan li vir nîne ku berevanîyê jê bi ket . Bi rastî em yên bi asmanî ve hatîne helawîstîn . Hun jî her wek me yên hatîne helawîstin . Hingu neşen xwe bi gehînine Tewrêzê nehezêt şoreshê li rêkê her ne bît ji bo çekêن hingu dê hewe dene ber gulla . Eger bi saxî jî bi gehne Tewrêzê , nuzanin dê li wir çi bi serê hingu hêt . Bi tinê erkê hingu parastina gîyanê xwe ye. em dê vegerîne

Mihabadê , hun jî bi dilê xwe ne , eger hez di ken digel me werin .

Min li dawîyê zanî ku Sovyeta Pêşewerî şîret kir bû ku dijî supayê Îranê ranewestît , hemî endamên komîta navîn ya Fîrqa Dîmokrat li sinorî derbazbibûn û li Sovyet bineh cih bûn.

Lipê daxaza (Azer) rêk dane efserên li Tewrêzê malên xwe derbazî Sovyetî biken . Paşî hêdî hêdî kar gehiştê hindê ku sinor li ber hemîya vekirin û pêzanîn gehiştin ku kempa (Erdewîl) bi hemî çekêt xwe ve yên derbazî layê dî yê sinorî bûyîn . Eger rêberên fîrqê ne ketibane di gêj-elukekê da û ne ketibane di leza rizgarkirina gîyanên xwe , di şîyan hemî pişkên supayî û fidaiyan û kesên ji xwe di tırsîyan , kombiken û serferazî derbazbiken . Eger pêtiyî bi şer û berevanîyê jî heba di şîyan zîvana (Qetil û 'ama) sê rojîya xelkê bê gunehê Tewrêzê û bajêrên din kêmtil biken .

Ji bû parastina çek û pişkên xwe me biryar da biçîne Mihabadê ku hêşta rêberê Hikumeta Dîmokrata Kurdistanê (Qazî Mihemed) li wir bû .

Ew bajar ji mera bû avahîyekê tena û emîn . Biryar bû (Ihsan) bi betalîyuna xwe ve biçîte (Bukan) ku binkê ahêñ xwarna bereyî li wir bûn . Ahêt xwarnê ewêñ di nav ku gayî da li tirombêlekê barkirin û di rêka bajêrkê (Borhan) beref Mihabadê ïnan . Di víya ez jî topa li tirombêlê bar-kem û bi dû wan bi kevim . Ji ber ku me ji tirombêlekê zêdetir ne bûn , peyade bi dewara û li jêr çavdêriya ef-serekî di wê rêkê ra min hinartin . Barzanî jî bi pîya ji bû

parastinê li dû me ketine rê .

Demê Ihsan û efserên dî di çine (Bukan) ji bû barkirina kugayê . Xelik li dur komdibît û bi navê rizgarkirina wan çekî jê ve diken û piştî nîv se'etê efser vedigerin û şînwarên fewceka pênc sed kesî jî nemaye . Her serbazek yê li dûv serê xwe çûy . Her heft efserên digel fewcê : İhsanî , Zîrbext , Tîwayî , Erteşîyar , Tewekulî , Esxerî û Nîkola Makarîyan demê van kawdana dibînin her bi tirombêla ahêن xwarnê li zalgehê derbaz dîbin û xwe di-gehînine Mehabadê .

Di wan sê çar mehêن ez li Kurdistanê heta astekê baş ez li wira xelkî şarezabûm . Bi egera salêن dirêj yêن jîyana bindestîya Fîyudalê , vejeneka dij ya peyidakirî , ew zorkarîya axa bi ser wan da sepandî . Bê guman ew kesêن damekê dirêj li jêr zorkarîya axa jîyayîn her delîveka bo hilkevît dê her wê zordarîye di serê xelkekê dî da rêjin . Ew dilê pir ji zordarîya axa dê derêxin û rêjne ser serê wî xelkê bi kevîte bin destê wan . Xelkê bajêra di wisa ne bûn , heta astekê baş tuxme peywendîya azad bibûn û reyeka civakî û sîyasî li cem peydabibû . Ji zanîna wira wan herdem min di karî berka xwe ji avê bînime der . Berî bi çime nav her avahîyekî da êk yan du gullêن topa bê ar-manc havêjim . Eger top jî digel minda ne ba , digel êkemîn gulla min bi hewyî ve peqand ba da keme qêrî û gazî vêca da hemî êne rayê û ewêن berî nihu nan û hêk ji bihayê xwe zêdetir di firutine me , nihû hemî ahêن xwarnê û pê xwer zû ji mera di anîn û pare jî wernedigirtin û li de-spêkê eger me bi xweşî û mirovayînî me daxaza tiştekî jê

kirba da keyîsî li me bînin û daxaza çekê me ken . Bi tay-ibet ev kawdane li Bukan yê zor bû . Tiştê serinc rakêş ewe ku ew Kurdên betalîyuneka serbaza ji çek kirîn û tâlankirîn , her bi xwe berî nihu fîdaîyan yan pêşmergêt Hikumeta Millî ya Kurdistanê bûn . Berî bi gehîne Bukan, serpêhatîya betalîyuna Ihsanî û reftarê xelkî min ji serbazên xwe ra behis kir û rastî jêra ruhin kirin ku eger em hemî pêkve bîn dê tirsa hêrişa li ser me kêmtilir bît . Çinku em li kawdanên deverê di şareza nînîn û eger bêt em gîyanê xwe jî ji sermayê rizgar keyîn , em ji destê nij-decîya rizgar na keyin min soz da wan her bi gehîstina me bo Mihabadê dê wan bi rê kem bê guman her min jî wekir. Biryarê min wan pesindkirin . Nêzîkî nîva şevê bû demê gehîstîne nav Bukan . Ji bîra min çû bêjim xelkê Bukan sê efser bi navê : Raîd Xaksazî , Neqîb Zehrî û Milazim Heqber - xapandibûn û bir bûne malên xwe bi navê veşartinê , belê girtibûn bo hindê ku demê supayê Îranê bêt da wan wek qurbanî pêşkêşken . da bi vî awayî xwe ji guneha piştevanîya Hikumeta Millî ya Kurdistanê bi şun . Di vê pişka bîrahatinê min da galek cara navê (Ihsanî) hat . Wekî berî nihu min li (Gunbet) dît yê birîndarbû hinarte Tehran , hemî efserên girtî yên serhildana Xorasanê : Behram Daniş , Husêن Fazîlî û 'Elî Senaîl li Înzîbat xana navîn di girtibûn . Piştî damezrandina Hikumeta Millî ya Azirbaycanê û li demê dadgehkîrnê ji zîndanê xwe qurtal kirbû hatibûne nav supayê Azirbayîcanê . Pilana wan ji layê şehîdê qehreman (Rozbî) hatibû danan û bi harîkarîya (Raîd Hemîd) bi cih

îna bûn . Raîd Hemîdî jî digel wan hatibû nav supayê Azirbayîcanê . Ji ber hindê çar serbaz kirtbûn û heşt meha hukim kirbûn û piştî hukimê xwe bi dawî anî ji supayî de-rêxistin .

Da vegerîne ser buyera :

(Raîd Celal) ku êk bû ji efserên Kurdên Îraqê û digel Barzanîya bû em şîret kirîn eger hatû Kurd nêzîkî hewe bûn bê rawestan dest rêjeka otumatîka li ber pîya bi ken her ji tirsandin û da wira serbaza danebezît . Belê demê min hest kirî ku du dilîya min ya bûye egera wêrana wan . Belê bêy guh li gefêن min bigirin tirombêl û barêن wan gemaro dan . Min jî bê rawestan dest rêjeka gula li pêt wan reşandin . Belê her li dû me di hatin . Reftarê wan çîrokek anî bîra min , ku min di kitêbêن despêkê da xwândibûn . Di çaverê bûn em di teqnê ra asê bibîn , da birjêne ser serê me , aşiqêt tivenga bûn .

Her çewa bît piştî sê rojêن nexweş di nav sermayê û teqnê da , em gehiştîne Mihabadê bê guman ne çar bûyîn li cihekî la çep yê rêkê topa bicih pêlin , tirombêl di teqnê ra asê bûn û ji cih ne livîn , ew serbazêن bi siwarî di hatin gehiştine cem me .

Roja 24ê yan 25î Sermaweza 1355ê bû em gehiştîne Mihabadê . Bê gîrûbûn em çûyîne dîdara Qazî Mihamed , belê li wir nebû , gotin yê çûye Miyandiwbê bo pêşwazîya supayî . Wezîrê Berevenîyê - Emîr Husêن Xan - , got em jî nuzanîn dê çi keyîn belê bi bawerîya min mana hewe li Mihabadê baş nîne çûnku dûr nîne her demekî supa bi gehîte Mihabadê .

Bê guman em çaverêyî gehiştina supayî bûyîn . Her wisa hatina supayê Îranê bo Azirbayîcanê me dîtibû belê paş me zanî ku berî supa bi gehîte Tewrêzê bi sê roja li (Basmînc : gundeke li nêzîkî Tewrêzê) êwirbibûn û destê destgîz û kirêgirtî û nehezên şoreşê berdabûn , da her karê bi vêt digel xelkê bê kes û hejar yê Tewrêzê bi ken . Di wan sê rojan da xelkê Tewrêzê di komeka xwinê da gevizîn . Zelam di kuştin , afret di hetikandin , mal talan di kirin , agir bi xanîya vedna . Pişti sê roja supa bi serkeftin gehiştê nav Tewrêzê û ewa bi kirê girtîya ne hatîye kirin ewa bi xwe kir . Bîst û şes kes ji efsera girtin û paşî di dadgeheka bazarî da bi kuştinê hukim kirin Ceneral Ebulqsim E'zemî , Eqîd Murtezewî , Raîd Qasimî Cewdet Agehî , Neqîb Xefarî û Ce'fer Sultanî , her (19) kes gulle barankirin . Firîdûn İbrahimî , Ramîn , Qulî Subhî .... û çend kesên din bi dar vekirin .

Paşî me zanî nêzîkî bîst hizar mirova bitinê li Tewrêzê şehîdkirin û her di wan roja da çiwar efser : Zehrî , Heqperist , Seqawî û Xaksarî ku xelkî li Bukan girtibûn û li Mihabadê gulle barankirin .

Şehîd zor bûn û bi rast û bawerîyeka mukim çûbûne nav şoreşa Azirbayîcanê da di vê rîkê da bi şen azadîyê li seranserî welatê xwe belavken . Bi dirêjîya dîroka nû ya welatê me milletê Azirbayîcanê berdewam pêşengê azadîya Îranê bû . Vê carê jî hîvî û xwezîya hemî azadîxwaza , her ew bû tîşkê run yê azadîyê li wir bi ser runahîyê bi ser hemî Îranê da belavket.

Mixabin di bîrhatineka xembar da û bi dehan hizar şehîd

tiştekê dî li şûyn neman , bo ? min berî nihû behsê egera kir , eger ev serhildane li demê xwe û ji nav hinavên xelkê Azirbayîcanê hatiba . Hu bi sanahî kip û bê deng ne di bû. Eger piştevanîya hevalên wî layê sinorî jî digel da neba .

**Pişka Siyê**

www.finji.info

**BARZANI**

www.finqi.info

**B**ingeöhê hoza yê li bakurê Îraqê , devereka sext û dij-war û girêdaye bi çiyayên sinorêñ Turkîya û Îranê ve .

Ji ber ku Barzanî di akincî ne li vê devera asê û dûr ji bingehêñ bajêrvanîyê her yên mayîn leş sax û bi hêz , ji alîyê tîtal û rewiştâ ve hêj sincêñ babînîyê mayîne û di dûrin ji hemî karêñ pîs û xirap , ew sinc û karêñ di nav ba-jêra da , hêsta cihê xwe li wir ne dîtîye . Bi hizra min ew bisurmanêñ bi bîr û bawerîn . serokê hozê herdem rêberê terîqetê ye û şêxatî pişt bo piştê her ya wê binemalê ye . Barzanîya pê wisa ye ku berê mirovekê xwedê nîyas (çak) hebû bi navê (( Şêx Ehmed )) herdem nubedarî û berevanî ji hozê kirîye . Serokêñ hozê yên nihu jî her nevîyêñ wî (( Şêx Ehmed )) ne .

Berdewam Barzanîya rikberî ya digel hikumetêñ hem-ecor kirî û aştî û tenahî nedîtîye . Demekî digel Turka û demekî digel Ereba û cerekê jî digel Îranîya .

Sala 1936 ê zayînî , demê (Kemal Etaturk) xweyakirî ku dê doza Kurdi bi kuştin û bin birkirnê li (Diyarbekir) çareserket . Serokê vê hozê (( Şêx Ebdulselam Barzanî )) û çekdarêñ xwe bi merema harîkarîya Kurdêñ Turkîya hinartine wê deverê . Wek aşkiraye ku ew heta (Diyarbekir)

jî çûn , belê li wir şikestin . (Şêx Ebdulselam) bi xwe jî hate girtin û li sêdarê da . Barzanî jî vegevîyane devera Barzan . <6>

Şêx Ehmed piştî birayê xwe Ebdulselam bû serokê hozê. Demê ez di nav wê hozê da li dawîya sala 1325ê hêşta cenabê wî serok bû . Barzanî çi dema ne bûyîne bende û kuleyên dewleta Îraqê . Piştî şerê diwê yê cîhanî û piştî şikestina wan li Türkîya , hikumeta Îraqê devera Barzan çendîn sala dagîrgir . <7>

Şêxên Barzan : Mela Mistefa , Şêx Mihemed Sedîq , birayên Şêx Ehmedin Şêx Silêman kurê Şêx Edulselame . Hikumeta Îranê girtin û li Besra û Kerkukê zîndan kirin û hindek jî bin çav kirin .

Siyaseta Ingilîzî li Îraqê ji bilî piştavaniya hikumeta na-vendî ew bû ku hêzên Fîyudal rakêste bibal xwe ve bo mifa jê dîtinê li rojêne wekî serhildana (Reşîd 'Alî) û êk ji wan hêza , hoza Barzan bû , harîkarîya Şêxêt wan biken da ji zîndanê rizgar bibin û vegevîne devera Barzan . Wî ser-

< 6 > Evzanîyare di şasin , ku Şêx EbdulSelamê Barzanî - wate : (Şêx EbdulSelamê diwê) birayê mîzin yê Barzanîyê nemir bû .

Sala 1914 ê ji layê Osmanîya li Musil li sêdarê da . Çinku Şêx Ebdulselam li sala 1907ê dijî dagîrgeren Osmanîya ji bo wergirtina mafêne milletê Kurd xebat dikir . Belê çûna şerkerê Barzanîya bo harîkarîya Kurdêne serhildayî li Türkîya di nav bera salêne 1917-1919 . Ew hêz bi serokayetîya Barzanîyê nemir bûn û di hewara Şêx Ebdulqadirê Nêrî û Şêx Se'îdê Pîran çûbûn . Careka dî jî şerkeren Barzanîya piştî serhildana êkê ya Barzan li sala 1932ê xwe ve kêşa û digel xêzan û malêne xwe mişext bibûne Türkîya û demê salekê li wir man .

Mes'ud Barzanî : Barzan û Bizava Rizgarî Xwaza Kurd -

< 7 > Rastî ewe :

Piştî rawstana serhildana êkê ya Barzan (1931 - 1932) û çûna Barzanîya bo Türkîya . Ingilîzî û hikumeta Îraqê heta sala 1943ê devera Barzan êxistibû ➔

demî Ingilîzî bi şevê Mela Mistefayê Barzanî ji Kerkûk revand û hindek çek û fişek danê . < 8 >

Piştî mela Mistefa vegerîya ye devera Barzan zelamên xwe komkirin û kete şerî digel hêzên dewleta Îraqê û ne çar kirin ku Şêxên Barzan ji zîndanê berden û vegerîne ve Barzan .

Hoza Barzan nêzîkî hizar û pênsed şerkerên jêhatî û çist û xebatker hene . Mela Mistefa bi xwe pileyeka xwîndewarîya kilasîk ya baş ne bû , belê mirovekê têgehiştî ye û zimanê Farisî , Erebî û Kurdî bi başî di zanîn û bi Turkî jî di peyvît . Zimanê Farisî ji (Gulistanê) yê fîrbûyî û bi wê dariştinê di axift .

Li bîra mine demê em li (Mihabadê) ji cem (Mîr Husêن Xan) Wezîrê Berevanîyê yê Qazî Mihemed , derkeftîn , min Mela Mistefa dît wekî pêxemberekî di nav çekdarên xwe da rawesta bû , fişek li ser wan belav dikirin û jêra di peyvît . Demê ez dîtîm bi begermî bi pişt min ve hat û berî hingî min dinasî û demê du dilî û peşemanîya min dîtî

---

→ jêr deshelatarîya xwe . Zorbeyî wî demî Barzanîyê nemir û xwedê jê razî Şêx Ehmedê Barzanî di zîndanê da bûn yan di desteser bûn .

< 8 > Nivîserî bi xwe jî wekî di kurte pêşekiya bo vê kitêbê nivîsî dan bi hindê didanit ku tinê pişta xwe bi bîrewerîyên xwe ve girêdaye bêy vegerîte ser ersîfî û belgenama û jêdera , ji ber hindê yê keftîye van xeletîyên mezin .

Rastîyeka aşkiraye ku Barzanîyê nemir li roja 12 / Temoza / 1943 li gel du ji hevalên xwe bi navê Mistefa Ebdulla û Silêman Sore ji Silêmanîyê ( neku Kerkûkê - wekî nivîser dibêjît yên derkeftîn û ji rîya Kurdistanâ ïranê beref Barzan hatîn û şoreşa beramber hukmeta Îraqê û supayê dagîrkerê Ingilîzî destpêkirî . Hemû jêder jî li ser hindê rêkdikevin ku Barzanîyê nemir bi hevkariya hevalên xwe yên Kurdperwer û şoresgêrên Kurd bi taybetî Xwedê jê razî Şêx Letîfê Şêx Mehmûdê Hefid û xebatkerên parta Hîwa derkeftin û şoreşa Barzan 1943-1945ê hilkir , ew şoreşa li jêr pestana hukmeta Îraqê û In gîlîzî pêkve bi dawî hatî , Barzanî û şerkerên xwe û xêzanên wan hemû bi →

---

got : - ( Ez Pêsewerî nînim , Penahîyan jî nînim , di demê aştîyê da serokê erkanê supayî bim û li demê şerî êk ser serê xwe li (Baku) bînme der . Ez û ev tivenge - tivengek jî di destî da bû - , heta ev tivaenge didestê min da bît ez xwedanê xwe me . Xizmetkarê hîç hêzekê û hikumetekê nînim , ne Ingilîz , ne Emrîka , ne Rosiya . Piştî em digel êk û du axfitîn , min hest kir ku ji alîyê siyâşî ve ber çavêن wî di ronin û got :

Eve kawdanêñ tayîbetî yên dunîyayê ne , Ros dê harîkarîya me ken , nihu wan li herêmê pêtivî bi meheye . Ji ber hindê em di şeyîn bo serferazîya Kurdisatê mifayî ji êk dûr bûna wan werbigrîn . Ez Kumunîst nînim . Fîyudal jî nînim , ez Dîmokratim .

Li cem wî peyva Dîmokrat taybetîya xwe hebû . Digel milletê xwe li ser êk sifre diironiştin , digel wan nan dix-war , digel wanda li sengera dinivist , lew Barzanîya ew xweş diviya . Her ew bes bû li hespî siwarbît , da pênc sed çekdar bê tirs û dû dilî da bi rex kevin . Demê firmana şerî di da pişt rast bû ku dê bicih hêt . Min bi çavêن xwe

→ pişt sînorî keftin û çûne digel Kurdên serhildanê Iranê , heta hindê ku roja Barzanî ji sînorî jî derbaz bûy balefirêن Îraqê û Birîtanîya ser ji dû ve nekir û xêzan û zarokên wan bombebaran dikirin . Bo pêtir pêzanînan xwendekarê me dikarit li van jêderan binêrit :

\*Berêz Mes'ûd Barzanî : Barzanî û bizava rizgarîxwaza Kurd ( Şoreşa Barzan 1943-1945 ) çapa 1987.

\*Necef Qolî Pisyan : Ji Mihabada xwînelo heta kinarêñ Arasî , wergêran bo Kurdî :Şewket Şêx Yezdin ( hejî gotinê ye bo cara êkê ev kitêbe li sala 1947 ê bi Farisî ya belav bûy , binêre rûpelê 44-46 , çapa Kurdî )

\*Nivîsîna Dr.Ismail Erdelan , û wergêran bo Kurdî : M.Qeredaxî :Barzan û ni-hêniyên wê , çapa Kurdî li sala 1959 ya belav bûy li perawêza rûpelê 122 , wergêr dibêjît : ( di vê derbazbûna Mela Mistefay da , bi rastî supasîya Şêx Letîfê kurê Şêx Mehmudê mezin û gelek Kurdên bi şeref dikit ku hevakrîya wî kirîye ) .

dît çewa li ser çiyayekî dirawesta û firman dida zelamên xwe û di got :

- Pênc mirov biçne serê vî çiyî , Omer tu û pênc mirovên dî herne serê çiyayê henê , Mûsa tu digel çar mirova herne ser çiyayê dî . Ev firmane êkser bi cih dikirin . Wî erd baş di nasi û zor çak mifa ji lemprêñ erdî werdigirt û biryar di da .

Kar bi zîrekî û zanîn dikir . Em çend mirovên pispor û teknîkî û xwîndewar bûyîn , belê piştî vekolîn û hûrbînê li nexşê erdî û giftûgûyê , eger me bi çakî jî birayar da ba hêşta biryara me wek biryara wî lê ne dihat . Wek min gotî wî şarezayîyeka baş di lemperêt erdî da hebû mifa jê werdigirt û paş wira serbazên dûjminî û ya çekdarêñ xwe di zanî . Te rastî divêt her çende nihêniya serketina şerên Mela Mistefayî heta pileyeka baş ya girêdayî bû bi azadîya zelamêt hoza wî ve . Belê li pêşîya azaya zelamên Barzanî jîrî û aqilmendiya Mela Mistefayî bi xwe jî bû ku dibû sermayê serketinê . Terazîya hêza xwe û zelamên xwe dizanî û li wî cihî zanîba li ser zal nabît bi dil xwesî xwe jê vedkêşa , belê kesê ne dişîya bêjît ji tirsa xwe jê vedkêşa , paş di zanî di ci demda dê hêrişê ket û li ci dem dê xwe vekêşit . Bi hatina dûmahîya şerê duwê yê cihanî . (wate li sala 1945ê) . Ku hêşta hikumeta Îraqê bi dirûstî ne hatibû serxwe . Hoza Barzan hizir dikir dê biwan çekên didestên wanda şen Kurdistanê varî ken û hikumeteka serbixwe ya Kurdistanê damezrînin . Xelkê Kurdistanê ci li bajêra bin yan li gunda bin , dilê wan bi Kurdistanê ges dibû . Bêguman serferazîya Kurdistanê di bûçûnê wanda

têgehiştineka tayibet hebû û evîndarên vê çendê bûn . Rojekê min ji xanedanekê wan pirsiyar kir : Erê merema hingu ji azadîyê û serferazîya Kurdistanê çîye ? bersiv da û got :

- Azadî ewe ez serbest bim pezê xwe li kur bi çerînim . Bişêm rêcalê xwe bi her nirxekê û bi her kesekî bifroşim û hikumeta navendî dest têwerdanê di karê minda neket .

Sanahî ye cemawerê akincî hest bi têkehiştineka dî sebaret serferazîyê biken . Bi vî awayî , peyva azadîyê bê huyîr tê bigehin , her ji zarokî yê di guhê wanda deng vedidet û hîviya wan ewe ku rojek bêt tiveng bikevîte di destê wanda û di rêya serbexweya Kurdistanê da xebatê biken .

Bêguman Mela Mistefa û Şêx Ehmed me'na serbexweyê ji vê hurtir dizanin . Her wisa dîroka jiyanâ Kurd û Kurdistanê , li sinorêñ dî û hijmara wan li welatêñ din û bajêrêñ cûda -cûda di zanin .

Serdemê hikumeta millî ya Azirbayîcanê damezrayî , Mela Mistefayî di got :

- Bitinê bi harîkarîya Sovyeta dişeyn Kurdistanâ êkgirtî û serbixwe dirûst bikeyîn , çûnke ew mifay ji parçekirina Kurdistanê nabînin . Beru vajî , mifayê wan ewe ku Kur-dît Îranê û Îraqê û Turkîya hikumetekê dabmezrînin . Bi belkge digot :

- (Her demê parce erdekî ji Ingilîz û Emrîkan rizgar bikeyîn , dê lawaz tir lê ên . Sebaret ew welatêñ bi kuledarêñ Ingilîz û Emrîka di zanînîn di got : (Demê ez li Îraqê min xebat dikir ji bû damezrandina hikumeteka

Kurdî , min hewil dida digel Rosîya ku li Ormê bûn peywendîya girêdem . Min peywendî girêdan . Belê mixabin Ros mirovên rezîlin . Bi sanahî min ne dişîya bawerîya wan bînim , bo bawerî ïnana wan di vîya ez kar bikem ku di şîyanê min da ne bûn . Ez xizmetkar yan destgîz nînim . Ez bi tinê xizmetkarê hoza Barzanim , xizmetkarê netewa xwe me (Kurdim) .

Belê di ser hindê ra jî şiya bû bawerîya Sovyeta bi xwe bînit . Hoza Barzan di şerî da digel hikumeta Îraqê şikestibû . Ji ber hindê ku li wî demê hindek ji supayê Ingilîzî bi harîkarîya balefirêن (Harîginî) devera Barzan û Akrê hêlabû û çiya di sutin û ji encamê hindê beref Îranê hatin û qesta hikumeta millî ya Kurdistanê kirin .

Li meha Gilavêja (1325) ê da ew roja Mela Mistefa Barzanî (niho bibû ceneral Barzanî) digel (60) zelamên Barzanî gehîştine serbazgeha Tefrêzê , ïnabûn da xola top havtinê bibînin . Lawêن xwîndewarî hey hinartine koljâ efserîyê û yên kêmtil hinartine amadeya supayî li Tewrêzê , serokê wan (60) şêst mirova (Raîd Nûrfî) bû , ku êk bû ji efserên supayê Îraqê . Li wir min Mela Mistefa Barzanî nîyasî . Delîva xwandinê ji sê meha zêdetir bi dest wan ne ket û şerî di navbera supayê Îranê û Fîrqa Dîmokrata Azîrbaycanê û Kurdistanê dest pêkir . Mela Mistefa dîsan hatibû Tewrêzê û mirovên xwe beref berê (Sara) nêzîk (Seqiz) birin .

Ew şeva em gehîştîne Mehabadê me Mela Mistefa dît ku bi gotina hevalekê min wek pêxemberekî zelamên xwe li dur xwe komkirbûn û fîşek liser belav dikirin . Ewî

pêşinyarkir digel wanda bîn . Em dil rihet kirîn ku dinav wanda dê bi tenahî û îmnahyê beyne ser . Em jî qayîl bûyîn , bi şev beref (Nexede) kefîn rê . Belê berî bi rê bîkevîn me serperiştîya hindek serbaz û çekdarên Barzanîya kir li barkirin û helgirtina topa û roja paştir gehiştine me .

(Şino) wî demî hêş devereka tena bû , Barzanîya jî bîryar dabû biçine wir . Şêx Ehmed pêş wext çûbû . Ev ba-jêre di kevîte sê kuca sinorê Îranê û Îraqê û Turkiya û supayê Îranê hêşta ne gehiştibû wî cihî ji ber xwe paristinê ji serma Zivistanê Barzanîya ew cih ji xwe ra dîtibû .

Supayê beramberî Barzanîya siyaseteka tayîbet hebû . Di kawedana da ne dişiya Barzanîya serkut biket . Bişerî da zîyaneka mezin det . Sebaret serkeftinê jî Barzanî Îranî nebûn , neçarbûn bi navê penabera wergirin û akincî ken yan vegeŕînîne Îraqê , bi wê kirayarê jî da ji xwe ra gîrûgirifta peydaken . Rêka dîjî ew bû yan bi kujin yan gemarubiken û bi zorî ji axa Îranê û beref îraqê palbiden . Diyar dibû ku supayê bi aqilmendî ev rêke girtibû . Supa taze hatibû Azirbayîcanê û zor girift hebûn . Divîya digel paşmayêن Fîrqa Dîmokrata Kurdistanê <9> êk labît . Li despêkê ne çar pişta berey saffî biket û paşî sebaret Barzanîya bi kefte giftûgûyê . Em taze li (Nexede) ve hewya bûyn - bingehê hoza Qerepayax - . (Nexde) dikevîte ser rîya Mihabad û Şinoyê , ('Eqîd Xefarî) demrastê supayî . ji bu giftûgûyê hate (Nexede) û Mela Mistefa ji bu giftûgûyê daxwaz kire (Tehran) . Daxwaza wî pesin kir pişti rizamendîya Şêx Ehmedî wergirtî . Mela Mistefa digel du sê hevbendên xwe ji efserên Îraqê rêka Tehran da

---

<9> Merem jê Hizba Dîmokrata Kurdistanâ Îranê ye . (wergêr)

ber xwe . Demê Mela Mistefa gehîştîye Mehabadê supay girtibû . (Eqîd Hemayunî) bibû serokê supay yê hatîya hinartin bo Kurdistanê . Ew yê mijulî rêkxistineka xwe pîşandaneka supay bû ewî li layekî xwepîşandan didît û li layekê dî Mela Mistefa û Qazî Mihemed ew xwepîşandan didît û paş bo me behsê vê xwepûşandanê û seredana Tehran kir .

Bi balefirê Mela Mistefa û hevalên wî veguhastine Tehran û nêzîkî bîst roja li wir çavpêketin digel berpirsên hikumetê kirin . Hikumetê di viya bi aştî çekî ji Barzanîya veket û li devera Hemedanê wek penaber akincî bi ken . Hikumet ya amadebû ew kesên li Îraqê hukim li ser heyî wek penaberên siyasi werbigrît , erdî û sermayekî jî bêxte ber destê wan da zelamên hozê bi çandinê ve mijul ket .

Mela Mistefayî wisa xwe diyar kir ku nevên çû şera digel dewleta Îranê biket . Li vir me ax nîne berevanîyê jê bekeyîn , me dûjminatî digel kesê nîne heta çekî beramber wî hilgirîn vêre axa Îranê ye û her rojek dê êt supayê Îranê erdê xwe bigrît û me jê derbêxit . Tenê me êk rê heye ew jî delîvê bidene me heta serma ne mînît , paşî jin û zaro û pîremêra pinêrîne Îraqê û em jî qesta Sovyet bikeyîn , heta delîveka dî hilkevît û vegerîne Îraqê û xebatê ji bo armancêr xwe bikeyîn . Her li wî demî got : (Sovyet jî cihê me nîne) . Sebaret hikumeta Sovyet peyva (Rezîl) bi kar di anî û di got : (Her kes li wir karbiket dê nanî xwet , belê ew Şêxên berî nihu nanê destê xelkî di xwar , ew welet ji wan cihekê baş nîne . Belê bo me rihetrîn cih ku bişeyîn çekê xwe bi parêzîn heta delîveka dî hilkevît û mi-

fay jê wergirîn û bi karbînîn ji bo serbexweya Kurdistanê , lew pêtivîye biçîne wî cihî ) .

Sebaret seredane xwe bo Teharn Mela Mistefayî ji mera vedgêra û di got : ( Em birîne fîrqa " Du Qesir " li wir em mîvan kirîn û min çavpêketin digel << Qewam û Liseltene û Rezim Ara >> kirin . Rezim Ara zor yê aqilmende , Qewam û Liseltene mirovekê xwe û kursî perist bû . digel Padşahê hingu jî peyîvîm ) . Her wisa bi axiftinê xwe yên tayibet di got :

- (Rojekê legenek dana ser serê min , bayimbaxek di stuyê minda girêda , panturekê rêk û pêk bo min kirî , supayî pare dabunê da bo min bikrin , belê Têaqîd Xefarî yê çepel di viya para bi xut û kevne cilkêt xwe bikete ber min . Bo min panturekê kevin ya nû hîç ferqek ne bû , belê min viya têbigehînim raste em xelkê çiyay ne belê em di hemî tişa digehîn , min gotê :

- (Eqîdê rêzdar , şerme bo dewleteka wek Îranê bi hemî dîroka xwe ve , cilkên kevin bi kete ber mîvanên xwe ).

Êkser ez birme kugayekê û got: (Her ci te bi vêt hilgire ! ev panturê di pê min her min yê ji vêrê hilgirtî) paş ez birme kûcka şahî (Padşahî) li saluna çaverîya şahî hemî bi îşareta di peyivîn û berdewam di gotin Hûs .... Hûs û dergeh nîşa min dida . Min gotê babu her weku ezman di devê hewe da nîne , boçî hûn hûsa lalbûn û her Hûs Hûsa hewe ye . Çima îşareta di ken . Hewe ci di vêt bêjin , bi dirûstî bêjin , dîsa her ew bi îşareta di gel min di axiftin . Min dizanî ew ci di bêjin , belê min di viya bi peyvin . Ê başe Şah jî her mirove . Paşî dergeh vekir û min dît Şah

yê rûniştîye , çûme jûr û min silav kirê . Cih nîşa minda û rûniştime ser kursîkekê , du se'eta digel Şahê hingu axfim , zor keyfa min pê hat . Piştî du se'eta min viya rabim, got : rûne , min gotê careka dî ez ranabim heta hun ne bê-jin: careka dî ez pêve çûm . Şah sebaret akincîkirina me li devereke Îranê axift : min bersiv da -

- Bi xwedê hun zor di dest firehin û nan dehin , hemî pêşnyarêن hingu bi dilê minin , belê divêt Şêx Ehmed bî-ryarê bi det . Ew serokê hozê ye . Sebaret hewe efsera jî Şahî got bi denev me . Min gotê

- (Me ew ne girtîne heta bideyinef hingu . Ew şes efserên cihêlin ji deh kesa ( Em şes efserên resmî yên supay bûyn) . Temenê wan hemîya na gehîte sed sala li cihê wan şes cihêla , ez dê hejde cihêla demef hingu . Binemala min û Şêx Ehmed û birayêن min hejde cihêl yêt heyin , hemî ji lawêن kukin . Li şûna wan şes cihêla ez dê wan demef hingu . Belê , me nevêt ew şanazî û serferazîya Şêxên Barzan heta nihu bo me bicih hêlay xirab keyn û nifrîn û civîna bixwe û Barzan bikirîn) .

Bi kurtî li Tehran pêşnyarkir ku me li devereke nêzîk hemedan akincî biken . Mela Mistefa razî bibû û eger hativa û Şêx Ehmed jî razî biba da piştî şikandina seqayê sermayê da veguhastin dest pêket , biryar bû li cihê her kamîyuneka çend malên Barzanîya piştî çek jê tête vek-irin , bir bane wî cihê dest nîşankirî .

Bo runkirina vê razî bûnê di got :

- Eger ez razî nebibam ez bernedidam .

Li Tehran Mela Mistefa bo dîtinê birbû kargeha çekî ,

kugaya çekî û avahîyê Padşahî , hêza esmanî û kolîja efseran . Wî bi xwe vedgêra û di got :

Ew roja ez birîme kolîja efseran min gote Rezim Arayî :

- Bi xwedê Ceneral ez ji vî supay bi şîyan û çekî tursiyam, Belê divêt hoza Barzan jê bitrsît . Ew jî ji vî hemî çekî natirsin . Wan êk tiveng û parîyekê nanî yê hey û li serê ciyayekî dijîn .

Her wisa di got :

- Divîya wî çekî hemî yê bêxine ber çavêن min . Min jî bi vî awayî bersiva wan da .

Li nîva diwê ya meha Befranbarê . Mela Mistefa Barzanî ji Tehran vegerîya ve . Peywendîya Mela Mistefayî digel çend efsreka zor ya baş bû . Hest dikir ku em baştır di peyvên wî di gehîn .

Serokatîya Şêx Ehmed û şêxên dî yên Barzan serokatiyeka fiyudal û bi zend û baska nebû . Bi rastî ji layê mezhebî ve bawerî bi Şêx Ehmedî hebû , ew bi rêberê dînî û cih nişînî û demrastê Şêxên Barzan di hate niyasîn . Bi rastî Şêxê Barzan sîmbulê bawerî pêkerê mezhebî yê hoza Barzan bû .

Mela Mistefayî digot :

- (Vegerîyana me bo Barzan di vêt çekî danîn . Eger mejî çek didestîda nebît dê bîne mirovîn lawaz û bê desthelat û wî demî dê xelik birayrê det .

Berdewam Mela Mistefayî di got :

- Hindî çek didestê mirovî da bît , mirov xwedanê birayara xweye , belê demê çek dana ew dê biryarê den . Mirov jî dê ne çar bît bo wê biryarê her çend jî ya te' il û

dijwarbît millêt xwe bo bi çemînit . Di hoza Barzan da zor kes yêt heyîn nevên çekî ji dest biden bi tayibet ku sed û bîst mirovêن heyin li Îraqê ferманa sêdaredana wan ya heyi .

Mela Mistefayi bi tinê Sovyet didana cihekê rihet û hêmin û di vîya bo demekê berwext biçîtê heta delîveka dî bo hilkevît û vegeรête Îraqê û xebatê biket ji bo damezrandina dewleta Kurdistanê ,

Ewî digot :

Ez Komunist nînim . Keyfa min jî bi Komunîsta nayêt , ez Dîmokratim û hez dikem digel milletê xwe da bi aştî û tenahî û wek hevî bijîm û bo min hilkevît alayê Kurdistanê li xaleka Kurdistanê hildem , vêca ew xal li Îraqê , Iranê yan Turkiya bît bi min hîç ferq û cudahîyek nîne .

Berî nihu min gotibû nîva diwê ji meha Befarnberê bû demê Mela Mistefa ji Tehran vegeرiyaye ve . Heta piştî mehekê jî ji vegeرiyana wî peywendîyên hoza Barzan û hikmeta Îranê di baş bûn . Bitinê barê luryekê genim bo hinart , belê ji ber sermayê û giftûgûyê digel Şêxên Barzan veguhastina xêzanên Barzanîya bo hemedan gîrugir . Piştî mehekê supa ji teslîm bûna Barzanîya bê hîvî bû , vêca kete komkirin û hinartina hêzên supay bo de-wruberên deverên Barzanî lê di akincî û xwe amadekir bo lêdana wan . Barzanîya jî xwe komdikir li Mergewerê . Berî behsê xwe amadekirina her du la bikem û sebaret despêkirina şerî û serbûra xwe û wî demî em di çi kawdan da bûyn dê axvim.

Ez û Reîs Dana piştî em ji Mihabadê gehîştîne Bar-

zanîya û me biryar day digel wan da bîn me serperiştîya hindek serbaz û mirovê Barzanî dikir li veguhastina topa û beref Nexede di çûyîn .

Şeş efserên wê fewca li Bokan bo hindê gehiştibûne Mihabadê û peywendî digel Qazî Mihemed kir bû û beref Wirmê ketibûne rê bi hîviya çûna Sovyet , belê demê nêzêkî wirmê bûyn zanî ya ketîye desê dujminên fîrqê , lew her li wir vege riyanê (Nexedê) û se'et heştî şev gehiştin û çubûne çayxanekê , her li wî demî hêzeka Barzanîya jî bi serokaftîya Şêx Mihemed Sedîq (Êk ji birayên Şêx Ehmed) û gizîrekî bang hildêra û di got :

- (Ferman fermaña Şêx Sedîq Barzanîye , piştî se'et neh hatûçu qedexeye ).

Her şeş efsara piştî şîv xwarî her li wê çayxanê nivstibûn û ne dizanî ku li Nexede du hêzên desthelat yêt heyn : Barzanî - Qerepapax .

Qerepapax hozeka Turk zimanin û gizîrtekê li Kurdisanê di jîn li navbera Mihabadê û Wirmê . Ew dever bi navê (Suldiz) tête nîyasîn û bingehê wê deverê Nexedeye . Wî demê serokê hozê kesanek bû bi navê (Qulîxan Bir-cal) ku fîrqa Azirbayicanê pila (Eqîdîyê) dabûyê û hizar siwarênen Qerapapaxî dijî hikumeta navendî amadekirbûn , belê demê kawdan vajî bûyîn , (Qulîxan) ruyê xwe wer-gêra û alayê Îranê li Nexede hilda û xwe kire rêberê de-vera (Suldizê) . Bi navê Qewam û Liseltene rêveberîyek bo (Nexede) dana û her siwarênen hêsta medalîyê (21î / Sermawezê / bi singîve kirine fermandarênen supay bo ser-kut kirina wan kesêن hêş bi dilsojî layengirêñ fîrqê . Di

wa kawdana da hate bihîstin ku heft efserên fîrqê li çayxanekê di nivstîne .

Di wan roja da efser parekê baş bû bo wan kesên di- viyan gunehên xwe yên berê pê paqij ken , ji ber hindê girtin û teslîmkirina wan bo hêzên hikumeta navendî dê laperên reşen xwe pê şûn û paqijken . Her çewa bît bi şevê rijyane nav çayxanê û her heft kes : Zêrbext , Îhsanî , Tîwayî , Erteşîyar , Tewekulî , Elî Esxerî û Nîkulayê gir- tin û ji çek kirin û birine mizgeftekê bi hêceta ox- lemekirinê (pişknînê) rwîskirin û spêdê birine cihê nav lê nayî (rêveberîya deverê) bi rêkê ve mirovekê Barzanî bi nevê (kak Salih) van efsera dibînit û serhatîya wan ji Şêx Mihemed Sedîq ra di bêjît .

Li rêveberîya deverê destên wan girêdan û amdekirin bo qurbanîya pêşwazîya supay . Belê demê Şêx Mihened Sedîq serhatîya wan bihîstî kurê xwe digel çend çekdarên Barzanî hinartin û efser azad kirin û Qerpapax jî ji çek ki- rin û rêveberîya wan hilweşand vêca êkser ew çekdarên efser girtin ku nûkerên hikumeta navendî bûn werdigerin û di bine hevbend û dostên efsera û tiştên wan dizivrînin û xwe diyar diken ku wefadarên fîrqê ne û belge jî ew med- alîyên hêsta bi singên wanve .

Demê ez gehîştîme (Naxedê) ew du roj bûn efser ber- dayn . Bê guman ew jirirseka mezin rizgarbibûn , em bi awayekê rêkxistî yê supay gehîştibûyîne (Nexede) û me hêzek dirostkirbû . Deh efser , dû top û nêzîkî sed û sîh serbaza . Her bi vê bûnê me cihekê cuda bi xwe dirûstkir û lê vehewyayîn û çend roja mayîne çaverê . Bihna ser-

baza ber bere kurt bû çûnkû hîç armancrk li pêş wan ne mabû . Bi rastî serbaza hest dikir ku yê karekê bi zorî bo min di ken . Hindek pare min ji Azirbayîcanê digel xwe anîbûn . Her êkî min hindek pare danê da pê bigehne malên xwe . Min çek jê wergirtin û bi rê kirin . Bitinê çend kesanê bijare bê guman bi razîbûna xwe bo parêzgarîya topa li cem min man . Piştî demekê kêm wek şarezayekê li dûyî gotina Barzanîya ez çûme (Şino) . Li bîra mine demê ez gehîstîme (Şino) bo şev bêrîyê ez çûme çayxanêkê û hevalekê min got :

- Eve şeva êkê ya Befranberê ye û sê mehêن dî serma û befir yên li pêş me . Min xanîyek li wir girt .

Xanîyê afretekê bû ku firavîn û şîv jî bo min di lênan . Pirogramekê wext birnê me ji xwe ra dana Her wisa pirogramek bo amadekirina topa jî me dana .

Demê ez gehîstîme Şino min serbazên di gel xwe da fi-rêkirin û bîst mirovên Barzanî ji bo bikarînana topa min êxistine ber meşiqkirinê . Şino ya li pal çiyayekê bilind ku berdewam befir digirît . Spêdê zû em bo paqijîyê û meşiqê di çûyne binê çiyayî . Nîv se'etê me meşiq dikir û bêhnekê jî me dikire xar û paş beref mal di hatîn û me têst dixwar û paşî bi dirêjîya rojê em di petal bûyn .

Zorbey peyvîn Barzanîya sebaret vegevêriyana wan bûn bo Barzan . Bi taybetî jî demê agirê zivistanê hilkir û gorî jê bilind di bû , agirê zivistana Barzan bîranîneka her dem bû ji wan ra . Demê agirekê mezin hildikirin digotin :

- Tu di bêjî agirê Barzane .

Kesanekê dî hebû serhatîya wî ya serinc rakêše . Law-  
< 10 > Hêsta bo me sax ne bûye kanê ew lawe kî bû . (( wergêr ))

ek bû bi navê (Se'îd) . Ev cihêle ji Kurdêt Îraqê bû her pazde roja di hate Şinu .<sup><10></sup> cihê bawerîya hizba rizgarîya Îraqê û hoza Barzan bû . Mela Mistefa serokê şanazî yê wê hizbê bû .<sup><11></sup>

Rojnama (Rizgarî) jî bi zimanê Kurdî bi awayekê ni-hênî çap û beleve dibû . Ew rojnameyeka heftîyane bû . Her demekê (Seîd) hatiba Şino hindek dane ji wê rojnamê digel xwe di ïnan .

Se'îd kurekê aza bû . Her pazde roja serûçavên wî diyar dibûn . Me dizanî kengî dê êt . Her car Se'et çar yan pêncî êvarî di hat . Êk ji tiştên serinc rakêş yên me seh-kirina hatina wî bû ku di nav befrê ra ji layê bilind yê çiyayê pişt Şino dîyar di bû . Nêzîkî rojava reşatîya wî me dinav befira zor stûr û sipî gilêr dibû , me didît bi tinê û bi piya û li befir û sermayê da , bi xwe û darê di dest da bi rûgê da di hate xwar . Berûkên wî ji rojname û pirogram û nama bo Mela Mistefayî ku bersiv û serincê wî di viyan di pirbûn . Her wisa pare jî bo hoza Barzan di ïnan . Piştî bicih anîna karêن xwe , bi şev li cem me di nivist û roja dî sipêdê her li wê rêka pêda hatî vedgerîya û di nav befirê da winda di bû .

Bi dirêjîya wî demê em li Kurdistanê , Se'îd hevalê me yê berdewam bû . Bi taybet piştî şerê dinavbera Barzanîya û Îranê destpêkirî . Berdewam di nav hozê da

< 11 > Ne çarfin careka dî bêjîn mixabin dîyare nivîserê rêzdar çunku seha çû jêdera ne kirîye û ji kesê pisyar ne kirîye . Hindek tişt yêt têkelî êk kirîn . Wî demê nivîser behis jê diket , Bihara 1947ê ye , wî demî Partî Dîmokratî Kurdistan li 16 / Abê /1946 ê bi serokatîya Barzanî yê nemir hatibû damezrandin , hizba rizgarî jî xwe helweşandibû û çûbû nav partî .

(( wergêr ))

dima, heta sinorê Îraqê jî digel meda bû . Li ser sinorî ji bo karekî ku Mela Mistefayî pê rasapardibû çûbû Îraqê . Li wir hate girtin .

Têkelîya me digel Kurda serinc peyada kir ku ronakbîrên Kurdên Îraqê hizir û bîrên wan dijwartirin , wî demî partîyeka pêşkeftî hebû ku rêkixstinêt zansî hebûn . Rikxistinên wan li ser binwaşê hozatî ne bûn . Her çende di hikumeta millî ya Kurdistanê da hindek serok hoz li dor Qazî Mihemed kombibûn , belê ewan (wate : ronakbîrên Kurdên Îraqê - wergêr) têkelî digel hikumeta serbexweya Kurdisatnê da hebûn .

Hewe rastî divêt hizbeka siyasî ya serbwxwe ku xwe- dan rêkxistinaka siyasî bît di halê da nebû , yan jî bi awayekê zor bi çûk hebû . Hêza binwaşê ya Hikumeta Kurdistanê ji hozên : Herkî , Mameş , Mengur û ewên dî pêk dihatin . Qazî Mihemed pitir wek serokekê dînî dihate hijmartin û cihê rêz û qedir kirina hemîya bû .

Min bi xwe ji nêzîk Qazî Mihemed ne dîtibû . Belê min Mihemed û Husêن Xan dîtibûn ku fîyudalek bû û xizmê Qazî Mihemed û Weezîrê Berevanîyê jî bû . Qazî Mihemed digel hevalên me axiftibû û di nav peyvên xwe da gotibû :

(Pêşewerî telefon bo min kir û got eve ez çûm û tu jî were , belê ez ne çûm weku Pêşwerî milletê xwe berdem û ji ber rizgarkirina gîyanê xwe milletê xwe bicih bi- hêlim . Eger ez pêt xwe ji Mihabadê derbêxim dê milletê min ber bîte gîyanêñ êk . Ez bo parastina vî milletî ne çarim li Mihabadê bimînim heta supa bêt û destheterminateka

nû bi çespînît . Dê her li vir mînim eger min bi sêdarê jî ve hilawîsin .

Qazî Mihemed harîkariya çespandina supay kir . Çuna wî bu berayia serkirdê supay ( Emîd Hemayunî ) her ji bu hindê bû da rêkê li buyurên xirab bigrît . Belê armanca supay ji harîkariya Qazî mihenmed bu binecih kirina xwe bû , paşî dest helata wî kurt ken û demê supa gehîştîye Mihabadê Qazî ji ser karî lane bir û pêşeway li binkê serokayetiya xwe kar bi rê ve dibir . Belê piştî supa binecuh bûy . ew û Mihemed Husêن Seyfî Qazî û Sedir girtin û bi rengekî ne camêrane li sêdarê dan , giyanê wan her şad bît .

Her çewa bît piştî vegeriyana Mela Mistefay ji Tehran û li dû wê rêkeftina kirî , Barzanîya (Nexede) bi cih hêla û li deverên Şino , Deşte Bêl Mergeverê cih war bûn .

Piştî girtina Qazî mihemed û di seredaneka Emîd Xefarê da bu Şinu , di gel me axift bu û ji me ra run kir ku sê-daredana Qazî Mihemed û xizmên wî dê dawiya sê-daredana bêt û çaktire em mifay ji vê delîvê werbigirîn û xwe bi deyne dest wan û ji vî wezîrî rizgarbibîn . Belê me diviya berî xwe bi deyne dest wan ve berdeyn û bi rengekî resmî ( fermî ) lêburîn ji mera derkevên û li radiyoya Tehran bête ragehandin .

Ev dan û standine li hizura Mela Mistefay hate kirin .

Eqîd Xefarî bersiva me da û got :

- Başe eve ya li ser biryara Mela Mistefay ya rawestaye ewa li Tehran day ku hewe bi dete dest me .

Evê gotinê Mela Mistefa zor hejand û bi torey bersiv wî

da û got :

- Bo çî direwa diken ? min yê gotîye Padşahê hewe libatî van şes lawa ez dê hejde lawên xwe deme hewe . Eve şermizariye bo hoza Barzan şes lawa bigrît û bi dete destê hewe .

Bu bi dest ve dana me . bi rêka (Eqîd Bîglerî) yê ser-kirdê wê hêzê ya biryar bû beramberî Barzanîya bi kevîte şerî . Dest bi karî hate kirin .

Min ('Eqîd Bîgler) pêstir di nasî . Li wî demî ew ser-kirdê supayê heşt yê Xorasanê bû . Wî ez dinîyasîm û di vîya mifay ji vê nîyasînê biket . Wî demê telefoneka mey-adanî li navbera Nexeđe û Şino hebû . Ev têlefone li bin destê Şêx Suleyman bû - birazayê Şêx Ehmed - birastî Şêx Suleyman wek Wezîrê Derveyê Şêx Ehmed di hate hîsab kirin , Farisî zan û mirovekê aqilmendbû . Rojekê hinarte dû min û got :

- ('Eqîd Bîglerî divêt digel te baxvît . Diwê axiftina telefonîda 'Eqêđ Bîglerî dostayetîya me ya mêtîn bi bîranî û daxaz ji min kir ku xwe teslîm bikeyîn û şerfa xwe bêxîne ber lêborînê , her li wî demî , hêriş jî dikirin ku eger bêt û mifay ji vê delîvê wernegirîn dê dem bi serve çit , belê min bi navê hindê ku em di pişt rast nînîn ji lêborînê û min daxaza lêborî jê kir û gotê :

- Em dê berevanîyê ji gîyanê xwe keyn û me du top yê li ber dest û tiblîn me li ser celebkê na lerizin .

Wî demî (21)î Reş mehê bû bitinê sê roj mabûn bo hêrişâ supay ya berbelav .

Her weku min gotî : her du la - supay û Barznîya - xwe

amadedikirn ji bo (berhingarîya êk ) şerî .

Hikumeta navendî hindek ji hozên layengirêن xwe çek dabûnê û ji hemîya giringtir hoza Mameş û Mengor bûn ku serokên wan pare ji hikumetê wergirtibûn û piştevanîya hikumetê dikirin . Zêdebarî van tîpêن heme-reng yên supay ji xalêن dî yên Azirbayicanê diînan û li dewrûpiştên cihêن Barznî di akincî komdikirin . Be-ramberî wan jî Barznî mijulî senger diroskirinê bûn bo berevanîyê ji xwe . Divîyan mifay ji delîvê wergirin heta kej (hewa) xweş bibît û ji Îranê biçine derê .

Êkemîn zerbê Barznîya weşandî çavşikandina hoza Mameş û Mengor bû . Xeber gehîste Barznîya ku axayêن (Xanêt) Mameş û Mengora li gundekî bi navê (Suvyan) ku bingehê devera (Lacan)e yêt kombûyîn da dijî Barznîya qolpekê girêden . Mela Mistefayî çend çekdar digel xwe birin û kete rê . Spêdê xeber hat ku Mela Mis-tefa ji nişkekê ve çûbû di nav civata wanda li (Suvyan) û bi çekê Otumatîk hemî belavekirin û du kes jê êxsîr kirbûn û çekên wan jê standbûn û ïnane Şino . <12>

Hejî gotinê ye ku Mela Mistefa di nav hoza Herkîya da çûbû wê deverê û digel serokê hozê giftûgû kiribûn û soz

< 12 > Nivîserê rêzdar careka dî şaş dibîtin û ev buyere , her buyerê gundê (Sêlwê) ye . Ku li laperê (10) yê vê kitêbê amaje ya hatîye pê dan û bi fer nu-zanîn careka dî du bare bikeyîn . Belê pêtivîye bêjîn ku Barznîyê nemir pişikdarî di vê buyerê da ne kirîye , beruvajî xwedê jê razî Şêx Ehmedê Barznî zor ne rihet bû bi vê buyerê . Xwendevanê rêzdar bo wergirtina pitir zanîna dişêt sehkete kitêba hêja Mes'ud Barznî sebaret şoreşa Barzan (1945 - 1958) berperê (56) . Ku hûrtîrîn û bi baştîrîn jêdere . Her wisa kitêba (Komara Kurdî sala 1946 ê) ya Wilyem Iglton berperê (119 -120) ku ew jî jê-derekê zor giringe û li sala 1963ê hatîye çapkirin . ((wergêr))

jê wergirtibû ku dijî Barzanîya şerî neken . Her wisa hinêk ahêt xwarnê jî li Şinu komkirbûn bo rojêt tengavîyê pêtivîye bi zanin ku Kurda bi giştî ne diviya şerî digel Barzanîya biken , ji ber ku Barzanî şerkerên aza û baş bûn. ya diwê hozên Kurd wek nerît û sinc dinavbera xwe-da hest diken ku dîwarekê derunî yê hey û di amadenînin beramberî êk û du şerî ji dil bi ken . Heta li demê şerî jî ew Kurdê supay amadekirîn da şerî dijî Barzanîya biken pêş wext peywendî bi Mela Mistefayî dikirin û bi dem û cihê hêrişê agadar dikirin , paşî da şerekê ji direw da hilêxin û paşve vegerin .

Rêkxistina rêveberîya hozê li dû zêncîra Şêxatîyê bû , rêkxistineka supay yan hizbî ne bû . Serokê hozê Şêx Eh-med bû paş birayên wî bûn û her êk berpirsê bereyekê şerî bû . Piştî wan kurên Şêxa serokên ocaxên biçûktir bûn . Piştî kurên Şêxa hindek xizim û kesêt nêzîkî wan hebûn . Ewan qaremaniya xwe dişrada diyar kirbû û berpirsêt biçûk bûn .

24î / Reş mehê / bû weku 'edet em se' et pênc yan şeşî sipêdê hişyar dibûyn û diçûyîne serlêva rubarê Şino bo meşqa sipêdê li wî demî dengê topa hat . Gundek bi navê (Sîngan) du sê kîlumetra nêzîkî Şino bû li kinarê rubarê (Gadir) hebû , Barzanîya reşâsek û heft heşt tiveng li wir hebûn . Supa li rexê dî yê Gadirî bû û Barzanî jî li vî rexê bûn . Ji nişkekê ve supay (Sîngan) agir barankir , çûnku gundê Sîngan li hindav Şino bû û eger supay ew cih gitiba da girtina Şino bi sanahî kavit . Ew hêza hatî (Sîngan) bigrît pêk hatibû ji siwarêñ hoza Mameş û Mengora û

molazimekê supay serperiştîya wandikir .

Bi bihîstina dengê topa me zanî ew karê em çaverê dest pêkir . Supay çû eger nebûn bo pelamardana Barzanîya . Lew wan jî nîyaz ne bû berevanîyê ji axekê biken ku ne ya wane . Bitinê çaverêy serma zivstanê bûn heta biçine cihekê dî . Supay jî eve dizanî .

Bê rawestan min ew çend mirovên Kurd yêt di xizmeta topa da komkirin û top karxistin û çûme layê Şêx Ehmed , peywendîyên me di gel Şêx Ehmed dibê sinor bûn û her demekê me viya ba da çîne mala wî . Min li danga malê dît û yê şepirze bû û Şêx Silêman jî bo berevanîyê yê hinartîye (Sîngan) . Gote min bi lez here cem Şêx Silêman . Wî demî Mela Mistefa li Mergeverê bû . Supa ji rexê Wirmê beref Mergeverê hêriş kirbû .

Min top bir û xwe amadekir bo top barankirinê . Tişte êkê yê bi xeyala minda hatî ew bû ku topa rexê dî bê deng kem . Çunku topbaran bo ewên nedîtî karekê bi tirse . Top barankirina supay xelik şepirze kir bû . Demê ez gehîştîme (Sinîgan) siwarên Mameş û Mengura beref mila çiyayê beramber di çûne xwar û bi çar gav berev rûbarê Gadir diçûn . Digel êkemîn gulle topa me , topa supay bê deng bû . Derket tirs û lerza serbaza bibû egerê (sedemê) bê deng bûna wan . Paşî min ruyê wê wergêra layê siwara, ku hêsta di dur bûn û li dehmena çiyay di belavebûn . Mame li hîviya delîve bêt da gulla diwê bi weşînim û divêt ya karîger bît da şer zû bi dawî bêt û ziyânên giyanî di kêm bin . Merem tirsandin û revandina wan bû . Ez li hîviyê mam heta hêriş li rexê rubarî kom-

buyî . Min dazanî dê xwe mijul ken û bi tirs û lerz û bi du dilî dê li avê derbaz bin . Demê li rexê rubarî kombuyîn , min gulleka runahîyê di serra havêt û min ne diviya kes bête kuştin . Her ew gulle bû wek birîsiyê di serra çûy û siwarên Mameş û Mengora li wir ne man û bi şepirzey serê hespêن xwe zivrandin û pê pêvenan . Vêca careka dî ne Mameş û ne Mengor li sera dîyar bûn . Min li dû êk gulle pêvenan da pitir birevin û bazden , husa û her li de-spêkê û se'et nehî spêdê şer bi dawî hat li vê deverê .

Despêkirina şerî wira me bilindkir , çünku ew çend meh bû em di bê kar û tembel bibûyîn û me husa hizir dikir ku dê çarenivîsê me dê di şerî da ruhin bît : Yan dê êyne kuştin yan dê rizgar bîn û paşî ..... her çewa bît û çend zûtir bît çaktire .

Piştî serkirdêن supay bê hîvî bûyn li gundekî bi navê (Nelus) êwirîn . Mejî hizra hêrişekê dikir bi beyîne ser wê xalê . Li wir hêzeka Barzanîya ya bîst kesî li beramberî supay şer dikir . Min bi şevê top veguhastine gundekê biçûk bi navê (Gindule) ku yê zal bû li ser (Nelus)ê û çaverêyî delîveyekê bûm .

Ew fewca (Sîngan) me êexistibû jêr agirî û topa û her pişt û pişt dizivrîn , piştî revîna siwarên Mameş û Mengora (Nelus) jî bi şepirzeyî bi cih hêla û li girê pişt Nelus zivrîn û bi deşta şino da çûn û li wir êwirbûn . Belê li wir ji bin-kê ahêt xwarnê û avê di dûr bûn . Serkirdê fewca navbirî Ra'îd Kilaşî bû li ser girekê çiwar guşe rawesta bû û serbaz ne çar dikirin erdî bi kulin û bikene senger . Topa xwe li navenda wê çiwar guşê damezrandibû . Roja paştır kej

dijwar bibû û ruyê erdî hişik kirbû heta pileyekê ku axa kulayî ya rex sengerî rengê xwe wergêrandibû û dûrî (9) kîlûumetra me cihê topê bi çakî di dît û bi wî awayî bibû armanceka diyar û pêş çav .Ew fewca (Betalîyûn) nêzêkî (300) serbaz û zor hesp û hêstir û dû top û çiwar reşaşen birên û şes hawin û hindek xwarin hebûn . Her hemî li ser wî girî û di nav wî çarçûveyî da kombibûn . Piştî me ev betalîyûne êxsîrkirî û erşîvê wan ketîye ber destê me , tirs û lerz li raportên wan ya diyar bû . Bi çulkirina Nelûsî wan xwe ji şîyanên xweragirtinê û bi taybet bê avîyê dur kirbû .

Ew(24) se'eta dibê av bûn , her çende rûbarê Gadirî li bin pên wan bû, belê dizanî neşen xwe bi gehîne lêva rûbarî . Demê Nelos çulkirî , Mela Mistefayî (20) çekdarên şerker li rex û rûyên sengerên betalîyûnê belavekirbûn û car car gulelyek beref betalîyunê ve dihavêt û ew jî gêj bibûn û hizir dikir ku hemî rexên wan digirtîne û ne diwêra bi layê berê (Suvyan) jî ve biçin ku binkê piştevanîya supay bû , ku wî demî rêka pişt wan hemî ya azad bû û rêka otûmbêlê jî hebû .

Her çewa bît , kombûna betalîyûnê li ber palê wî girî serinca min rakêşa , ku li ber mewdawê topa bûn . Da pitir zalbibim li ser min birtyarda xwe bigehînime xalekê dest bo det . Bo vî karî diviya li navenda deştê da li pêş çavên wan yên zil topa bibeme pêş û ev kare di şîyanêt meda bû ji ber şepirzeîya sebazên betalîyunê , me top li rexê çepê yê girî damezrandin . Diwemîn gulle êk rast vi topa betalîyunê ket û her bi vê gulê betalîyûn berze bû û

şûnwarêt wê ji ne man . Bi durbînê diyar bû ku mirov û gîyanewer jêk veqetîyabûn û her êk bi layekî ve diçûn . Belê ji ber ku da her bi revin min gelle dihavêtine ber pên wan û ne çar dikirin ku careka dî beref sengera xwe li ser girî bi zivrînin . Paşî êk ji hevalên me , Mehmud Tewekulî , digel (10) çekdara xwe gehande wê berpalê dest di ber betalîyûnê rana û bêy hindê ji ku êk mirov ji birevît û êxisîrkirin û berf şinoyê ïnan .

Zîyanêñ gîyanî yên wan zor dikêm bûn çûnku me ne divîya kesê jê bikujîn . Belê digel topa êkê raîd Kilaşî bi dijwarî birîndar bû û paşî giyanê xwe ji dest da û li demê dadgehkirina min êk ji gunehêñ min kuştina xwedê jê razî Kilaşî bû û dibêjît di şerî da ne bikuj û ne kuştî haye .

Di vî şerî da (7) heft efser û (17) hevde efserêt rêzî (Zabit sef) û nêzîkî (300) sê sed serbaza hatine êxisîrkirin digel çek û tifaqêñ betalîyunê .

Piştî wî şerî navê min deng vedâ û eger wî şerî çend sala vekêşa ba dur ne bû bi bame êk ji serokêñ hozeka Kurdî .

Barzanîya digot : -

- (Sultan Tefrîşîyan yê ji layê Şêxê Barzan ve bo me hatî û eve êk ji percûyên (mu'cîzat) Şêxê Barzane , bi êk gulle topa dujminî peqand û ji kar êexist . Bawerî bi hindê di ïna ku her demê bikevîne di tengavîyekê da , her hinde heta bigehime wêderê .

Berî hîngî ewan zanîn û şarezayî di topa da nebûn , û navê min ji wara zor girê vedikirin , bo nimûne her demê bîrsî biban û çûbane gundekî çi di viya bi navê (Efserê topê) werdigirt .

- Efserê topê nan divêt , hêk divên yan mirîşk divên , her çewabît efserê topê bibû sîmbulê hêzê . Her wisa Barzanî jî bi qedir û xesleteka ji dil , bi min di hate pêş û baştirîn xwarin û nivîn ji min ra amadedikirn . Ez çûbame her ci-hekî (10 -15) mirovên Barzanî digel min dihatin û nubedarî li min dikirn .

Li wî demî van serkeftina Barzanî navdêr kirin , ez dibirme berokêن şerî bo girtina gund û devera çend min digotê girtina van ciha ya bê mifaye û min hewel dida wan tê bigehînim û bi taybet şêxên Barzan ku pêtivîye em berevanîyê ji xwe bikeyn û xwe ji şerên bê mifa dur bêxîn û hêdî hêdî beref armanca xwe biçîn ku bo wan Îraq bû .

Carekê me divîya gundê (Suvyan) bigrîn , belê bi avê da çû . Lê min mifa ji vê buyerê dît , çûnku heta wê rojê gulle top li ser serê min ne peqîbûn ez jê di tirsiyam , belê ji wê rojê pêve tirsa min verevî . Di wî şerî da min sengerekê mukim hebû û min bi gulle topa piştevanîya hêrişê dikir , belê sengerê min aşkira bû , vêca bê rawstan top barana dij dest pêkir . Gijêna gulle topa dengekê tîj û bi tirs hebû , ku mirovî hızır dikir her gulle topek li hindav serê mirovî dipeqît , paşî derket du sed metra di durî mirovî dipeqîn . Li despêkê ez zor tirsîyam belê pişti çend gulleyeka tirsa min nema û bê tirs ez ji sengerî derketim û top û zelamên xwe veguhastine cihekê emîn tir .

Roja êkê ya Axlêvê bû , ku dibîtecejna Newroza (1326) ê , di sengerî da û bi agirê topa me cejin dikir . Her çewa bît bi bûçûna min parastina deverê ne karekê dirûste û min topên xwe di ber Şino ra rê xistin , min digel Şêx Sil-

êma rawêj kir ku vê deverê bi cih pêlin . Axilêve bû , befir hêdî hêdî di bihujî (di helîya) û çend zêdetir li wê deverê mabayîne da ziyanên giyanî pitir bin . (Şêx Silêman) boçûnê min pesindkirin , belê ne diwêra bêje Şêx Ehmed, daxaz kir ku bi xwe biçime (Gêlas) - devereka asê bû Şêx Ehmed li wir bû - û hewil bi dem Şêx Ehmed boçûnê min pesindket . Berî niho ez sebaret êxsîra axfibûm . Îxsîr wek berî niho min gotî : Mehmud Tewekulî bir bûne Şino li mizgeftekê danabûn . Spêdê ez çûme Şino bo dîtina wan . Efserên êxsîr cilkên serbaza kirbûne ber xwe da ne niyasîn . Di nav êxsîra da rûyekê niyas kete ber çavên min , ewjî mulazim Kemalî bû ku li kolîja serbaziyê min di niyasî . Sala êkê digel mînda bû . Demê min bi navê wî gazî kirîyê , rawestîya û paşî hate pêş û bi hurmet ez maçî kirim . Min gazinde jê kirin çîma cilkên serbaza li ber xwe kirîne . Got : Ji tirsên Kurda da , min dile dilî wî da û emînkir ku Kurda ci peywendî bi êxsîra ve nîne û min pisýara efserên dî jê kir . Wa jî xwe da niyasîn . Efserekî bi vî awayî xwe da niyasîn .

- Xizmetkar (Xwa dost) .

Ez pê kenîm û pisýara pila wî kir .

Got : Qorban pile ya giring nîne , di supay da di gotine min (Neqîb) . Belê ez diktorim , bi min dost û dujmin feriq nîne , xizmetkarê hingu bes diktore .

Gotim :

Tu xwedê hind ne bêje xizmetkar û qorban , bûyerek bû ya qewmî û di van nêzîka da dê çûne mal û ser jiyana xwe.

Got : Tu dizanî eve hate serê min ji ber nanî . Me di viya karekî bikeyn çûyn bûyne efser heta nanekî bi xweyn min ji xwedê diviya vê zivstanê li bin kursiyekê bim . <13> Me çi ji şerî bû .

Sebaret cihê xwarnê hindek gazidne kirin , min gotê xwarna Barzanîya bi xwe jî ya baş nîne, min bi xwe çendîn şeva bi hindek nanê kêm yan bi genimê qelandî yê birîye serî û hindek şeva ewjî bi dest min ne ketîye . Her di wê şevê da min efser cûda kirin û min digel xwe birin , spêdê ez digel Şêx Ehmed axiftim ku serbaz û efserên rêsê berdeyn . Min bo wî ronkir ku supa hind yê lawaz nîne ku careka dî van bi hinêrîte şerî û ev serbaze yên tırsîyayn û nikarin careka dî şerî biken , zêdebarî hindê me nan û av nînin bideyne wan jî .

Li dawîyê Şêx razî bû , me dane dest hevalekê xwe (Cewad Ertaş) da bibete nêzîkî supay û berdet .

Bivî awayî efser digel meda man . Belê wira wan bi temamî hatibû xwar ne xasim ya (Neqîb Xwadostî) bo nimûne demê me Şino bicih hîlay û beref sinorê îraqê di hatîn . Li rêkê balefireka supay li ser serê me peyda bû . Neqîb (Xwadost) hate cem min û got :Tu xwedê bêje van Kurda bila tivengê xwe ser nişîvken ne ku sertîrêwan bi birsqin û serinca balefirê rakêşin û me gulle baranken û di got :

Hingu ji layê wijdanê ve berpirsên parastina me ne û di vêt çavê hewe li me bît , ne ku bê sedem bêne kuştin .

---

<13> Li Îranê ya belave ku li zivistanê çirayekî li bin mîzékê pê diken û (hildiken) çerçefekê bi ser mîzêda diden da germatî neçîte derve û li dor mîzê komdibin û pêt xwe dirêj dikene bin . (( wergêr))

Xirab nîne bizanin ku li demê dadgehkirina min bitinê ev (xizmetkare) bû dijî min axiftî û gelek efsane sebaret gunehêن min êxistine ber singê dadgehê .

('Eqîd Bîglerî) serkirdê supay bû wî demî , li demê dadgehkirina min bibû 'Emîd got :

- Min ev rêzdare li deverê ne dîtibû , belê wisa ya belav bû ku digel Barzanîya dijî supay şer dikirin , belê bi her rengekî bît û eger rast jî bît wî demî cihêl bûn . Demê ez gehîşîme (Gelas) Mela Mistefa û ( Şêx Teha) ê serokê hoza Herkîya li wir bûn .

Di kombûnekê da bi amadebûna (Şêx Ehmed) min got : Ji ber ku em berevanîyê ji devereka taybet nakeyn , bitinê berevanîyê ji giyanê xwe dikeyn , baştire biçîne cihekê emîn tir ji Şino . Her wisa çekdarên Barzanî wek despêkê bi çakî şerî naken , çûnku çû egera nabînin bo berevanîyê ji deverê . Ew berevanîyê ji jin û zaro û malê xwe diken ku dişen her wextekê bivêt veguhêzine cihekê dî .

Boçûnên min hatine pesindkirin . Mela Mistefay biryar da ku topa veguhêzime berê Mergeverê . Me herdu galskîn (Paytûn) topa ewên bi dest meketîn , me şikandin û hemî Barzanî ji Şino paşve zivrîn . Roja paştir supa gehîşte Şino .

Heta wê rojê Barzanîya çû pilan û armancê berçav nebûn , belê paşî armanc xweya bû , ku ewjî vegevîyane beref sinorê Îraqê . Min digel sercem şerkerên Barzanîya li Mergeverê pilana şerî û derbazbûnê dana ku hozê biparêzîn heta xwe bigehînin sinorî . Bi vî away şerê berhingarîyê nema û mifa ji delîvê werdigirtin . şevezekê em li

çiyayê (Şîrkan) li Mergeverê bûyn ku Mela Mistefa li wir bû . Me digel Mela Mistefayî nexşê roja bêt didana , giftûgû heta se'et çarî sipêdê dirêj bû , nêzîkî şefeqê (Elin-dê) resatîyek diyar bû hêdî hêdî nêzîk dibû derçû zel-ameke ji hoza Herkîya û xeberê ïnay ku ew sed siwarin digel supay û spêdê dê hêrişê ken . Belê ji ber ku wan ne-vêt li beramber birayên xwe rawestin . Daxaz kir em çend narincoka pavêyne dola ew lê da birevin û çi bi serê supay bêt bela bêt .

Eve cara diwê bû min bi çavêن xwe ev kare dît . Careka dî ez li (Qelatan) li devera Şino bûm link (Mihemd Axyê Mêrgesorî - êk ji Şêxên Barzan ) bû . Siwarek hat û digel Mihemed Axay axift û çû . Mihemed Axy gote min ev siware ji filan hozê ye , dibêjît em (60) şêst çekdarîn li filan cihî , du gulle topa pavêne cihê me da birevîn , me jî wekir .

Heke van kiryarêن Kurda kombikeyn dê şen dorew pila herkarea wan bo supay gehîn . Wî serdemî ez yê nêzîkî hemî perên şerî bûm . Hêrişa despêkê ya hoza Mameş û Mengora bo Sîgan jê derbiçît , hîc wextekî min Kurd ne dîtin mil bi milê supay ve şerdikirin .

Bê gûman pişti serketina supay me guh lê dibû ku gelek serokêt hoza xwe dikirine qehreman û hewl didan îsbat biken ku piştevanêن hikumetê ne , belê bi rastî cemawerê resenê milletê Kurd , yê amadenebû beramberî birayên xwe yên Kurd şerî biken .

Spêdê bi awayekê rêkxistî supay hêrîş kir . Pêş hêrîşê û li dûv birayara şevê û digel peqîna çend narincokeka si-

warêñ Herkîya çeper bicih hêla û bi destê da çûn . Eve êkemîn car bû min dîtî supa bi rêk û pêkî dest bi hêrişekê diket . Li destpêkê balefira sengerên me bombebara-nkirin , paşî topa bere da ber û li dawîyê tank ketine rê û li dû wan hêza peyade dihat . Balefir zor dinizim bûn û nûbedarî lê dikir . Belê cihêن me zor di mokim bûn û bi dirûstî di zal bûyn li ser berê şerî (30 - 40) çekdarên Barzanî li vî berey bûn .

Li dû biryara şevê divya em wî cihî berdeyn û biçîne (Kilûmtê) dî da (24) se`etên dî supay gîrokeyn heta hoz xwe komket û paşve bizvrît . Şeva paştir demê min xwe gehandîye wî kilûmtey û min sehkirîye cihê berê , min sed çuxînên agirî lê dîtin , min hizirdikir Barzanîya ew cih bernedaye belê demê min Mela Mistefa dîtî û pisyar jê kirî got : me ew cih yên çulkirîn , belê ew agir bo diserdabirina supaye . Supa dê hizir ket ku li dor her agirekî bi kêmâsî (10) çekdar yên heyin û sercem dê bîne hizar kes . Spêdê piştî bi serkevin dê bînin ku digel sîbera me şerê kirî .

Evê tektîkê , şer û zivrîn , agir hilkirin û paşve zivrîn , bi vî away şer dirêj bû heta hemî hozê (Mergever) çûlkirî .

Ew çar roj bû ez li (Mergeverê) şevekê Mela Mistefayî ez birime kombunekê ku hemî berpirsên berên şerî têda bûn digel Şêx Mihemed Sedîq piştî gihurîna zanîyarîya û li kawdanêñ berey û çekdarên hozê , biryar hate dan hindî ji me bêt berhingarîyê digel supay nekeyn û kêmtir gulle û ahêñ xwarnê bi mezêxîn û beref Gadirî biçîn . Mela Mistefa li dumahîya hozê dihat û em jî digelda bûyn .

Tıştekî serinc rakêş min li zivrînê dît ewjî pila xwer-agirtina Barzanîya bû di tengavîyada .

Şerî li 26 / Reş mehê / 1325 ê dset pê kiribû , nihu 20 î Axlêfê ye . Em digel zincîra Zagros û digel sinorê Îraqê di hatîn . Çend çiya bilind dibû befir stûrtir lêdhat û li hinde ciha digehîste metrekê . li piranîya wan ciha befir bibû bestî, seqa hind ya dijwar bû çendîn dewarên me şev ne digehande spêdê û ji serma req dibûn . Belê ew kawdan bo Barzanîya tiştekê asaybû . Jin û zaro ji cihekî bi cihekê dî vediguhaustin , çadir vedidan , nan dipat û piştî çend se'etekên bêñ vedanê du bare bi rê diketin . ev kare bi me ne dihate kirin û efserên êxsîr jî ji mera serbazbûn .

Min rizemendîya Mela Mistefayî wergirt ji bo berdana wan , çend bo xwarna me ya kêm bû , belê neçar bûyn çavdêrîya wan ji xwe pitir bi keyn . Paş ez digel şêx Ehmed jî axiftim ku wî demî seydekê (Zîwe) ya bingehê Mergeverê supay hinartibû cem Şêx Ehmed , birayar da ku efserên êxsîr digel xwe bi bet . Di wan rojanda destê supay ne digehîste Barzanîya , belê balefira zor ezyeta wan dida . Befirê hemî erd nixaftibûn . karwanê hozê li ser befirê xeteka reş çêdikir , ku dibû baştirîn nîşan ji balefira ra . Li pey wê xetê digehîstine bingehê (Mekuyê) hozê li demê bêñ vedanê yan li demê çûnê û dest jê ne parast û didane ber agirê meterlîyuza .

Bi wî away tirs û lerzeka bê sinor êxistibû di nav xelkî da . Ew çekdarêñ li dawîya îlî dihatin ji bo parastinê hîç ziyanek vê ne diket , belê zîyan vi jin û zaro û malat û çêl û gola diket . Barzanî wek nerît ('edet) berhingarîya bal-

efira na ken . Xweya bû li cem wan ku teqekirin li balefira bi tivenga karekê bê mifaye û mezaxtina gullaye her ji wî sedemî balefir bibûne mîrê esmanî , bê tirs û lerz û nizim difirîn heta balefirvan dihate dîtin . Belê ji ber kuştarên êk li du êk , rojekê Şêx Ehmed firman da ku digel derketina balefira , çekdar ji hemî rexa teqê lê biken . Di êkemîn teqe da êk ji balefira tengav kir û ber bere ji me dor ket û her nizim bû û di navbera 'ecêbî û keyif xweşîya Barzanîya da li nîva deşta Mergeverê kete xwarê û agir berbûyê û herdu balefirvan di nav agirê wan bi xwe hilkiî bûne rejû . Piştî wê carê balefir li bilindahîyeka zor difirîn û gulle û bombêن xwe bê armanc dihavêtin .

Roja êxsîr berdayn , Şêx Ehmed êk ji wa desteserkir , ku molazimê êkê Cîhanbanî yê kurê lîwa Emanullah Cîhanbanî bû . Şêx Ehmed hızır dikir ku bi rêka binemala wan yanavdêr dê serokê karwanê supay neçar ket ku destê xwe bi parêzît . Nameyek bo serokê karwanê supay nivêşî û gef lê kirin ku eger bêt û balefir careka dî jin û zaro yên me bombebaran ken , em dê vî molazimê desteser kujîn . Ev care hizra min rast derneçû . Min digot egre ber-jewendîya wa têda bît çû buhay na dene giyanê vî efserî , belê wan buha dayê yan jî tırsıyan û balefira dest ji bombebarana Kurda berda , dihatin belê ji bilindahîyeka zor difîrîn bes bo çavdêrîyê . Bombêن balefira em jî girtîn û secmîn bombayekê bi ranê êk ji hevalên me - 'Îzet 'Elî Esxerî - ketibû û birîndarkir . Bidirûstî ji rêveçûnê ketibû diviya hilgirîn . Dinav wê befir û sir û seqema dijwar da hilgirtina birîndarekê perîşan karekê bi zehmet bû , birîna

wî ya giran bû , bi çû renga bi me ne dihate hilgirtin . Li despêkê me siwarî dewarekî kir belê xwe negirt , paşî me li pişa xwe kir belê hewar hewrêt wî diçûne esmanî . Mecbur bûyn me du tiveng kirine darbestek û betenîyek hâvete ser û birîndar li ser şidand , vê carê jî xwe ne girt belê çû çarêt dî nebûn . Li nêzîkî sinorî çûme cem Mela Mîstefay bo çareserîyekê , mirovek nîşa min da wisa pê diçû ku birîn pêçê hozê bû . Ji amûrên birîn pêçiyê bitinê pilayzek vê bû . Wî birîn pêçî wisa bawerî bi xwe hebû ku eger bct û birîndar xwe bigîrt ew di çav nivandinekê da dê gulê întê der . Çû rîkêñ dî nebûn , me dest û pêñ hevalê xwe girêdan û devê wî berda diktorê rêzdar pilayzê xwe ji nav kîskê tûtinê ïna der û terkir û di birînê ra kir , qêrî ji hevalê me bilind bûn û piştî demekî ji ïnan û birnê playz kêşa derê . Spêdê pê birîndarê me hindî balîfkekê werimt . çareserîya bi tinê may Îraq bû . Me bi dar bestê li sinorî derbaz kir û da destê Îraqê , paş me li zîndana (Ebu Xirêb) li Bexda êk û du dît ji bilî Barzanîya hindek xelkê dîjî digel wî karwanî paşve dizivrî , hindeka di fîrqa Dîmokrata Azîrbayicanê da xizmet kirbû ji tirsa tulvekirina hikumeta navendî , yan ji tirsa tulvekirina helperista direvîn . Yan jî ew Kurd bûn ewên li Îranê hest bi êmnahî û rihefîyê nedikir û berjewdîya wan ya madî li Îraqê bûn . Êk ji wa şêx (Teha Herkî) bû ku digel destekaka hoza xwe paşve dihatin û li Îraqê xwedan milk û saman bû . Di gotin berdewam harîkarîya Qazî mihemed dkir û mirovekê çak bû , hindek jî gunehbarêñ navdêr bûn li pêşîya hemîya kesek hebû bi navê (Zêro Beg) ji tirsa direvî nukerê êk ji ax-

ayên Herkîya bû ku wî demî endamê Perlemanê Îraqê bû û ji milk û saman hebû . Heş neh kesek li dor xwe xirve-kirbûn , hozek bi navê (Hoza Behador) dirûst kirbû û xwe bi serokê wê dizanî . Li ser demê hukumeta millî ya Kurdistanê pila 'Eqîdî dabû xwe û bingeyek li (Balanuç) ji xwe ra danabû û bax û balexane û dam û dezgeh damezrandibûn . Balanuç dikevîte ser rîya Wirmê û Mehabadê û her tirombêleka hat û çû kirba di viya baca derbazbûnê daba Zêro Begî.

Her çewa bît evî ('Eqîdê rêzdar) mafurêن (xanê xan) raêxstibûn , carekê jî pelamara wirmê dabû . Di gotin mirovekê mîrkuje û zalime û bi xafletîve carekê 'eqîdek gitribû û bi awayekê dirundane kûşt . Ji tîrsa tolvekirinê û sîza van hemî gûnehêن kirîn bi rex hoza Barzan ketibû û ya belavebû ku parekê baş yê hişk û zêr yêt heyn .

Paş ev mirove li zîndana (Ebu Xirêb) gehîste me û li wir diyar bû ka ci mirovekê bê zerav û tirsinûke . Li zîndanê bibû dîvelank bo hemî serbaz û 'erîfa , belku dilê wan pê bi sujît . piştî du sala bi harîkarîya axayekê endamê Perlemanê Îraqê ji zîndanê derket û li ser demê hikumeta Ebdulkerîm Qasim ku Mela Mistefa vegevîya bû Îraqê . Hindek mirov li dor xwe komkirin û bû xizmetkarê supayê Îraqê dijî hêzên Mela Mistefayî şer dikir . Heta hatîye kûştin bê guman Barzanîya ne diviya peywendî digel van tuxme kesa hebin , belê ne di şîyan ji xwe dor bêxin . Her çewa bît , ev komele li rojêن 20 -25 / Axlêvê gerûya Gadirî ku bingehê sinorê Îraq û Îranê ye .

Piştî hevalê me yê birîndar li sinorî derbaz kirî û daye

dest îraqê . Li nêzîkî sinorê Îraqê me hest kir ku rêka me û Barzanîya jêk cûda bû . Şêx Ehmed yê rijd bû ku biçîte Barzan û heza hemî hozê jî her ew bû . Mela Mistefa digel hefsed çekdarên xwe bi taybetî berpirsên hozê ku dibûne sed kes û hemî hatibûne hukim kîrin li Îraqê divîya bi her awayekî xwe bi gehînîne Sovyet , ku cihê bi tinê bi hêle veheyêن û tenahîyê bibînin . Li vir hijmara me bibû heşt kes ji bilî (Elî Eszerî) yê birîndar , Nîkula jî ji me varî bû bi rex hevalekê Aşûrî ket , min ji bîrkir bû bêjîm hijareka Aşûrîyêن Wirmê - endamên Fîrqa Dîmokrat - digel meda bûn , her wisa (Se'îd) jî ew lawê min berî nihu behsê wî kirî digel meda bû , ku yê amadebû digel me bête Sovyet . Hinde xwarin jî me peydakir û Se'îd şarezayekê baş bû . Meric jî ew bû ku em bişeyn rêkê bibrîn û cilkêñ bîrsê û sermayê bikirrîn û bi karîn li dû şûn pêt Se'îd wan kulumtêñ çiya bibrîn bê nêzîkî bajêr û avedanîyê bibîn heta xwe bigehînîne rubarê (Aras) û ji avê derbaz bibîn .

Hindek tivengêن xwe me dane Kurda û li şûna her tivengekê nêzîkî (mineka) genimî me jê wergirt û çend kîluyêن xurmê me peydakirin . Spêdê demê me dest bi amadekirina xwarnê dikir , gotin zelamek yê li Efserê Topê digerît . (Navê min bibû Efserê Topê) , Mela Mistefayî hinartibû bi dû minra . Ez çûme çadira wî û zor bi keyf xwîşî pêşwazîya min kir û firman da ku nan û mastî bo min bînin . nanê gerim yê tenurê û mastê pezî bo min îna . dibît hun 'ecêb girtî bibin ku ez hosa behsê nan û mastî dikem . Nan û mast di wan kawdana da bi sanahî bi dest hemî kesa ne diket . Wan roja baştirîn xwarna me

Qelatik bû . Carekê me şiya biznekê bi dizîn , belê me ne zanî dê çewa serjêkeyn , (Zêrbaxt)î xencerek hebû . Ew heywanê bê azman li erdî da û kevil kir û hinavên wê jê ïnaneder û hemî pêkve me kire di mencelekê da .

Mela Mistefay bi dilovanîyeka zêde got :

- Sultan Tefrifîyan , te divêt kîve biçî ? hemî tişt Se'îdî yêt bo min gotîn . Ji hewera ji Mela Mistefayî baştir peyda nabît . Digel meda bin . Eger bêne kûştin li pêşiyê dê ez bim , paşî hingu . Dê pêkve serên xwe danîne ser berrekî û çarenivêşê xwe dê pêkve girêdeyin . Mirin pêkve , jîyan jî pêkve .

Min got : Her wek ji biryara hewe diyar , hingu divêt biçine Îraqê . Eger wisa bît em neşeyn digel hewe da bimînîn , ji ber hingu eger xwe bi deyne destê Îraqê êkser dê me denef Îranê û her li sinorî dê me gulle baranken .

Mela Mistefayî got :

- Kê gotîye hingu dê Mela Mistefa xwe dete dest Îraqê . Mela Mistefa xwe bi dest kesê ve bernadet . Bimînîn da bizanin biryara şêx Ehmed çî ye . raste ewî divêt biçîte Îraqê . Belê eger ez xwe bi dest Îraqê ve berdem , pişî (24) se'eta dê min li Bexda hilawîsin . Ez dê çewa çime Îraqê ? carê digel min da bin .

her çewa bît Mela mistefay birayara me bi me da giuhurîn . Min peyvîn wî bo hevalên xwe vegêran û me bîrayar da digelda bimînîn . . Mela Mistefay jî bi karekê xwe hinarte Îraqê , mejî birayr da çaverêy wî bîn .

Diwan rojan da derfet li ber nubedarên sinorê Îraqê ve bibû , hat û çûya nav hozê dikirin . Şêx Ehmed û Mela

Mistefay mijûlên giftûgûya bûn . Hêzên Îraqê jî nêzîk sin-orê di busê da bûn , karbedestên Îraqê dgel me têkel bibûn bi hizra wan me dewrekê mezin yê hey di rêkxistin û ser-ketina Barzanîya da û eger em digel da nebîn hîç tirsîyanek ji hoza Barzan namînit .

Gifûgûya wan digel li ser binaxê hindê bû ku em di şeyn bibîne muhacir (Mişext) li Îraqê û li dû yasa nîv dewletî wek müşextên siyasî dê reftarê digel me ken . Di gotin dewleta Îraqê digel Îranê peymana guhertina gu-néhbarêne siyasî ya îmza kirî .

Béguman me biryar neda bû em bibîne müşaxt li Îraqê , belê me bersiva nerê jî ne dabû dest wan da peywendîyê digel me ne birin .

Her di wan roja da me giftûgû digel Şêx Ehmed kir û di got :

- ( Min di hemî jiyana xwe da mirovên wek nihgu xwedan sinc û rewşt pak û mérçak ne dîtinîne . min çend hezdikir em di wez'ê caran da bayne li Barzan û hingu bibane mîvanêt me , belê mixabin destên me li hemî ciha di kurtin , nihu me tiştek nîne supasîya hewe pê bikeyn . Min yê bihîstî hingu di vêt biçine Sovyet , belê hingu ne şiyaye . Wek xweya hingu hez diken di nav hoza Barzan da bimînin . Berjewendîya hingu ya di hindê ra xwe bi dene dest Îraqê . Îran û Turkîya cihê hingu nîne . Omêda hingu ya bitinê Îraqe . Eger bo me çêbibît xwe bi dest Îraqê ve bideyn me çû rêkên dî li pêş nînin . Me birayar ya day em hemî biçîne Îraqê . Ji bilî Mela Mistefayî û çend çekdara ne bin . Ew dê bi zebrê çekî êne dinav axa îraqê da û hin-

dek binkên supay (Polîsa) ji çek biken , heta hikumetê ne çar biken lêborîneka giştî bi det û ser ji nû vegerîne ve de-vera Barzan . Bi vê omêdê Barzanîya birtyara xwe dabû wisa hisêb dikirin ku mana me di nav hozê da astenge bo bicihînana pilana wan . Belav bibû ku em Komunîstîn û peywendî yên digel Mosku heyn . Û eger em di nav hoza Barzan da bimînîn , dê ne çar bin xaleka dî sebaret me van şes efserên Komunîst di giftûgûyên xwe da digel dewleta Îraqê zêdeken . Bi vî away xaleka dî , dê li rêk-keftina digel Îraqê zêdebît . Wan hizir dikir ku eger em digel wan da bîn dê rêkeftin digel hikumeta Îraqê gi-rantirbît û di bît her digel rêknekevin . lew di gotine me hingu hîç gunehek li Îraqê nîne . Eger bêt û hingu coda ji me xwe bi dest Îraqê ve biden dibêt barê hingu siviktir lê bêt . Bi vî awayî û bi rengekê rêz lê girtî ewan em ji xwe dor xistîn .

Bêguman Şêx Ehmedî di got : Eger hûn hez diken dişen digel Mela Mistefayî da bin . Ev şeve ew dê baxî (Qaçax) bît , her çende berjewendîya hewe di çûna Îraqê daye , belê eger hingu hezdiken digel Mela Mistwfayî bin em rêkê li hewe nagirîn . Mejî birtyar ya day wek Mela Mistefayî baxî bibîn û wîjî birtyara me ya pesindkirî .

Her wê şevê jin û zaro û pîremêra rêka Îraqê da ber xwe . <14> belê nêzîkî (700) heft sed çekdara vejerîyane nav Îraqê . Wê şevê gayek ser jê kir û goştê wî li ser xwe

---

< 14 > Roja 17 - 18 / Nisanê , nêzîkî (1550) zelam , (1688) jin û (1329) za-royêr Barzanî digel Şêx Ehmedê Barzanî hatine dinav erdê Kurdistana Îraqê . Bizivrine guitarê D. Fuad Heme Xorşîd li kovara - Rengîn - jimare 96 .

(( wergêr ))

belavkir , hindek bi ber mejî ket û pîstê wî jî kirine kalik . Li binarê geroyek çiyay me şîv xwar û bi şevê me qesta çadira Mela Mistefay li çiyay kir .

Li wir min hest kir ku yê dil xweş ne bû bi hatina me . Heqê wî jî bû , çûnku me bihayê çekdarekî hebû . Ew çekdar jî neşêt xwe bi xwedan ket û cihê vehewyana xwe peydabiket û her dem dê bargiranî bît ji wan ra . Li demê ku çekdarên Barzanî zor dijî hatinê bûn . Bi kurtî dest û pêt me digirêday bûn . Bo nimûne her wê şevê demê min gotîye Mela Mistefay em li kur binvîn got :

- (( Başe herin li êk ji wan çadrên henê cihekî ji xwe ra bînin )) .

Bi kurtî ji wê axiftinê diyar bû ku em bi du zaravêن coda bîrdikeyn . Em di çaverê bûyn ew bi me cih û xwarin û pêtivîyatîyên dî peyda biken . Wî jî hizir dikir ku em çaverêy van tişa nebîn .

Li wî çiyay Barzanîya bitinê sê Kûn (Reşmal) hebûn . Her êka me sehkirîyê cih li bin nebû . Wê şevê sermayê li min da bû û tayê ez girtibûm . Karê bitinê bi dest hevalêن min ve hatî ew bû li bin êk ji wan reşmala cihek bo min peyda kir . ew bi xwe jî li ber befir û sermayê man û xwe kiribûne qurmik . Dizanin li bilindahîya çar hizar mitra û li ser befrê dê giriftarî çend bin . Her wê şevê (3) sê hesp û (2) se ji sermara req bibûn . Spêdê demê ez hişyarbûym min hest kir ku gerûya (hefka) min ya di sujît û dewir û piştê min bestîyê girtibûn . Wê şevê bi tinê serê min li bin reşmalê bû . Leşê min hemî ji derve mabû . Roja paştir em hemî gehîştîne wê bawerîyê ku me taqeta van

girftarîya nîne me pêkve biryar da xwe bi deyine dest Îraqê . Me di zanî egera giringîya me ya duhî ji ber topa bû . Nihu em ji çakdarekî zêdetir nînîn . Deh kesêt wek me ne digehîştine pê zelamekê Barzanî .

Di ser wê tirsa me hest pê dikir . Li roja 26 î / meha Ax-lêvê / sala 1326 ê . Me xwe bi destê Îraqê ve berda . Berî xatir xwastinê ji Barzanîya bikeyn , çaktire bêjim ji Kurdistanê bikem . Dê serhatîya daykeka Kurd vegêrim . Serhatîya bitinê soz û hesta daykînîyê dişêt xweya ket .

## **Pişka Çarê**

www.finди.info

**KURÊ MIN XEVRÎ**

www.finqi.info

Li zivistana sala 1324ê li Şino min dostayetî digel lawekî bi navê (Xeyrullah) peyadikir . Hemîya bi navê (Xeyrî) gazî dikirê , lew ez jî dê her bi wî navî bibîr ûnim . Ew êk ji wan efserên Kurd bû yên gehştîne Barzanîya û digel wan jî hatibûne Îranê û pila Neqîb li supayê Hikumeta Millî ya Kurdistanê bi rêberiya Qazî mihemed wer-girtibû .

Keçeka zor rind û ciwan li Mihabadê markirbû û digel hoza Barzan paş ve dizvrîn beref Îraqê di hatin demê hêrişa supayê Îranê hatîye ser wan . Xweya di bû ku di ser çil salîyê da ye , belê demê siwarî hespî di bû , serinca mirovî radikêşa û mirovî hizir dikir ku li nav bera ( 25 - 26 ) salîyê ye . Heta bêjî çeleng û kuk û aza bo . Deng û bas çend di xirab bane , her yê geşbîn û bi bawer bû . Zelemekê hozê radîyûyeka kevin ya bi patrîya kar diket hebo . Hindek şeva delîve ne bû em guhê xwe bideyine deng û basêن radîyûyê , spêdê Xeyrî da deng û basa bo me şiroveket . ji ber ku ew êk bû ji gûhdarêن her şev yêt

radîyûyê . Bû nimûne eger radîyûya Mosku di gutarekê da gotiba (Dê pir bêja têk şkênîn) ew da şiroveket û bêjît subahî dê supayê Sor sur bîte bakûrê Îranê û supayê dagîrker û zordar yê Îranê şkênît û derêxît û Komara Millî ya Kurdistanê vejînît .

Karê wî peydakirina xwarnê bû , bo Barzanîya û her car ji geşta peydakirina ahêñ xwarnê vegeŕiya ba , da komeka deng û basêñ taybet digel xwe ïnît , da bêjît filane hozê ya bi quranê sûnd xwarî layê Barzanîya bigrît di şerî da . bêvan hozê ya xwe ji hikumetê veqetandî û soza day careka dî harîkarîya supay neket . Yan bu nimune da bêjît serokê filane hozê li ser demê Reza Şahî hatîbû kûştin , lew harîkarîya supay naket . Vêca ji van tuxme deng û basa û şirova belavdikir û xweyadikir ku hemî milletê Kurdistanê piştevanîya Barzanîya diket û eger bêt supayê Îranê dest bi şerî biket dê her zû helweşîyêt , ne bes cihhekê herdem geşbîn bû belku omêd û geşbînî li vir û wir ji belavdikirin .

Zor kesa dizanî kanê evîna wî li ci pileye . Bû xêzana wî. min bi xwe rojekê dît birayê biçûk yê xêzana xwe digel xwe anî bû serşûyê . Wek zaroyê xwe ji dil serê wî di şûşt û hişk dikir . Xweya dikir ku nebes zelamê şer û kir-yara ne , belku zelamê malê ye jî .

Sup121121ayê Îranê hew îna û Barzanî piştî çendîn sera paşve zivrîn beref sinorê Îraqê . Li demê vegeŕyanê deyka jina Xeyrî û birayê wê li Şino man , belê jina wî ya ci-hêl bi rex ketibû . Ez li nav çadira di geryam û pisyara wan xêzana dikir ewêñ min dinîyasîn . Ez bi ser (Neqîb

Xeyrî) hilbûm ku di nav nivîna da di nalî , tayeka gerim lê bû û car car nalîn jê dihat . Demê em dîtîn serê xwe hijand , em çend efserên hevalên êkbûyn . Li vegeรiyâne Xeyrî daxaz ji mekir li tenîta wî runîn . Paş bi zimanê Turkî û nalîn ve got :

- Min divêt daxazekê ji hingu bikem , belku bawerîyê bo xêzana min çeken vegeرite Mehabad . Ez yê nexweşim û neçarim xwe bi deme dest Îraqê . Li Îraqê firmana sê-daredana min ya hey . Lew ez nizanim dê çarenivêse min çibît . Xêzana min dest û pêt min yêt girêdayin û wira min ya înaye xwarê û ya ciwan û cihêle ... xêzana wî jî wek firîştekê li dor dihat û diçû û vedluvirand û di got :

- ( Xemê ne xwe , dê zû çak bî ) .

Li wî demî (Xeyrî) babetê vegeرiyana wê bo Mihabadê digel me vekir bû û got :

- Xwe mandî neke , te berî niho ew axiftin digel min kirbûn . Peyvên wan ji peyvên te zêdetir karî li min naken . divan kawdanada ez bi çû renga dest ji te bernadem . Kawdan her di çewabin ez xêzana te me . Kîve biçî dê digel te êm û her ci bi serê te bêt dê pişkarîyê digel te kem heta bijî dê digel te mînim û eger mirî jî .....

Li vir rûyê xwe jî me veguhaste layekê dî .

Lew me zanî peyvên me di karîger nabin , belê me gotê :

- Tu jineka ciwan û cihêlî , û bitaybet jineka mirovekê humîm kirî li Îraqê û tirsa li ser te hey . Dibît bibîye cihê rêz negirtinê û dest dirêjîyê beramberî te biken . Dê êş û azarênen zelamê te zêdetir lê ên . Eger te ew xweş bi vêt ve-

gere Mehabadê , ev çende jî du hala dîyardiket , eger bêt û zelamê te derbaz bû dê zivrîyeve cem wî û eger li sêdarê jî da . Vêca li wî demî hîç codahîyek nîne tu li Mehabadê bî yan li Bexda .

Me ne dizanî kanê peyyêne me dê dikarîgerbin yan ne . Belê her çewabît me (Xeyrî) li nav axa Îraqê da dît û xêzana wî digel da bû , hêsta nexweşîya wî girantir lê hatibû , belê ji ber ku efserên Îraqê dinîyasî derman bo di ïnan . Spêdê gehiştîne cihekî bi navê (Dîyana) dewarek bo girt û bi siwarî firê kir . Em hemî bi pîya dicûyn .

Diyana êkemîn xala sinorî ye ku tirombêl digehnê . Li wir em siwarî lurîyekê kirîn . Em girtî li du lurîya siwarkirîn û du lurîya jî nubedar têda bûn . Du sê kîlûmetra ji Diyana dur ketibûyn , demê min jinek dîtî li rexê cepê yê rîkê bi xar dihat û dicû û bi dengekê bilind tiştek digot . Demê em nêzîk bûyîn min guh lêbû di got :

- Kurê min Xeyrî ! kurê min Xeyrî .

Bi xar û bi pirçeka berday ku dersûka wê ve bibû û tuz ji erdî radikir û pirça wê qij bibû < 15 > û ruyêt wê li ber tavê hatibûne sutin û bitinê du çavêt zîq di diyar bûn . Bêyî Xeyrî bibînît hate cem polîsa û hewar dikir û di got : Kurê min Xeyrî ! kurê min Xeyrî !

Piştî xwe havêtîye ser bunidê tirombêlê , Xeyrî serê xwe veşart û gote me :

- Deyka mine bêjinê li vir nîne .

Belê ne em di zimanê wî di gehiştîn û ne polîsa mu-

---

< 15 > Li Kurdewerîyê da jin parçeka reş malê ji bo şîn gêranê û ezyet danê di xwe di alînîtin . Zor car (Mil bi kuynî ve dinît) û di stiranên filkilorî da di-hête bihîstin . ((wergêr))

let dida ku digel me bi peyvit . Tirombêl rawestîya û du 'Erîf jê hatine xwar û ew ji tirombêla dur êxist û li rexê rêkê bi cih hêla .

Belê her digel çûna tirombêlê , ewê di çav niqandinekê da careka dî xwe havête ser difna tirombêlê .

Ev bûyere du sê cara dû bare bû . Heta cara dûmahîyê Polîsa li ser erdî rakêşa û havête rexê rêkê di nav cûkekê da . Vê carê heta rabûye ve tirombêl dur ketibûn .

Kesê ne dizanî vê jinê çewa dizanî kurê wê yê divê tirombêlê da . Belê her çewa bît li qûnaxa paştir me ev jine dîte ve . Li wê quanxê em birîne çadira nûbedarên fewceka supay . Ew fewc li rexê gundekî êwir bibûn . Her ji tiromblê em hatîne xarê û me careka dî diya xeyrî dît li teniştâ çadira nûbedara li ser çukêñ xwe ya runiştî , kesê ne zanî bi ci awa xwe gehandubû wir . Mirov di şêt bêjîtbihina daykîniyê ew gehandibû wir .

Wê şevê em birîne kelatekê ku bingehê Polîsa bû . Ji hîvî û diravê me mezaxtî , mulet da diya Xeyrî bo demekê kurt kurê xwe bibînit . Di wê dîtina kurt da bes sehdikre kurê xwe û bê êk peyv baxvît , te digot hemî giyanê wê bûye peyv û gotin . Her wisa evîna daykatîyê bi ser kurê xwe da di barand , belê bes di got :

- Kurê min Xeyrî ! .....

Bê guman Xeyrî di axift û dile dilî diya xwe di da û daxaz jê dikir ku vegerîte ve mal . Belê wê li wî demî tenê berê xwe dida kurê xwe .

Digel elinda spêdê em berf Kerkukê birîn û heta rojava em li wir mayn . Nêzîkî rojava em birîne wêstgeha

şemendefirê , em li Fargûneka taybet siwarkirîn û li wir halê Xeyrî xirab tir lê hat . Berdewam nalînêt wî dihatin û daxaza dixturî dikir . Fargûna me ya dayxistî û coda bû , pewendî bi fargûnên dî ve nebû , destêن her du kesa ji me pêkve kelepçekirkûn . Her çende xeyrî yê nesax jî bû , belê destêن wî bi kursîkeka fargunê ve girêdabûn . Pişti se'etekê bi rîketina şemendefirê denge dengek ji pişt dergehî hate guhêن me te digot pişikek ya pençen xwe ya bi dergehî ra di înit û di bet û nûyz nûyzê diket , evî dengî serinca nubedarî rakêşa .

Serokê nûbedarêن me Qumsiyarek (Mifewiz) bû yê difin bilind û xweya di bû ku di gencînîya xwe da sinceka baş nebît . Erîfî jî her wisa behis jê dikir . Di vî karî da xwe tir bilind dikir û di viya li her delîvekê hêz û şîyanêن xwe nîşa me bidet . Firman da Erîfî li dû wî dengî biçît û bi zanît çîye .

Demê dergehê nav beyna fargûna vekirî , me diya xeyrî dît ya li piş dergehî rawestîyaye . Me bi rîka Erîfî ku Turkî dizanî daxaz ji Qumisyurî kir ku rîkê bidete vê deykê li tenîst kurê xwe runit , belê wî bi dijwarî bersiv da û ferman da ku wê jinê ji piş dergehî dur bêxin û dergehî daêxin . Bê guman Xeyrî jî hez ne dikir dîya wî , wî di vî halê ne xweş da bibînit . Her çew bît dergehî daixist , careka dî dengê diya Xeyrî û lep qutana wê dihat û vê carê heta spêdê vekêşa . Bê gûman Polîsa ew bi dijwarî du sê cara ji piş dergehî dur êexist , belê ya bê deng bû beramberî wan hemî peyvîn tij û dijwar û berevanî ji xwe dikir , sing125125125125125125ê xwe ve di quta û di got

:

- Kurê min Xeyrî ! ....

Ne hîvî , ne lav lav , ne tûrebûn , ne vejenek dikir . Bi dirêjîya şevê nale nala xeyrî bû li ber dergehî û bi destêن girêday bi kursîkekê ve û di got :

- (Bo xatira xwedê dixturekê bînin) .

Diya wî jî li rexê dî yê dergehî di got :

- Kurê min xeyrî ! ....

Spêdê li Bexda em birîne (Merkez sera) piştî bi xê-hatineka ser pê em havêtîne jûreka pîs û vê carê jî diya xeyrî li dergehê zîndanê ya rawestîya bû û her sehdikire kurê xwe û dibin lêvave do got :

- Kurê min xeyrî ! ....

Piştî nîv se'etekê polîsekî mîdekek bo xeyrî îna .

Diya wî hinartibû : Hindek nanê hişk û heft heşt libên xormê têda bûn .

Piştî sê roja çarenivîsê me diyar bû ji (Merkez sera) em birîne zîndan (Ebu Xirêb) . Vê carê Xeyrî digel me da nebû . Em hinartibûyîne supayî . Vêca bi vî awayî em jêk cûda bûyîn û êdî deng û basêن wî ji mera ne dihatin . Me bi rêka rojnama di zanî ku yên dayne dadgeha supay .

Piştî pênc şes meha demê ('Elî Esxerî) gehîştiye cem me . Me çarenivîsê wî û diya wî zanî . ('Elî Esxerî) li demê şerî birîndar bibû me bi neçarî dabû dest nubedarên Îraqê û piştî sax bûy êkser hinartibû zîndana giştî ku em jî wî demî têdabûyn .

- Xeyrî bi diya xwe li hemî ciha navdêr bibû . Her dem ya bi dû kurê xwe ve bû , te di got ya li dûbihna wî di çît û li

her cihekî ba bê pirs ya amadebû .Wî demî xeyrullah li kempa supay yê girtîbû . diya wî berdewam li wir bû . Demê di bire dadgehê bi dûra di çû û digel vedgerîya . Hemî efser û dadwera di niyasî û dile dilî wê dida û di gotê (nêzîk dê kurê te berdeyn) . Di gote efsera kurê min bi denev min da bibeme mal .

Li dawîyê firaman sêdaredana Xeyrullah derket . <16> Rojnama jî nivîsî ku li zîndana navendî li sêdarê dan . belê hêş wê daxaza wî dikir .

Spêdeya li sêdarê day xeyrullay du rika'et nivêj kirin û xwe amadekir bo sêdarê û got :

- ( Ez lawekê Kurdim û ez şanazîyê dikem ji bo serx-webûna Kurdistanê bimrim .

Li dawîyê raspard ku termê wî bi denev dîyawî... )

Her wê rojê gotine diya wî ku kurê wê yê li sêdarê day , belê hêşta digot :

- Kurê min bi denev min, dê beme mal) .

Kurê wê dane vê belê bê ruh .

Çend kesên Kurd harîkarîya wê kir pîkapek bo girtin û şehîdê Kurd birine Hevlîrê . Dibêjin diya Xeyrî di tirombêlê da li pişt serê kurê xwe runiştibû , serê xwe danabû ser termê wî û bê şîn û girî di got :

- (Kurê min xeyrî sexlet nebe , bigehîne mal dê çak bî ) .

‘Elî Esxerî ji zîndanîyên Kurdêن Îraqê bihîstibû ku li Hevlîrê çend kes û karêن Xeyrî kom bibûn û termê wî li

---

< 16 > Şehîd Xeyrulla Ebdulkerîm li spêdeya roja 19 î / Xizîrana / 1947 digel sê efserên qehremanen din : `Îzzet Ebdulezîz , Mistefa Xoşnaw , Mihemed Mehîmûd Qudsî , li zîndana navendî ya Bexda li sêdarê dan .

guristana bajêrî veşart û demê vegeรiyayn , diya Xeyrî berze bû .

Spêdê diya xeyrî li ser gûrê wî dibînin , ku serê xwe yê danaye ser gûrî û ya mirî .

www.finzi.info

## **Pişka Pêncê**

www.finji.info

*IRAQ*

www.finzi.info

**D**emê me birayar day xwe bi dest ûraqê ve berdeyn , me xatira xwe ji Mela Mistefayî xwast , ew cara dawîyê bû Mela Mistefayî bibînim . Pêdiçû yê dil xweş bît bi biryara me çûnku giranîyek ji milên wî rabû . Me nûbedarêñ sinorê ûraqê agedarkirbûn ku dê em xwe deyne dest wan , bi mercê me wek penaberêñ (mişextêt) siyasî wergirin . Ewan biroskek bi îmza salih cebir - Serok Wezîrê wî demî - nîşa me da . Tê da gotibû : Dewleta ûraqê li dû yasa nêv dewletî dê wek penaberêñ siyasî reftarê digel efserêñ supayê ûranê ket. Berî hîngê me ti-vengêñ xwe dabûne barzanîya û bi hîvîyeka bitirs em li sinorî derbazbûn û çûyene nav çadirêñ nûbedarêñ ûraqê .

Li despêkê reftarê wan digel me yê dostane bû li êkemîn kempa polîsêñ ûraqê em pêşkêşî berpirsê sinorî yan bi gotina wan fermandê polîsêñ ûraqê ku navê wî ('Emîd Hîcazı) bi Turkîyeka Istenbolî digel me di axift û di got :

Efserêt resmî bila ne tirsin , em bi çû renga hewe bi dest ûranê ve bernadeyn û li dû yasa nêv dewletî dê reftarê digel hewe keyn .

Heta vî cihî Polîsêñ ûraqê dostînîya me kir . Paş piştî deh diwazde se'etêñ bihêñ vedanê em daynev çekdarêñ

deverê û qunax qunax digel me dihatin . Bi hizra wan ji ber ku em dijî dewletêyne bi tîjî û dijwarî reftar digel me dikir . Li bajêrkê (Diyana) em daynev supay û em birîne Kerkuk . Paş destêن me kelepçekirin û çend me nerazîbûna xwe jî diyar kir û erkê gehandina me êxiste situyê qumisurenê genc . Qmisurê giringîyeka mezin dida erkê xwe û bi difin bilindî digel me diaxift û di got :

- ( Kelepçe şerefa hikumeta Îraqê ye û wezîrên Reşîd 'Alî Geylanî bi van kelepça çûne ber sêdara û divêt hingu şanazîyê biken û di keyf xweş bin ku pişkek ji vê şerefê biber hewe ket .

Li Kerkukê em li şemendefirê siwar kirîn û hinartîne (Merkez Sera) li Bexda . (Merkez Sera) sê qayşen berfireh û dergehekê asinî hebû , her sê qayş di tijî mirovên pîs û çepel bûn , diz , çeqûkêş û qaçaxçî , ji van tuxme mirova bû . Her qayşekê pitir ji ( 50 -60 ) kesen vî tuxmî têda bûn û hezdikirin bizanin em ci tuxme mirovîn .

Çend afretekên dehmen pîs jî li kujîyekê hawşê di roniştibûn . Digel berpirsên zîndanê zor civînên pîs di-dane êk û du . Êk ji wan afreta ya Kermenşahî bû ji ber ku cilkên Kurdî li ber me bûn ,berê xwe da me pisyar kir :  
- Hingu li kîj tîyatiruyê (melha) girtîne ?

Vê hejarê wisa dizanî ku her kesê rêka wî bi kevîte zîndanê divêt li tîyatiruyekê girtibît û pê daçû û got :  
- ( Çima ne hatine cem min da tuş ne bin ) .

Êk ji hevalê me (Cewad Erteşîyar) ku Kermenşay bû , çend civînên xirab danê .

Afertê bersiv dayê û gotê :

- (Başe bo tû xwe ture dikey , hemî zelam vî karî diken , tû jî êk ji wanî . Bo tu nihu berêt (tirib) nivêja paqij di key ?

Her çewabît êk ji qayışa betal kir zîndanî birine her dû qayışen dî û em jî birîne qayışa betal kirî . Di vê qayşê da sê çar berêt pîs raixistibûn . Hewayê (bayê) qayşê hind yê pîs bû bi gotina êk ji havalên me divîya te bi sîkara paqij kirba . Du teneke bo pîsatîyê zîndanê li kujîyekê qayışê danabûn bi vî away êkemîn mîvandarîya me ya resmî (fermî) bo Hikumeta Îraqê destpêkir .

Li vir em bûyne bînerêt hindek mîrçakîya ku vejana tîj û dijwarê bûn . Wisa dihate pêş çav ku van herdu rewşa peywendîya pêkve hey . Wêrana zîndanîya vejna tîjîya perpirsên zîndanê bû , yan tîjîya berpirsa bibû egera wêrana zêndanîya . Béguman tîjatî vejena wêranê bû .

Di wan rojêñ em li (Merkez Seray) êk du car (7 - 8) xwîndkarêñ zankoyê diñnan . Wî serdemî wek hemî cihêñ dunyayê hemî rikber bi navê (komnîsta) serkot dikirin , her bi wê hêcetê xwîndkar jî digirtin . Carekê ji ber bê tureîya nubedara beramber xwîndkarêñ rikber , xwîndakara dest hilîna û lêdan û min hay lê bû bi ci dijwarî bersiva wan dida . Û destêñ xwîndkara di girêday bûn û her wan karê xwe dijî wan dikir heta ew bi xwe mandî bûyn , belê hindî tîjî û dijwarîya wan zêdetir lê dihat wêran û azayî ya xwîndkara pitir mewda vegirt . Belê demê destêñ wan vekirîn êkser wekî şerê firî û du zilleh li bin guhê nubedarekî dan . Êk dû cara min

azaya xelkê Îraqê li (Merkez Seray) dît , belê paşî min nimunê serinc rakêş ji azatî û desthelî û zîrekîya wan dîtin . Min dît çewa heta mirnê rikberin û dest ji berevanîyê bernaden .

Êk ji simbulên tîjatîya polîsên Îraqê zincîreke li dest û pêñ mirovî girêdiden . Li ber dergehê her zîndanekê asingerek yê hey . Her kes hukim bît û biçîte jûr çewa diçîte cem wênegirê tila , wisa divêt biçîte cem asingerî jî . (’Elî Esxerî) êk ji hevalên me bû bi navê sinordaş mehekê gitibû û ji van zincîra bê bar nebibû , ku li demê birîndarîyê li sinorî xwe da bû destê Îraqê . Demê girtî û birîye zîndana navendî ya Îraqê , nêzîkî (3000) sê hizara di zîndanê da bûn ku hemîya zincîr di piya da bûn , ew zincîr di jêk coda ji alîyê kurt û dirêjîyê û sivikî û giranîyê li dû giranî û sifkatîya gunehbarîye . Zîncîrên hindeka hind di dirêj bûn li dur milêt xwe di alandin belê ewê kurt davek dinîvîra hilkêşa da li demê çûnê di erdî ra ne xişyabane , zîncîrên dirêj li dest û pîya di hatine girêdan .

Piştî çend rojeka û paş tûjandineka kurt li (Merkez Sera) em birîne zîndana (Ebu Xirêb) . Ebu Xirêb gundeke li nêzîk Bexda , pêştir kemp bû û li wî demî kirbû zîndan bi navê (Zîndana Melikî) nubedarêt vê zîndanê hemî jî nubedarên melikî bûn .

Li pêşiyê her sê ji me kirine di jorekê ve û her êkî dû betenîyê dirîyay danê û dergeh li ser me daêxist rojê nîv se'etê em di birîne ji derve , belê halê me baştir lê hat piştî me zor gazinde kirîn . Dergehê qayışê bes bi şevê kilfil (mift) dida . Me di karî biçîne cem êk û dû û li rewaqê

pîyasê bikeyn û xwarnê bo xwe lênen .

Bi her zîndanîyekî (300) sê sed filis (nêzîkî şest Rîyalâ) bo xercî tirxan dikirin . Li despêkê wan xwarin , xercî bi parê hişk di da me û piştî hingî me bi xwe xwarin di lêna .

Her çewa bît piştî êk du meha halê me gelek çêtir çê bû , rayîx dana me belê reftarê nubedara hîç gihurînek neketê û her bi şevê dergehê qayîşê da diixist û guh ne di da rikberîya me .

Çak bûna halê me ne ji firmana berpirsa bû belê ji egera wan parên hişk bû ewên bi navê xercî di dane me . Ku bi wan parêt me zêdedikirin me zar û ezmanê (Erîf Husêñ) berpirsê nubedara girê da bû . Ji ber hindê roj bo rojê halê me baştir lê di hat .

Bertîl û berîtl xorî hemî kelwaşê dam û dezgehêن Hikumeta Îraqê pîs kirbû , hemî kar bi pare di hate kirin . Piştî şeş meha mulet da me nama ji malêن xwe ra binvîsîn , rojname û kitêb û belavukêt hizbê jî di gehîstine destê me . Ew name û çapkirîyêن ji Îranê bi me dihatin berî bi çine dam û dezgehêن asayîşê di hatine cem me û careka dî me di dane destê (Erîf Husêñî) da binêrîte cihêن berpirs . Hejî gotinê ye ku hindek ji wa namêن me hizir dikirin ku çû ziyan têda nînin û me di hinartine sansorê , dezgehê asayîşê gîrudikirin .

Piştî min peywendî digel mal kirî , min zanî jin û zarokên min ji Azîrbaycanê yên çûyne Suvyet . Demê min Tewrêz bi cih hêlay xêzana min digel herdu zaroyêن min yên biçûk bi saxî li Tewrêzê bûn û digel malêن dî müşextî suvyet bibûn . Demê salekê agir di hinavêن min da bû ji

ber çû ji van xweşivîya ne dizanî . Belê min xesîyeka zîrek hebû (xwedê jê razî bît) ku şîya konsolîya Suvyet li (Meşhed) meçbur bi ket daxaza zanîyarîya sebaret halê keça wê bo bînin û heta kaxez ji keça wê gehîştîyê û berdewam peywendî û kaxez bo di hinartin û husa kaxezên xêzana min ji min ra dihinartine Îraqê bi vê rêkê min şîya peywendîyê bi xêzana xwe bi kem .

Me şîya xwe nêzîkî berpirsê sansorê bikeyn û derfet dame ku car car biçîne binkê polîsêt Îraqê li Bexda . Li wir her bi dîtina me da çekmeça mîza xwe rakêşît û bîhayê her daxazekê êk Dînara Îraqî bû .

Piştî sal û nîva em careka dî veguhastîne ve Bexda ku dê paşî serhiatîya wir vegêrim . Ji ber ku delîva bertîla li ber me ve bibû . Derfetê bi dene min da vî babetî temam kem . Li (Samirra) . Car car bi hêceta seredana nuşdarî (Duxturê) pispor yan nexwşxanê ....htd . êk ji me dibirine (Merkez Sera) her li cem wî berpirsî bê pisyar êk Dînar Bertîl me di êxiste di çekmeça mîzê da û paş da daxzên xwe pêşkêş keyn :

- Cara bêt rîzdar (Zêrbext) daxza biken , eve Dînara wî . çend roja bo çareserîya nexwşîya xwe min divêt çend rojeka li vir bimînim û biçime bajêrî , eve jî Dînarek . Ew kitêb û namên li sansorê hatîne giriitn min divêt bînim . evejî Dînarek .

Bi vî away hemî daxazên min pesindkirin .

Salên 1946 -1947 ê salên geşbûna serhildana milletên azadîxwaz bû yên jêr dest . Rêberîya azadîxwazîya Îraqê hizbên dîmokrat bûn û li pêşîya wan hizba komunîsata

Îraqê bi rêberîya Yusif Selman (Fehid) vê hizbê çapameniyêni nihêni û aşkera hebûn . (El - Qa'ide) ziman halê nihêni bû (El - Esas) ziman halê aşkira yê hizbê bû ku bi harîkarîya (duhin waşir - bertîl) <17> di gehîste destê me .

Roj ne bû rikberî dijî peymana dinav bera Îraqê û Konyalî da xwe pîşandan û dijayetî di nav bera polîs û cemawerî da nebin .

Heta li dawîyê (Nûrî Se'îd) bi nûneriya Hikumeta Îraqê çûye Berîtanîya û peymaneka nû li nay bera Nûrî Se'îd û (Bûyn) Wezîrê Dervey Berîtanîya li Benders (Portismin) hate morkirin û her bi wî navî navdêr bû . Cemawerî ew peyman bi zincîreka nû ya girêdana dest û pêñ milltê Îraqê dana . Neku bi tinê rikberîya wî dikir belku xwe pêşandan di berdewam bûn heta kabîne Wezarî bi serokatîya Salih Cebir ketî û hikumeteka dî bi serokatîya (Muzahim Paçeçî) pêk hatî . bizava serxwebûnê pêşvetir di çû . Belê vê çendê hestê xelkî kêmter lê nekir û her xwepîşandan di berdewam bûn û bo egerê zêdebûna zîndanîya .

Li sala 1948 ê doza felestînî aloz bû , pêk ïnana hikumeteka Îsraîlî bû delîve bu desthelatdarîyêni Îraqî û hewar hewara 'Ereba li seranserî gizîrta 'Erebî û girêdana kûnfiransî û kombîna û betalfyunêt fîdaîya bu şerê Israîlê . Tiştekê siroştîye ku divê gerim û gurê da êkemîn fîdaîyêni rijêmên 'Ereba û mirovên azadîxwaz ên hikumeta Îraqê di ví biyavî da hukmê 'urfî ragehand û dest bi kiryarêngirtin

---

<17> Duhin waşir wate - Bertîl . ((Nivîser))

---

û tepeserkirina rikberên dijî `Împiryalizmê kir .

Çekê di destêن hikumetêن kolunyalî û nukerêن biyanîya da bes azar dan û koştina wan bû .

Berpirsê rêkxistinêt Hizba Komunîst ya Îraqê bi navê nihêni (Yusif Kamil) hate girtin û li bin lêdan û qutanê hemî rêkxistinêt hizbê aşkera kirin û (Yusif Selman - Fehid -) jî aşkira bû .

Hemî zîndanêن Bexda û Ebu Xirêb pirbûn ji zîndanîya . Hindek ji wan li jêr lêdanê şehîd bûn . ( Yusif Selman - fehid , Zekî Besîm , Nacî Şemîl , Husêن Şebîbî ) ji ser kirdêt hizbê bûn ferманa sêdaredana wan derçû . Ewêن dî hinartine zînadana ( Nugret El Selman) ku bitirs û se himtirîn zînadana Îraqî ye û di kvîte rexê biyabana hişk û germa rojavay li ser sinorê `Erebistana Si'udî .

Me li zîndana (Ebu Xirêb) delîva azadîyê pitir hebû . Ew zîndanîyêن hatîne qayîşa me pitirîya wan ew bîst û ciwar se'et bûn dibîrsî û têni . Di ser hindê jî ra , ew hêj li jêr qunaxa tûjandinê da bûn û divîyan sero berê hevalên xwe yên dî jî bi zanin û pisyar û şîreta ji êk du wergirin da bizanin kanê rêya tûjanidina wan ya çewa bû . Pêtivîyatî bi harîkarîya me hebûn . Em jî bi huyê hev rêbaz û hev bendîyayetî di hewara wan biçîn .

Karbedestêن zîndanê ji nişkekê ve hestpê kir ku xwarina me ya zêdebûyî . Di viya em bu her êkî bi kemasî jemeka xwarinê peydabikeyn . Jimara wan nêzîkî (100) sed kesa bûn . Her evejî bu huyê hindê ku bi çavekê xirab berê xwe bidene me û divîyan li demê harîkarî kirina wan wek (gunehbar) me bigirin . Belê me neşîya belkû guneha

me ji zarê zîndanîyekî wergirin . Belê bê rastîyan em dûrêxstîne (Samirra) . Çewanîya tûijandinê digel zîndanîyekî . Me gehandibû destê hevalekî , wî jî digel pelamardana nubedara kaxiz havêtibû di gerya xwe da û da'ûyira bû .

Demê em li zîndana (Ebu Xirêb) me gelek runkirin sebaret çarenivîsê xwe didane berprsên hikumeta Îraqê û me digûtê : hewe em bi navê penaberêt siyasî yên wergitîn , hewe mafê hindê nîne ku me zînadanî bi ken . Di vêt ma-fêñ akincî bûnê li Îraqê bi dene me yan derfetê bi dene me ji Îraqê derkevîn .

Carekê digel me roniştin û biryar da ku sê wilata dest nîşan bikeyn , da hikumeta Îraqê peywendîyê bi bal-yozxaên wan bi ket û her êka hewe wergirîtin dê hewe hinêrîte wir . Bê guman ev çende jî ya bê encam bû me çû bersiv wernegirtin . Li demê serhildanê da me divîya peywendîyê bi rojnamên azad bi keyn û wez'ê xwe bêxîne ber guhê xelkê Îraqê û daxaza harîkarîyê jê bi keyn . Me şiya peywendîya bi rojnama (El - Esas) ya nîv aşkira bi-keyn ku zimanhalê lawên dîmokrat bû . Her wesa me şiya digel hindek serbazên (Mukelef) baxvîn û hindek cara jî me pare di danê û doza xwe me ji wan ra rûnkir û kaxezên me digehandine cihêن me divîyan . rojnama (El - 'Esfur) ya bi aşkira derdiçû û nêzîkî (El - Esas) bû , nameka me belavkir . Piştî belavbûna vê namê ji bo mijulkirinê karbedesta peywendî bi me kir .

Li Samirra maleka biçûk bo me girtin û nav lê na zîndan , çend polîsa nubedarî li medikir . Em li wir deh

kes bûyn hevalê me yê birîndar piştî çak bûy û mehekê di zîndanê gehîste me . Demê sal û nîveka em li Samirra mayn . Li wir jî me dest ji bizav û xebat û rûnkirina çarenivîsê xwe berneda . Me divîya zû hikumeta îraqê çarenivîsê me diyar runket . Carekê me xwarin ne xwar (Mangirt) me divîya me azad ken . Me gotê em penaberên siyasî ne hewe maf nîne me bigrin . yan me li cihekî akincê ken yan muletê bi dene me em ji Îraqê derkevîn . Mangirtina me hev bû digel hewla kûstina şahî li 15 / Behmenê / 1327 .

Me dît mangirtina me qazanc têda nîne û me gotinê berpirsê zîndanê pesindkirin û dest ji mangirtinê berda .

Mangirtina me ji xwarnê sê roja vekêsa û li dû wan sozên dayne me . Me mangirtina xwe şikand .belê hîç tiştek ji encamê hindê bi dest me ne ket . Bi tinê biryar da ('Elî Esxerî) berden çûnkî daghehê firmana girtina wî bi mahekê dabû û demê wî temam bibû belê berpirsê zîndanê dijî bicih ïnana biryara daghehê bizav dikir û digot : hun hemî wek êkin , yan dê hemî di zîndanê ve bin , yan hemî dê azad bin

Ew Îranîyêñ digel me mişextî Îraqê bûyn , hemî di azad bûn , cihêñ akincîbûnê bu diyar kirbûn û xercî û mûçêñ mehane jêra terxankir bûn , bi tinê em deh efser di girtibûn , halê me jî weku hev du ne bû . Şeş ji me efserên resmî yên supay bûn , belê çarêñ dî efserên supayê Azirbaycanê bûn . Ewan wisa hizir dikir ku eger bêt û xwe bi dene dest Îranê hîç tirsek li ser wan nîne û dê mifay ji lêbûrîna giştîya Azirbaycanê wergirin . Lew xwe ji me

cûda kir û berdewam daxaz dikir ku bidene destê ûranê , bê guman mejî rikberîya biryara wan ne dikir . Li dawîyê hikumeta Îraqê ew çiwar kes ji me cûda kirin û birine Bexda û em jî , ew şes kes veguhastîne xanîyekê mezintir û xweştir .

Piştî demekî me man ji xwarnê girt , daxwaza azadîyeka zêdetir dikir . Heta li dawîyê biryar day her rojê sê kes ji me digel nobedarekî li nav bajêrî bigeryêyn . Samirra ji bilî ku hindek cihêن pîroz yên lê heyn şûnwarêن kevin û kavilê koçka (Mu'tesim Bîlla) xelîfê 'Ebasî çûyê dî lê nîne .

Li wan du salên em li Samirra berpirsêن herdu welata Îraq û Îranê kombûn dikirin û bi dizîve peymana Bexda rêkêxist . Bo rêkxistina wê peymanê (Ebdûil Îlah) ê cêgirê melikê Îraqê li dawîya sala 1328ê seredana Tehran kir û . Piştî zincîreka hatin û çûna hikumeta Îraqê razî bû me bi dest Îranê ve berdet û hikumeta Îranê jî sê mirova ji efserêc Barzanî yêc Îraqî ku penaberbûn li îranê bi dete dest Îraqê . belê bo bitinê merema pak ya siyasî hikumeta Îranê soz dabû me li sêdarê neden .

Piştî van bûyera em hatîne agedarkirin ku xwe amadekeyn bo vegeryana îranê . Me nerazîfbûna xwe bi tundî û dijwarî dîyarkir û ketîne rikberîyê . Belê serokê ba-jêrvaniya Samira peywendîyên dostane digel me hebûn û di got :

- Rikberî ya bê mifaye .

Ji bo dîtina çarekê em digel qaymqamê Samirra ketîne giftûgûyê . Ji layekê dî ve xwedanê wê mala em têda di

akincî bo me zor hewil dan ku êk ji serokên hozêن `Ereba bû li Samirra û reftarê wî digel me zor yê mirovane bû . Çend cara em li mala xwe mêvan dikirin û her di rêka wîda me çend kesanekên dînî (Aynî) yêن samirra nîyasîn û li çivatêن ders û gotarêن wan amade dibûyn , ewî lîstek bi îmza xwe û çendîn mezinêن aynî yêن (Sune) mezheb daxwaznameyek amadekir û da hikumetê têda amadeya xwe xweyakir bû ku bo her karekê beramberî berdana me, belê karê bi tinê qaymiqamê Samira kirî ewbû daxwazname û lîsta nava bo wezîrê navxweyî hinartibû .

Li despêka meha Axlêvê 1329 ê em hinartîne fêrgeha polîsa li Bexda . Her çar hevalêن xwe me lê dîtin . Careka dî bûyne deh kes . Me gote hevalêن xwe me birayara berevanîyê ya ji xwe ra day û em di amadenînîn me bi dene dest Îranê .

Ewan jî ew çend pesindkir . Serokê polîsêن Bexda hate cem me û got : Ji ber ku hikumetê biryar ya day , vêca hîç rikberîyek faydenaket . Mejî bi nerê bersiva wî da .

Spêdê serokê giştî yê polîsêن Îraqê hate cem me û her ew gotin dûbare kirin , her wisa dilnîya kirîn ku yê digel hikumeta Îranê rêk keftîn me li sêdarê ne den . Berdewam bi Turkîya Istembulî digot :

- (Asmik yugdur) , Sêdare nîne .

Belê her bersiva mejî (nerê bû) û me hikumeta Îraqê gubernbar dikir bi bê soz û yasa şikandinê .

Roja paştir Eynî bû kolîja polîsa ya daxistîbû , li despêkê em xapandîn û bi navê giftûgûyê em ji êk û du cûda kirîn û paşî te'da û zorî li me kirin û qeyd (zincîr) kirine

destên me û em havêtîne di dû pêkaba da û beref Xaneqîn birîn . Ji serî heta piya em xwînelo kirbûyn , lêvên min werimtibûn û xwîn jê dihat . Wî çaxê ez girtîm min kire hewar , da hevalên min hay lê bibît , belê Polîsa devê min girêda û wisa şidand heta ez deng bir kirîm , her wisa demê em kirîne di tirombêlê da se'et û qelem û çi parêن me heyn ji me standin û ez dişêm bêjim em talankirîn .

Demê em kirîne di nav tirombêla da em têgehiştîn ku kes ji me bi silametî derbaz ne bûye . Em hemî ji serî heta piya di xwînelo bûyn lew me dizanî bi her awayekî bît dê me dene dest Îranê , berî hîngê me nêzîkî (300) belavokêñ dest nivîs amadekirbûn û têda me xwe dabû nîyasîn bo xelkê Îraqê û reftarê ne yasayî û ne ciwamêrane yê hikumeta Îraqê diyarkiribû .

Di nav pêkabê da her çend bû dest û pêñ me di girêdaybûn belê me karî belavoka xwe ji berûykêñ êk û du derbêxîn û pavêne ser rêka Bexda heta Xaneqîn .

Li Xaneqîn piştî se'etekê ji gehiştina me bo zîndana Bajîrî , konsulê Îranê li wir ku navê wî (Í'tîsam Zade) bû digel qaymiqamê Xaneqîn hate cem me û bi germî kete pirsyara û got . ( Ez şanazîyê bi hewe dikem wek Îranî , hûn wek şêrêt di nav rikê danin ) û hindek peyvên ji vî tuxmî û xweyakir ku jiyan û mirin her çewabît li axa we-latî bastire ji henderan , belê nebit em ji rojêñ dahatî bitirsîn çunku hikumeta îranê soz ya day ku hewe li sêdsarê nedet . Demekê kurt dê di zînadanê ve bin paşî dê êne berdan û daxwaz ji mekir ku ser û rîhêñ xwe bi tiraşîn da di kuk û peyt bîn demê vedgerîne welatî .

Spêdê ku êkemîn roja Nevroza sala 1329 ê bû gehiştîne nav sinorî li Xesrewî û dayne dests çavdêrên supay .

Çiroka tûjandin û vekolîn û dadehêن supay û ev buyere yên bi serê gelek mirova hatîn . ji bilî em neketîne ber lê- dan û qutanê , çunku çi daxazîyêن ji mekirîn me lê ne veşartin , çunku me bi bawerî serhilda kirbû û dest dabû çekî heta derfet hey me dijî hikumetê şer kirbû .

Ez hatime hukimkirin bi sêdaredanê û çar hevalên min (Morteza , Zêrbext , Esxer Îhsanî , Mehmed Tîwayî û Cewad Erteşîyar bi girtina heta heta û Elî Neqî Reîs Dana bi deh sala hukimkirin . Paş bo me hemîya hukim pileyekî îna xwar . Çar kesên hukimê wan heta heta bûne diwazde sal û Reîs Dana bû şes sal û hemîya .....

hukimêt bi dirûstî di zîndanê ve borandin .

Piştî (16) Şazde sal û çend meheka ez li Axlêva 1342 ê hatime azadkirin . Ji hemî dunyayê , bitinê ev bîranîne û leşekê nîv mirî û hîvî bi paşerojê û keçeka êkane yên bu min mayn . Êk ji zaroyêن min her ji despêka müşextîya wan giyanê xwe ji dest da bû , diya wan jî piştî (16) Şazde sala çaverêyê û bi dirostî şes meha berî azadkirina min bi penceşêra sîhê giyanê xwe ji dest da . Xwedê jê razî bît . Demê ez ji zîndanê derketîm min zor xebatkir belku keça xwe bînime Îranê , belê çê nebû . Demê müşext bûyn ji Îranê keça min du sal bû . Bê heza xwe û di dehmena dîya xwe da müşext bibû , hîç bizaveka siyâşî ya kevin ne bû , belê ne divîya vegerît .

Li dawîya sala 1350 ê û piştî bîst û pêcê sala ji duratîyê ez li (Berlîna) rojhilat gehiştimê , keça du salî min bicih

hêlay, nihu jineka (25) bîst û heft salî beramberî xwe bibînim . Jinekê dibînim pênc sala mezintire ji wî demê diya xwe hêlay . Di hemî temenê xwe da ya bê bar bû ji nazêt babînîyê û evro hez diket wek zaroyekî ber evîn û dilovanîya babînîyê , şev heta digehîşte nîvê her di ma hişyar û di viya çîroka bo bêjim û di got : (Bêje bi dirêjîya wan bîst û pênc sala dê bo min çîroka bêjî ) .

Çi çîrok ji van bîrhatina xwştirin ? piştî serhatîya min bi dawî hatî pisyarkir :

- (Bab tû neyê peşemânî ? dîya reben zor pesnên te didan û her dem di got :

- Mixabin ku .....

Ew bersiva min dayê dê li dawîya van peyvan nivîsim:

- (Jiyana mirovî amanekê pire ji giranîyeka taybet bi pêvana rastîyê . Zor kes yên heyn bi hêminî û tenahî jiyayin, belê çend yên li paş wan mayn , belê bila destxweşiyê li wan qehremana bikeyn ewêni jiyana xwe bi karêni pir biha tijî kirîn û dîrokeka pir serhatîyen mîrane bo milletê xwe tomarkirîn ) .

www.finqi.info

## **Paşgotin**

www.fincli.info

www.finzi.info

Dastana Barzaniyê nemir di berperên dîroka bizava rizgarîxwazîya kurdî da tumarkirîn di zorin û em di karîn bêjîn herdû bûyne êk dîrok , lew milletê Kurd birayara xwe daye ku Barzanî simbolê vî milletê ye û nîşana man û nemana wî ye . Ev biryare bi qena'et û bi bawerî hatîye wergietin û pişî xebateka dûr û dirêj û pir asteng û berxwedan ya Barzanî û hevbendên wî û rubarêna xwîna Şehîda ji bû dana kelwaşekê Kurdî . Barzanî binaxê bizava rizgarî xwazîya Kurdî li ser rastî û heqîyê damezrandin û pêtir ji nîv sedê xebat jêra kirîye û bê veqetîyan û westîyan û tim û tim dîmkrasî bû bo di hizir û boçûnên xwe da û bawerîyrka mikûm bi azadîya bîr û raya hebû û qurbanî dayne ji parastina wî biyavê azad û dîmokrasî .

### **Xwendevanê hêja û Qedirgiran :**

Ev pertûka di dest da serbora efserekê Farise û xelkê bajarê Tehranê bû , endamê hîzba Tude bû di gel çend efsereñ din di vîyan bi serhildanekê rabin li Xorasanê , belê mixabin ser ne girt û her zû helweşîya û ew efser jêkbijale bûn , heta firqa Dîmokrata Azirbaycanê komara millî ya Azirbaycanê damezrandî û careka din wek efserên ser bi

hîzba tude ve pişikdarî di damezrandina supayê wê komarê da kirî. Dîyar û belî di bît ku ew efser zor bi cesaret gişt kêm û kasên Hîzba Tude û firqa Dîmikrat li qelem didet .

Belê ji alekê dî ve her bi wê cesaretê pesnê komara Mehabadê, mîranî û zîrekîya pêşmergê Baraznî diyar diket, û berî herifîna komara Azirbaycanê bi tupê xwe ve di hewara komara Mehabadê hetibû. Belê Mixabin her Ew Komar jî wek ya din herift û nikarî xwe li ser pêxwe bigire , lew efserê me jî dniya lê tarî bû û hate êk.

Tenê runahîyek li Cem Barzanîya mabû ew jî xweragirî û berxwedana wan bû dîsan nivîser xweyadiket ku Pêşeway ( Qazî Mihemed ) piştî helweşîyana komara Mîhabadê her peywendî di gel Barzanî mabûn û cihê bawerî û hîvîya wî bûn û xwe ya diket ku hemû Hozên Kurdî ji bilî hoza Qerepapax harîkarî û piştevanê Bazaranîya bûn. Her wesa diyar diket kanê hukumeta Îranê çend bizav û hewil didan da ku Barzanî çekjê xwe danit , belê mehal bû hemû bizav û karêwan bi avê da çûn behsê mîranî û xweragirîya Bazranî bi vî awayî diket , û gotina cenabê wî vedgîrît kû di bît Barzanî li rojeka tengavîyê û bê omêd di got : ( Ez Pêşwerî nînm. Penahîyan jî nînim di demê aştîyê da serok erkanê supayî bim û li demê şerî êkser serê li Bako bînime der. Ezû ev tivenegê, heta ev tivenge di destê mînda bît ez xwedanê xwe me. Xizmetkarê hîc hêzekê û hukumetekê nînim, ne Ingîz ne Emrîka, ne Rosîya ) piştî em di gel êk û dû Axiftîn , min hest kir ku ji alîyê siyasî ve ber çavên wî di runin.

Husa xweya dibît demê milletê Kurd ketiya di tengavîya da û dunya li ber tarî bûy her hîvî û omêda wan jîrî û bi-hêñ firehî û xweragirîya Barzanî û pêşmergên wî bûne û tim û tim xwe bi zendû baskêñ wî ve girtîye û ronahîya çavêñ wî rêk li ber milletê Kurd ron kiriy û ji Tonêlêñ teng û tarî derbaskirîye , lew milletê Kurd jî her û her we-fadarêñ rêbaza pêroza wî ne .

Xweyaye ku di vî çerxî da Barzanîya dijî nehez û neyarêñ Kurda rawestîyaye , heta nasnama berze û winda bûy ya milletê Kurd careka din dîtîye û vegerandîya ve ji mera û milletêñ cîhanê Kurd û doza wan bi Bazranî û xebata wî ya berdewam naskirîye û bûyne êk dîrok .

### **Xwendevanê hêja :**

Ev prtûk ji çend pişkeka pêk dihê , pêşgotina wergêrî ku hêja Şewket Şêx Yezdîn ji zimanê Farisî kirîya Kurdî . Her wesa peyvek ya nivîserî Ebulhesen Tefrîşîyan , paşî pişka êkê ya pertûkê ku behsê serhildana efseêñ Xorasanê diket ewa çend efserên ser bi hîzba Tude ya Îranî pê rabûyn û ser ne girtî .

Pêşka diwê behsê fîrqa Dîmokrata Azirbaycanê di ket û kanê çawa dirost bû û bi serhildanê rabûn û komarareka millî ragehnadin û bi awayekê rastû dirost behsê kêm û kurtîyêñ sîstema wan ya siyasî û le şkerî diket ,.

Pişka sîyê behsê Barzanîya diket û çewanîya hetina wan bû Kurdistana îranê û pişikdarîya wan di dirûstkirina leşkerê komara Mehabadê û mîranî zêrekîya wan û qurbanî dana wan di rêya tevgera rizgarî xwaza Kurdî de . Pêdivîye her Kurd perwerek vê pişkê li hûrî bi xwînit û

nivîser xweya diket kanê rolê Şêx Ehmendê Barzanî çendê giring bû di vî demîda û her wesa dûrbînî û xwer-agirîya Bazranî yê nemir qelem di det ku her ji wî demî qehremanekê bê wêne û yê milletê Kurd bûye û çewa milltê bi hoz û bajêrî ve harî kar û piştevanê vê hêza ne liv û ne bez bûyne heta bûyine hêvînê hemû serhildanên bizava rizgarî xwaza Kirdî .

Pişka çarê Kurê min Xeyrî behsê diya Xeyrî Eb-dullkerîm diket êk ji efsîren Kurdêna Îraqê yên di gel Barzanî li Mihabadê û paş xwe bi dest hukumeta îraqê ve berday û wek tiracîdîyayeka cîhanê bi awyekê edebî li qelem didet ku daykînî bi hemû awa ve diyar dibît .


Pişka pêncê behsê xwe û efsîren Iranê diket yên xwe bi dest Îraqê ve berday û heta teslîmî hukumeta Şahê Iranî diket û hemû temenê xwe di zîndanê da dibet û heta şoreşa İslamî û paş dihîte azad kirin û li dû familiya xwe digrît û ku bi tinê keça wî maye li elmanîya wek serhatî û serbora xwe ji keça xwe ra vedgêrît û di bîte ev Prtûka bi nirx û biha bû milletê Kurd .

Xwendevanê hêja :

Piştî pertûk hemû cenabê Şewket wergêrandî ye ser zimanê Kurdî elbomek ji (81) wêna lê zêdekirîye ku êk car bihayê pertûkê zêdebûye bi wênên qehreanên Bazranî û berpirsên komara Mihabadê .

Daxwaz ji xwedayê Mezin dikem her milletê me serferaz û azad bît.

*Ebdulkerîm Findî  
17.6.2001 Duhok*



Hêla gemaroya supay +++++ Xwecîbûna supay ↑

Top xane ≡

Hêla vegeryana Barzanîya <



Wêne bergê ( Raperîna Efserên Xorasanê ) çapa Farisî  
(( anku ev kitêba li ber destê we))

## **Pişka Şeşê**

www.fincli.info

***ELBÜM***


www.finzi.info



*Serokê Nemir Barzanî  
Barzan 1943*



*Serokê Nemir Barzani*  
*Mihabad 1946*



*Serkirdê ciwanemerg Idrîs Barzanî*



*runiştî ji layê rastê ve : Ceneral Mistefa Barzanî , Seyda Şêx Silêman .  
ji pêrve (Zarok) Ebdul Muheymen Şêx Silêman .  
ji pêrve ji çepê : Elî Xelîl , Mihemed Axa Mêrgesorî , Es'ed Xoşavî .*



17 kanûna êkê 1945  
bilinkirina alayê Kurdistanê li şûna alayê Îranî li avahîyê daghehê  
*Qazî Mihemed*  
*li nivîsîngeha xwe ya serokatîyê / Eylula 1946*





*Bi pêya R - C :....., Xeyrullah Ebdul kerîm , Qedrî Cemîl Paşa,  
Serok Barzanî , Izet Ebdulezîz , Nûrî Ehmed Teha , Mîrhac .  
runiştî ji rastê ve : Wehab Mihemed Axa .  
(Mihabad 1946)*

*Soreşa Seqiz (1946)  
Pêşmergên Barzanî û leşkerê Kurdistanê*





*Ragehandina komarê ji alîyê Qazî Mihemed ve  
Barzanî li hember Qazî yê rawestîyaye  
gorepana (Çiwar Çira) roja 22 î kanûna diwê 1946*

*Runiştî : Qazî Mihemed  
wezîr û hijmareka berpirsên komarê ((Mihabad Şiwat 1946))*





*General Barzani  
Mihabed 1946*



*Efserên leşkerê Kurdistanê*

---

*Qazî Mihemed di demê serok komarîyê da*





*Her sê Qazî  
ji çepê ve : Seyfî Qazî , Qazî Mihemed , Sedir Qazî.*

---

*Girtîyên Kurd ( Buhara 1948 ê )*





*Barzanîyê nemir  
li çepê wî Şehîd Îsê Siwar  
li rastê wî Dr. Se'îd Ehmed Nadir li Ékatîya Sovyetî*


*Ji pêrve ji rastê bo çepê : Es'ed Xoşevî , Ebdullah Mehmûd.  
runiştî ji rastê bo çepê : Mistefa Ebdullah , Salih Tahir .*





*jî pêrve R - Ç : Xudêda Hesen Xan , Ezîzî Mela Cin  
runiştî ji R - Ç : Selîm Kolkî , Mîro Çîço*






*R - Ç : Ezîz Bêdarûnî , Mîro Bêdarûnî*

*R - Ç Mela Şerîf Kanîyedêrî , Melo Pîro Bêstirî , Reşîd Resul Lêberî*





*Husêن Mîro , Hado*

*Hevalên rîbaza Barzanî di demê karkirnê da ( li Rosîya )*






*Efserên Ros li Mulka (Çuçul) ku meşiq bi serbazên  
Barzanîya dikirin*

*bi pîya R - Ç : Weysî Elî , Memo Şivan  
runiştî R - Ç : Melku Zêro , Elî Mihemed Sedîq*






*Kerîm Ebdula û xêzana wî Sanîye Tahir*


---

*Mihemed Emîn Kerîm Elî  
û xêzana wî Şewqîya İbrahîm û zaroyêñ wî*





*Hevalên rîbaza Barzanî (î Rosîya) R - Ç : Qebo Xalid ,  
Şerîf Ebdulselam , Haçik Mihemed*



*Şêx Yezdîn Mihemed*




*Elî Xelîl*

*Xidir Mela Wesman Nebî*



*Fetah Omer Ergûşî*





*Mela Şîn Qirtas*



*Mela Salih Şanederî*

*Derwêş Mîro*



*Mecîd Mîkaîl*





R - Ç : Xano Cuc Jajukî ,  
Mistefa Law Dûrî



Sêxomer Şanederî

Hemîd Xesro




Elî Mistefa





*Selîm Babilê û Ezîz Mela Şîn*



*Ebdul rehman Yehya Bîyeyî*




*Elî Mihemed Sedîq*



*Ezîz Mela Hebîb Pîresalî*



Mîrhac Ehmed Tahir Akireyî




Selîm 'Uzêr Kurkeyî



Mihemed Hesen Banî




Xudêda Hesen Xan



*Omer Bêdarunî*

*R - Ç : Ezîz Hesên Bêdarunî , Şêxumer Şanederî*







*Ezîz Ehmed û xêzana wî Zahîra Kîk Bay Nazarova*

*Husêن Mihemed Çîço û xêzana xwe Zahîra Kîk Bay Nazarova*






Hevaleri  
rəhəza  
Barzani  
li  
Rəsəqə



Heraldo  
reaza  
Barzani  
li  
Rosia



Heraldi  
rebaña  
Barzani  
lí  
Rosita \*



Havalen  
rēbaza  
Barzani  
li  
Rosya  
\*\*

**Hevalên rîbaza Barzanî ( \* ) :**

- 1- Pîro Hemo Kelêtî
- 2- Ehmed Cesîm Pêndiroyî
- 3- Şefîq Mela Ebdul kerîm Şîlgelî
- 4- `Îsê Siwar Sêlkî
- 5- Ebdul rehîm Cesîm Pêndiroyî
- 6- Se'dî Qasim Palanî
- 7- Xelîl Şêxo Sipîndarî
- 8- Mela Nebî Yasîn Pêndiroyî
- 9- Cewher Hesêن Sêlkî
- 10- Fetah Omer Ergûşî
- 11- Mihemed axa Reşîd Şemđîn
- 12- Hesen Mela Yehya Dêzo
- 13- Seîd Mela Ebdula Şîlgelî
- 14- Mûsa Beg Oxiz Beg
- 15- Seîd Ebdil kerîm Kelêtî
- 16- Salih Mihemed Spîndarî
- 17- Mihemed Ezîz spîndarî
- 18- Xelîl Mela Yahya Avdûrî
- 19- Hesêن Rşîd Şemđîn
- 20- Elî Xazî Têlî
- 21- Îsma'l Şêxomer Têlî
- 22- Reşîd Hemo Şîlgîllî
- 23- Goran Îsa Goran Mêruzê
- 24- Ebdulla Husêن Pêndiroyî

**Hevalên rîbaza Barzanî ( \*\* )**

- 1- Salih Xano
- 2- Şêxomer Dêrişkî
- 3- Mihemed Ezîz Mêrgesorî
- 4- Seîd Welî Beg Rêzan
- 5- Siyamend Ezîz Mêrgesorî
- 6- Mela Ebdula Zêwey
- 7- Reşîd Baqî Kurkey
- 8- Kekşar Ehmed Mêrgesorî
- 9- Slêman Neqo Îsumerî
- 10- Mistefa Reşo Lîlokî
- 11- Hesen Mela Mihemed Mêrgesorî
- 12- Mistefa Salih Nêrwey
- 13- Têlî Baqî Rêzan
- 14- Halî Mihemed Xelanî
- 15- Mela Reşîd Mazne
- 16- Hesen Mela Rêzan
- 17- Mihemed Emîn Hesen Xelanî
- 18- Ezîz Mihemed Xelanî
- 19- Ebdulla Ehmed mêrgesorî
- 20- Mihemed Hadî



Heraldi  
reaza  
Barzani  
li  
Rosia

---



Hoyalah  
rehabza  
Barzani li  
Rost'a



Mrečen  
Rus Yeri  
heyjihen  
Kurdia

rumişfi:  
Cemile,  
Pakýe,  
Kamile.

rawestfiyay:  
Zulcýe,  
Nayle,  
Temare,  
Henife,  
`Eysé Qadir



Hevaléh  
rēhaza  
Barzani  
li  
Rosya



Ç - R : Hesen Ebdulla Sêlkî , Mihemed Emîn Hesen , Haçik Dulereqe 1963

*Mal avayî li hevalên dêrîn*

li pêşiyê : Hesen Xal Hemze , Mihemed Emîn Hesen , 'Ozêr Mihemed dolemerî,  
li paşiyê : Mihemed Îsa , Mistefa ebdulla , Haçik , Diktor Se'îd , Mela İbrahim Babekir  
( ev wêneye li sala 1977 ê li Kerec bo Barzanîyê nemir yl hafîye girtin , berî biçte Emrika )






*Nemiran : Omer Axa û Elî Şe'ban*

*Nemir : Halî Dolemerî*



***JI  
ŞEHİDÊN  
RÊBAZA  
BARZANIÊ  
NIMIR***



*Xwepîşandana hevalên rêbaza Barzanî li Rosîya dijî desthelatdaran ji bo hindê da ne çarken , ku Serok Barzanî vegeŕinîne layê wan .*



*Serokê Nemir Barzanî*

*Serokê Nemir Barzanî*



*R - Ç : Barzanîyê nemir , Es'ed Xoşevî , Sêx Slêman , Sakukanê Lincî*



*Mihemed Mela Necîb Berwâîf*



*Memo şivan Axa , Hesen Ehmed Baqî*



*Mela Ebdua Zîyab ,*



*Sîyamend Weli Beg , Sîyamend Ezîz*

*ronıştî ji rastê : Siîeman Omer , Heso Mîrxan Dolemerî , Heme Ebdulla Dolemerî .  
ji pêrve ji çepê : Hafî Mihemed Dolemerî , .....*




*Mihemed ïsa Mêrgesorî*



*Mihemed Emîn Mîrxan Mêrgesorî*



*Silêman Emer Xelan*




*Mihemed Mehmud Barzanî*





*Hevalên rêbaza Barzanî li Rosîya*

*Es'ed Xosawî*



*Heso Mîrxan Iajokî*





*Hevalên rîbaza Barzanî li Rosîya*



## *Pênaşa Wergêri*

# **Şewket Şêx Yezdîn**

- \* Li sala 1954ê zayînî li bajêrê (Taşqend) ji dayik bûye. Babê wî xelkê Gundê (Dawîdka)ye li devera Mizûrî jorîya.
- \* Xudê jê razî babê wî êk bû ji pêşmergên Barzanîyê nemir li çûna navdêra wan bo Sovyet.
- \* Rêzdar Şewket Îk ji pêşmergên şoreşa Îlona mezin bû.
- \* Paş pîlana dujminên doza Kurdî li Ceza'îr/ 1975 dijî şoreşa Îlonî wek hizaran pêşmerga qesta Îranê kir û jiyana penaberîyê hilbijart.
- \* Li sala (1979) careka din dirêjî bi xebatê da û evro yê berdewame û li çendîn dezgehêñ

## Partî kar kirîye.

- \* Li kongirê yazdê li 16/Ab/1993 bûye endamê Komîta Navîn ya Partî Dîmokratî Kurdistan.
- \* Demê damezrandina Kabîna Siyê ya Hukmeta Kurdistanê li 26/9/1996ê postê Wezareta Darayî û Abûrî wergirtîye .
- \* Ji ber jîrî û çelengîya cenabê wî li van dawîya bûye berpirsê Liqê êk yê(P.D.K) li parêzgeha Duhokê.
- \* Li kongirê diwazdê yê P.D.K li sala 1999 ê careka din bûye endamê komîta navîn .
- \* Paş li demê danezrandina Kabîna Çarê ya Hukmeta Kurdistanê li 20/12/1999 ê postê wezîrê karû barêن civata wezîran wergietîye û heta niho yê berdewam e.
- \* Sererayî karên siyasî û îdarî dest ji karê rewşenbîrî bernedaye û çendîn gotar belavkirîne di kovar û rojnamên Kurdistanî û çend pertûk bi çapê ra gehandîne, wek:
  1. Hoz û tayifên Kurdistana Îranê- Ji Farisî wergêraye/ 1995.
  2. Ji Mehabada xwînelo heta kinarêن Aras- Ji Farisî wergêraye/ 1996.
  3. Yûbîla Zêrîna Pêşmergey- Berhevkirin/ 1996.
  4. Barzanî xwe nade destê çu kesî- Ji Farisî wergêraye û pêşekî û perwaêz jî jêra nivîsîne/ 1997.

# Naverok

<b>PÊSGOTINA ÇAPA KURDÎ</b> .....	9
Ji çapa êkemîn ya farisî ra	
<b>PEYVEK</b> .....	21
Pişka Îkê	
<b>SERHILDANA EFSERÊN XORASANÊ</b> .....	25
Pişka Diwê	
<b>FIRQA DÎMOKRATA AZIRBAIYCANÊ</b> .....	53
Pişka Siyê	
<b>BARZANI</b> .....	75
Pişka Çarê	
<b>KURÊ MIN XEYRÎ</b> .....	119
Pişka Pêncê	
<b>IRAQ</b> .....	131
<b>PAŞGOTIN</b> .....	149
Pişka Şeşê	
<b>ELBÜM</b> .....	157
<b>PÊNASA WERGÊRÎ</b> .....	203